

LE
MONDE.
diplomatie
kurdi



Almanya: 3,50 euro
Welatên din: 4,00 euro

Gulan 2010 - Hejmar 7

www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com

32 Rûpel

Kurd û self-determination

A. CELÎL KAYA*

Di sedsala 20'an de çendîn gelên cihanê azadiyên xwe bi dest xistin û dewletên serbixwe damezirandin. Ev yek carna bi rê û rêbazên dîplomatîk, carna jî bi têkoşînên çekdarî pêk hatin. Koloniyên kevn ên li Asya û Afrîka'yê û her weha Îsraîl'ê jî dîsa di vê demê de serbixwebûna xwe bi dest xistin. Heta filistîniyan jî dewletek damezirand. Di sala 1971'an de Bengladeş ji Pakistan'ê veqetiya û serxwebûna xwe ragihand. Ev pêvajoya di sedsala 21'an de jî berdewam dike. Çekoslovakya ya berê jî niha du dewletên cihê ye. Gelên Yugoslavya ya berê jî ji wan gelan in ku serxwebûna xwe ya siyasî bi dest xistin. Herî dawî di Sibata 2008'an de Kosova'yê jî azadiya xwe ragihand. Her çend Sirbistan'ê li dijî vê veqetînê derket û serî li Dîwana Navneteweyî ya Edaletê da jî, Tirkiye jî tê de, 66 ji 192 dewletên endamê Neteveyên Yekgirtî (NY) serxwebûna Kosova'yê nas kir. Sê dewletên endamê Civata Ewlekariyê (Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê, Brîtanya û Fransa) jî di nav van dewletan de.

Rewşa kurdan

Kurd bi serjimara xwe ya nêzikî çil milyonan wekî mezintirîn gelê bê dewlet dihen naskirin. Her ji ber vê yêkê navê 'sêwiyên dîrokê' li wan hatiye kirin. Erdnîgariya Kurdistan'ê, ku hema hema bi qasî axa Fransa'yê mezin e, di navbera çar dewletan de hatiye perçe û belavkirin. Her çend di dîroka nûjen de kurd, bi têgihîştina îro-

yîn, nebûne xwedî dewletekê jî ew her tim otonom bûne an ku di herêma xwe azad bûne.

Piştî Şerê Yekemîn ê Cihanê, ku tê de Împaratoriya Osmanî tîk çû, di navbera tirkên û dewletên hevgerî (îtîlaf) de Peymana Sèvres'ê hat girêdan. Li dû vê peymanê kurd xwedî wî mafî bûn ku li jora Mûsil'ê li cihên ku lê piraniyê pêk tînin, dewleta xwe damezirînin. Lê belê, tirkên li jêr pêşengiya Mustafa Kemal ev peyman nas nekir. Piştî damezirandina Komara Tirkiye'yê peymanê ku an ku Peymana Lausanne'ê hat girêdan û Kurdistan a ku cara pêşîn di sala 1639'an de bi Peymana "Qesra Şîrîn" di navbera Îran û Osmanîyan de hatibû perçekirin bû çar perçe.

Mafê self-determinasyonê

Prensîba self-determinasyonê (mafê diyarkirina qedera xwe) cara pêşîn di xala yekemîn a Şerta NY'yê de wekî yek ji hîmên bingehîn ên huqûqa navneteweyî ya mafên mirovan hat naskirin (1). Ev rêgez di hîma xwe de mafê gelan e ji bo diyarkirina qedera xwe an ku ev maf him mafekî takekesî û him jî mafekî hevbeşî yê gelan e ji bo hîlbijartina statuya xwe ya siyasî û diyarkirina dirûvê aborî, çandî û pêşketina komelgeyî (2). Ev rêgeza self-determinasyonê bi giştî bi pêvajoya azadkirina welatên kolonî tîkildar e ku ev pêvajoya li dû pejirandina Şerta NY'yê ya sala 1945'an hatiye destpêkirin.

Bi ya biryara Civata Giştî ya NY'yê hejmar 1541 mafê self-determinasyonê dikare bi sê awayan were bikaranîn: Serx-

► 5

TIRKIYE

“Dema ku dewlet bibe mijar,
girîngiya dadê namîne”

İSMAİL BEŞİKÇİ*



Foto: Murat Yazar

Di 12'ê Nîsana 2010'an de, li Samsûn'ê, li dijî Ahmet Türk, ku serokê Partiya Komelgeya Demokratîk bû, ku ev partî ji aliyê Dadgeha Destûra Bingehîn ve hatibû girtin, û endametiya wî ya parlamentoyê hatibû betalkirin-êrîşek pêk hat. Êrîşbir bi kûmekê pozê Ahmet Türk şikeland. Ahmet Türk û hevalên wî li Samsûn'ê amade bûn da ku rûniştina darizandinekê, ku dadgeha bilind ji Mûş'ê rakiribû Samsûn'ê, bişopînin.

Partiya Komelgeya Demokratîk (BDP) di 9'ê Berfanbara 2009'an

de ji aliyê Dadgeha Destûra Bingehîn ve hatibû girtin. Li ser vê yekê, kurdan, da ku vê biryarê şermezar bikin li her deverên ku lê dijîn xwepêşandan li dar xistibûn. Li navçeya Kop'ê ya bi ser Mûş'ê, berevanekî gundan ku dikana wî hatibû kevirbarandin, bi ser xwepêşandêran gulle reşandibûn ku di encamê de du kes ji yana xwe ji dest dabûn. Xizmên qurbanîyan sebarek bi van kuştinan doz vekiribû. Dadgeha bilind jî, ji ber sedemên ewlekariyê doz ji Mûş'ê rakiribû Samsûn'ê.

Endamên BDP'yê û endamên parlamentoyê da ku vê dozê bişopînin çûbûn Samsûn'ê. Bi ya gotinên wan kesan, ku di dema

rûdanê de bi xwe li wê derê amade bûn, dema ku BDP'yî diçûn nav hêwana dadgehê, komeke bi qasî 40 kesî bela xwe bi wan dabûn û xwestibûn ku êrîşî wan bikin. Ev kesên ku di bin baranê de du saet rawestiyabûn, piştî rûniştinê jî her berdewam bûn berizînê.

Polêsan da ku pêşî li wan bigirin tu tişt nekir. Heta wan derfet da êrîşbiran ku êrîşê pêk bînin. Êrîşa li dijî Ahmet Türk di hawîrdoreke weha da pêk hat. İsmail Çelik'ê 27 salî, di vê êrîşê de, ku li jêr berevaniya polêsan de pêk hat, pozê Ahmet Türk şikeland. Êrîşbir paşê hate destgîrkirin.

► 16

* Huqûqnas, rojnamevan

* Civaknas

ASYA

Li Kirxizistan'ê, ji şoreşekê ber bi yeka din ve

VICKEN CHETERIAN*

Beriya deh salan li navenda Qafqasya'yê, Kirxizistan wekî "cenneta demokrasiyê" bû, ew niha li bi teqîneke şerekî sivil re rûbirû ye. Roja 6'ê Nîsan'ê, li dijî zêdebûna buhayên enerjîyê û gendeliya di nava erkanê dewletê de çêbûyî, şênîyên bajarê Talas'ê, ku li bakurê welat e, daketin nava kolanan. Di heman rojê de wan hin navendên girîng ên dewletê girtin destê xwe û alîkarekî serokwezîr û her weha wezîrê navxweyî jî rehîn girtin. Rojek şûnde bûyer gihîşt heta Bîşkek'ê, paytexta welat. Li wê derê 5000 kes çûn bi ser qesra serokatîyê. Di dawîya rojeke tije pevçûn de 84 kesan jiyana xwe ji dest dan, bi hezaran jî hatin birîndarkirin.

Ji sala 2002'an û vir ve, ji bûyera pevçûnê ku tê de 6 xwepêşandêr ji aliyê polêsan ve, li bajarê Asky'yê hatibûn kuştin, ev cara yekem e ku li vî welatî bûyerên weha bişîddet rû didin. Di destpêka bûyeran de serok Kurmanbek Bakiyev xwe kişand başûr, bajarê Celalabad'ê ku ji xwe re wekî qele dibîne, û xwest li wê derê alîgirên xwe birêxistin bike. Xwepêşandana ku ji aliyê wî ve, li bajarê Oş'ê hate rêxistin karibû tenê çend sed kesan bicivîne, di 15'ê Nîsan'ê de wî Kirxizistan'ê terikand û çû Kazaxistan'ê.

Kes nikare bêje ku wê hikûmeta demî, ya ku di bin serokatîya wezîra berê xanim Roza Otounbaeva ve damezrandî, bikaribe bendên rêvebiriya welat bigire destê xwe û bersivê bide daxwazên girseya ku her roj di nava xizaniyê de wenda dibe.

Ji niha ve dixuye ku dema Bakiyev wekî pêvajoya paşveçûna demokratîkkirina welat derbas

bû. Di sala 2005'an de dema ku ew bû serok, bi alîkariya "şoreşa lale" ya ku serokê wê demê Askar Ayakev ji peywira wî dûr xist, wî soz dabû gel ku ewê pêvajoya demokratîkkirinê û durûstiyê pêş bixe. Piştî ku wî wezîfe girt, dest pê kir ku ji yê dema borî zêdetir zextê bide meşandin. Wî pir zû peyva "ji malbatê ye" ji xwe re qebûl kir û bi taybetî, kesên nêzîkî xwe di peywîrên girîng de, yên wekî xebatên şewirmendiyê û balyozxaneyan de bi cih kirin. Her weha wî kontrola xwe ya li ser firmayên neteweyî jî zêdetir kir (1).

Li Bîşkek'ê peyva "arzikirin"ê bibû pêkenok û wateya wê wekî "dest danîna ser malê dewletê" dihat fêmkirin. Di nava firmayên li welat, ên ku zêdetir pêş diketin ew bûn ku bertîl û xûgî didan birêz Maksîm Bakiyev, kurê serok. Maksîm Bakiyev tu bertîl venedigerandin. Di vê dema dawî de partiyên siyasî û medya jî ketibûn bin zexta diwar a rêvebirên dewletê.

Her tişt hatibû kirin, ji bo ku agahiyên sebarek bi hevkarê birêz Maksîm Bakiyev, ê bi navê Yevgueni Gurevich, ku li Îtalya'yê hatibû girtin û bi ya wan ew bi mafyaya îtalî re ketibûn nava pevçûnê û her weha dihate gotin ku wî pereyeke mezin kirîye ser hesabê xwe. Hate zanîn ku birêz Gurevich firmayên îtalî yên telekomûnîkasyonê xapandine û 2 mîlyar euro kirîye ser hesabê xwe. (2)

Ji bo rexneyan bitepisîne, çî sebarek bi vê bûyerê be û çî jî sebarek bi mijarên din be, rêbazên ku ji aliyê malbata Bakiyev ve dihatin bikaranîn, ji yên çeteyên mafyayê cudatir nebûn. Di 2006'an de, yek ji rayedarên muxalefeta kirxiz, birêz Omurbek Tekebayev li balefîrgeha Varşova'yê hate girtin; di bagaja wî de eroîn hate dîtin. Pir pê neçû ku were zanîn ku heman bûyer kiriyara saziya saloxdariya kirxiz e ku ji aliyê birayê

serok, birêz Zhanibek Bakiyev, ve dihate birêvebirin. Di meha Kanûn a 2009'an de, rojnamevan Genadi Pavliuk ji ser avahiyeke bilind ê li Almata'yê, Kazaxistan'ê hat têwerkirin. Sebarek bi heman bûyerê, muxalefetê, bi awayekî tund xebatkarên saziya saloxdariyê tewanbar kir.

Tengasiyên civakî ku roj bi roj girantir dibin, bûne faktoreke din, ji bo serhildanên girseyî ku rejîm wergerand. Pereyên ku ji çavkaniyên zêran, ên li Kumtor'ê hatine kişandin, ku ev çavkanî parçeyeke mezin a dewlemendiya sereke yên welat in, bûye sedema kêmbûna jêhatina giştî ya welat. Wê were zanîn ku piraniya van pereyan mafê kesên teqawîtbûyî ye, ku li Rûsya'yê dijîn (Ji sisiyan yek ê hêza zindî yê welat e). Lewre, ji krîza aborî ku di sala 2008'an bi şûn de hatibû, jêhatina heman çavkaniyan pir kêmbû. Bi ya hejmarên Banke ya Cîhan'ê (3), dey- nê derve yê Kirxizistan'ê derketiye 2,2 mîlyar euroyan, ev dike ji % 48 mehsûla hindir a brût; bi ya birêz Edil Baisalov, yek ji rêvebirê hikûmeta demî ye, ji % 40'ê nifûsa welat di bin rêjeya xizaniyê de dijî, lêcûnên wan ên mehane ji 50 euroyî derbas nabin. Hikûmeta demî çend rojan berê topavêtina welat ragihand û da xuyan ku di xezîneya dewletê de bi tenê 986 mîlyon soms heye -dike 16 mîlyon euro. (4)

Piraniya çavdêrên navneteweyî, ev rewşa li Kirxizistan'ê wekî encama têkoşîna ji bo xurtkirina bandorê pejirandin ku di navbera Washington û Moskova'yê de dimeşe. Wekî di hê zanîn, Kirxizistan yekta welat e ku li ser axa wî hêzên rûs û yên amerîkî hebûna xwe diparêzin. Çi qas jî rola ku ji Kremlîn'ê re hatiye naskirin jî, di nava demeke kurt de naskirina hikûmeta demî ya ji aliyê Moskova'yê, xuya dike ku têkili-

yên di navbera van du welatan de ew qas jî xerab nîn e û Moskova ji têkçûna Bakiyev nerehet nîn e. Di rastiye de têkiliyên di navbera van her du welatan de, bi taybetî ji meha Sibata 2009'an û bi şûn de, ber bi xerabbûnê ve diçûn. Di heman demê de peyman 2,1 mîlyar dolar (1,6 mîlyar euro) wekî alîkarî ji bo Kirxizistan'ê hatibû îmzekirin û serok Bakiyev dabû xuyan ku wê baregehên leşkerî yên amerîkî werin girtin. Lê belê piştî demekê bi şûn de, di navbera Kirxizistan û Washington'ê de peymanê nû hate îmzekirin, bi ya vê peymanê bingegehên leşkerî yên amerîkî dimînin.... Ev bûyera veşartina têkiliyan bû sedem ku Moskova alîkariya aborî bide rawestandin.

Heger Kremlîn ji "guhertina rejîmê" ya li Bîşkek'ê razî be, Washington zêdetir xemgîn e. Baregeha hewayî ya li Manas'ê, ji bo stratejiya li ser Afxanistan'ê ya Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê û her weha ya NATO'yê, xwedî girîngiyeke pir mezin e. Lîstikeke din a siyasî ku hebûna wê diparêze jî tişteke din e, her weha ew di navenda karekî bêqanûnî de ye. Ji bo ku Pentagon hebûna xwe li herêmê biparêze wî bi "malbat"ê re hin peyman îmze kiribûn. Heman kiryar di dema serokê berê Akayev de jî bibû, lê belê peymanên herî xurt bi Maksîm Bakiyev re hatibûn çêkirin.

Berjewendiya herî zêde di dema kirîna nefta kirxiz a ji aliyê Amerîka'yê ve de çêbû ku heta niha ji aliyê Rûsya'yê ve bi buhayeke piçûk dihat kirrîn. Di yekê Nîsan'ê de, Moskova'yê li Kirxizistan'ê ferz kir ku ew baca sebarek bi kirîna enerjîya ku, ew di axa Rûsya'yê re derbasî welatên sêyem dike bide. Hikûmeta demî niha daxwaz dike ku di barê bêqanûniyên nefta Manas'ê de lêkolînek çêbibe (5).

Ji bo ku Washington baregeha xwe ya leşkerî li herêmê bihêle, wî bi malbata Bakiyev re hin peyman çêkiribûn, ev jî bibû sedem ku ew li hemberî bêqanûniyan û her weha li hemberî negirtina sozên sebarek bi pêşxistina demokrasiyê bigire.

Di buhara 2005'an de, piştî ku serok Akayev destûr da ku ew di hîlbijartinan de beşdar bibe, xanim Otounbaeva derket ser dikeya siyasî û bi muxalefetê re hevkarî kir. Ji heman demê bi şûn de, cara yekem, ew wekî figureke siyaseta herêmî derkete pêş. Vê xanimê di dibistanên herî baş ên bloka Rojhilat de xwendîye, berî ku ew bibe wezîra karên derve yên Kirxizistan'a ciwan, wê di wezareta karên derve yên Sovyet'an de kariyera xwe pêş xistibû. Di 2004'an de, xanim Otounbaeva, li Gurcistan'ê, di dema şoreşa pembe de, peywira nûnertiya taybet a Neteweyên Yekgirtî dikir. Di 24'ê Adar'a 2005'an de jî, heman xanimê li kêleka Bakiyev cih girt û di guhertina rejîmê de rol leystibû.

Digel hemû tiştan, tenê salekê piştî "şoreşa lale"yê, li pêşberî mîlîtanên xwe yên ku ji her deverê welat hatibûn, wê nerazîbûna xwe bi vî rengî anîbû ziman "Tiştê neguherîye, rejîma Akayev her tim zindî ye. Em xwedî welatekî ne ku her tim di nava guherînan de ye. Hewelatî tu cudahiye di navbera desthilatdariyê û muxalefetê de nabîne." Digel vê nerazîbûna xwe wê bibiryarbûn û her weha bihêvîbûna xwe jî venedîşart. "Ji bo ku em bikaribin li welatê xwe demokrasiyê bi cih bikin, hîna karê me pir e. Dema avakirina partiyên siyasî hatiye." Di vî barî de xanim Otounbaeva bêsebrîya xwe ya li hemberî welatên rojava jî, bi taybetî li hemberî bêdengiya Ewropa'yê, venedîşart. "Hemû tiştên ku ew dikin, tenê dayîna deynê piçûk e, lê belê pêwisti-

* Rojnamevan, nivîskarê *War and Peace in the Caucasus* (Ser û Aştî ya li Qafqasan), Hurst/Columbia University Press, New York, 2009.



Foto: Adem Sönmez

yeke me ya mezin bi çêkirina pergaleke siyasî a fire-partîbûnê heye.”

Bûyerên ku di meha Nîsanê de rû dan, careke din rewşa hessas a dewleta kirxiz diyar dike. Di 2005’an de, tenê meşên ku tê de dora 10 heta 15 hezaran kesan beşdar bibin karibûn di nava rojekê de hikûmetê biguherînin. Serok Akayev, ê ku wekî otokrateke biriqî hatibû naskirin, pêwîstî bi meşandina zextê nedîtibû. Lê belê, hêzên ewlekariyê yên Bakiyev netirsîyan ku bi ser girseyê de gulebaranê bikin; lê dîsa jî ev rejîm hilweşîya. Hejmara mezin a kuştîyan tenê bilinbûna tansiyona li vî welatî û hessasiyetê diyar dike. Ev welatê ku pir kesan hêvî dikirin ku wê bibe Swîsre ya Asya ya Navîn.

Li welatekî wisa, ku hejmara mîlîtanên partiyên siyasî û şefên wan qasî hev in, çêkirina rewşeke mayînde xebateke rehet nîn e. Xanim Otounbaeva

û ekîba wê neçar in ku her tiştî ji destpêkê ve bikin. Di vê demê de ku hê pergala fire-partîbûnê tune ye, ew neçar in ku destûreke nû ya bingeşîn çêbikin, parlamentoyekê bi cih bikin û saziyên bibandor ên rêvebirîya welat ava bikin. Divê ev kar hemû di nava rewşeke xerab a aborî de pêk werin. Di vê demê de ku alîgirên sereke yên welat, Rûsya jî di nava wan de, di nava rewşeke aborî ya xirab de ne, barê deynê wê jî her ku diçe girantir dibe. Gelo reformîstekî, tenê bi daxwaza xwe ya paqij, dikare ji bin vî barî hemû derkeve û dewletê ber bi pêvajoyeke demokratîk ve bibe? ev dewleta ku ne xwediyê saziyekê ye û ne jî çandekê wê heye.

Ev tirs di barê hemû herêmê de heye. Dîwarekî ji çiyayên bilind ên bilindiya wan ji 3000 metreyan zêdetir e û bajarên sereke ji hev du diqetînin, Bişkek li aliyê bakur e, Oş li aliyê başûr e. “Şoreşa lale”yê, Serok

Akayev ku bi eslê xwe ji aliyê bakur e, xistibû. Bûyerên ku di demên dawî de pêk hatî, li aliyê bakur zêdetir pêşketin. Di vê herêmê de helwesta gel li dijî rejîma Bakiyev’ê ku eslê xwe başûrî ye pirtir e. Nakokiyên bakur-başûr, qasî ku ew rastiyeke siyasî ye ew qas jî ew rastiyeke jeografîk e.

Niha, mozaîka herêmî, ya ku ji eşîretan an jî ji etnîkan pêk dihe, yekîtiya welat parçe dike û nahêle ew bibe xwediyê blokeke rast a siyasî, wekî ku li Ukrayna’yê ku piştî şoreşa zer pêk hat.

Di nava vê rewşa krîza aborî de ku li cîhanê heye û têkçûna siyasatên lîberal ên dema bloka piştî Sovyeta berê, bûyerên li Kirxizistan’ê îşareta jinûvehatina hêzên sosyal didin ku wê di nava Komarên Asya’ya Navîn de hebin. Di 1992’an de, dema ku rêvebirên Federasyona Rûsya’yê bandora xwe ya lîberal belav kirin, di aliyekê de wan

alîkariya civakî kêr kirin, di aliyê din de jî, ji pêşxistina arzîkirinê re piştgirî kirin. Wê demê tirs hebû ku wê dijberiyê tund a girseyî derkeve holê. Digel wê rewşê û wê tirsê, serbesthiştina buhayên tiştan û bandora ku wê li ser asta jiyana civakê çêkirî, tu serhildaneke girseyî çênebû.

Krîzên ku di van bîst salên dawî de rewşa herêmê hejand, ên ku armanca wan daxwazên siyasî û her weha etnîkî bûn, bi giranî bêdadiyên aborî û yên di dema hîlbijartinan de dikirin rojevê. Li Talas’ê û li Bişkek’ê, sedemên ku girse dakete kolanan, zêdetir bilindbûna buhayên enerjîyê bûn. Şoreşa nû ya kirxiz dikare di dîroka Piştî-Sovyet’ê de (Post-Sovyet) wekî tevgerê yekem a civakî were nivîsandin.

Werger ji fransî
Ahmet Dere

(1) “Inevitable family rule in Kyrgyzstan” (Hikûmkirina malbatî ya li Kirxizistan’ê ku pêşî lê nikare bê girtin), Ferghana.ru, 6 Kanûn 2009.

(2) “Kyrgyzstan: Is the financial consultant of Bakiyev’s family the associate of Italian mafia?” (Kirxizistan: Gelo şewirmendê darayî yê malbata Bakiyev endamê mafyaya îtalî ye?), Ferghana.ru, 10 Adar 2010.

(3) www.worldbank.org.kg

(4) Matt Siegel, “Economy in tatters, Kyrgyzstan awaits Russian aid”, (Aborî di tengasiyê de ye, Kirxizistan li benda alîkariya rûsan de ye.) AFP, Bîşkek, 11 Nîsan 2010.

(5) Alan Cullison, Kadyr Toktogulov et Yochi Dreazen, “Kyrgyz Leaders say U.S. Enriched Regime”, (Serokê Kirxizan dibêjin DYA’yê rejîm zexmtir kiriye) Wall Street Journal, New York, 11 Nîsan 2010.

Hrant Dînk û komkujiya li Tirkîye'yê

TRINE KLEVEN*

Mêrkuj çar mîtro-yan dîrî min ru-nîştiye. Ez li wî dinihêrim, ew jî li min û ez difi-kirim ka ji bo çi ez li nav çavên mirovekî, yê ku mirovekî din kuştiye, mêze dikim. Ez li dilxerabî û dijminatîya wî ya li dij mirovatiyê digirim, lê belê bi tenê xortekî cilreş û caverşê destgîrêdayî û awirên bêwate dibînim. Ew paniya pêlava xwe li erdê dixê. Gelo destgehên tirk dixwazin hemû kartên xwe li ser maseyê birjînin û ji ber kuştina Hrant Dink li hember tawanbaran darizandineke bi dad bimeşînin yan na? Ez li hêwana dadgeha Stenbolê li ser sireyeke darînî ya hişk û qehweyî rûniştîme. Di hêwanê de ew cara 11'emîn e ku rûniştina Hrant Dink wê were berde-wamkirin. Rojekê Cotmeha 2009'an a bi tav e.

Em ji serê sibê ve li benda rûniştinê rawestiyane. Nûnerên Komîsyona Tirkîye'yê ya Parle-mentoya Yekitiya Ewropa'yê (YE) û nûnerên Partiya Kesk'an a YE'yê tê de beşdar bûne. Gelek parêzerên fransî jî ku li ser pirs-girêka ermenîyan xebatê dikin û mafên wan diparêzin li vê derê amade ne. Sekreterê giştî yê PEN'a dinyayê Eugene Schoulgin, saziyên mafên mirovan, Komîsyona Lêpîrsîna Parle-menterî ya Mafên Mirovan û hin parêzerên din jî, ku ji bo azadiya ragihandinê piştigiriyê didin, cihên xwe girtine. Ez jî li ser navê PEN a Norwecê îro li vir im.

Hêwan hetanî qirikê bi mirov, ciwan, pîr û kal, malbata Dink, heval û parêzeran re tijî ye. Ji ber ku hêwan teng e ew qas mirov jî li ser piyan in. Rojnamevanekî bangî min kir û got: beriya du rojan bi hezaran mirov li Taksîmê bi hêviya dadê ji bo Hrant û mirovên bêserû-şûnkirî yê li Tirkîye'yê meşek li dar xistiye. Piraniya rojname-vanan kaxiz û penûsên xwe amade kirin. Tevahiya rojname-van ciwan bûn û vê yekê bala min kişand û min ji parêzerê pirs kir. Gelo çima hemû rojnamevanan ciwan in? Wê got: "ew, ên ku wêrek in."

Nezikî 20 kes di vê dadgehê de dihên tewanbar kirin, lê bi



Foto: Adem Sönmez

tenê 5 kes di rûniştinê de beşdar dibin. Ew 5 kes li ser sireyê ji hev cuda rûniştine. Mêrkujê çavreş hîn 20 saliya xwe tije nekiriye. Ez li ser gotina Hannah Arendt fikirîm ku wê digot "Totalitarîzm ji wan destan derdikeve ku bê şik û guman bi ya gotinên kesên din dikin û bi çavgiştî peywirên xwe bi cih tînin û li ser encamên wan nafi-kirin. Gelo Ogün Samast lewma Hrant Dink kuşt?"

Parêzera Malbata Hrant Dînk, Fethiye Çetin, rabû ser piyan û got: "Em pirsyarkirina hemû tewanbarkirî û şahidên veşartî dixwazin, lê belê dadgeh vê yekê girîng nabîne. Pewîst e ku siyaset û hêzên organîze, ku di paş kuştina Hrant Dink de ne, werin eşkerekirin." Daxwazên ji bo pirsyarkirina komiserên polêsên Stenbol û Trabzonê û serêkê destgeha îstîxbaratê hatin redkirin. Malbata Dînk ji destpêka rûniştinê ve daxwazên xwe anî ziman û got tewanbarkirî û parêzerên wan naxwazin ku rastî werin eşkerekirin.

Tiştê nû ku vê carê hatiye holê ew bû ku demançeya ku Hrant pê hatiye kuştin hat raberkirin. Bersûc dibêjê ku nayê bîra wî ka wî kîjan demançe bi kar aniyê, ji ber ku yekî rojek

berê di sertiraşxaneyê de demançeyek di ber doxîna wî re kiriye. Di rûniştinê de dema parêzera Dink digot bersûc derewan dike, di wê navberê de bersûc şûşeya avê avêt serê Parêzerê. Demançeya ku pê Hrant hat kuştin a polêsan e.

Gava ku toqmaqa dadger li kursiyê ket, em ji hêwana dadgehê derketin. Hin rojnamevan hatin cem parêzera Hrant û wê jî ji wan re fikrên xwe gotin. Digel saziyên navneteweyî jî heypeyvîn hatin kirin.

Serokê PEN'a navneteweyî, Eugene Schoulgin, yê ku li Stenbolê dijî û çavdêriya zêdetirî sed darizandinan kiriye, dibêje hêdî hêdî ev pêvajoyê vediguhêre pêkenîkeke xerab. Schoulgin her weha careke din anî ziman ku di 35 salên dawî de bi tevahî 17 hezar kes hatine kuştin û kiryarên wan bûyeran nehatine diyarkirin.

Bi kurtasî û kinasî dikarim bêjim ku vê carê jî di dadgehê de tu tiştêkî nû derneket. Gelo destgehên fermî dixwazin xelkê bi-xapînin an wan aciz bikin? Dîsa jî bersûcê fermî ji ber kuştinê derket pêşiya dadgehê. Bi vî awayî eşkere bû ku berpirsiyarên kuştina Hrant nehatin binavkirin. Bi tenê polêsên Stenbol û

Trabzonê dihên tawanbarkirin, ji ber ku wan plana kuştinê ji berê ve zanibûn. Lê belê dîsa jî delîl dihên veşartin û ji bo lêkolînê destûr nayê dayîn.

Hrant Dînk, gerîndeyê giştî û nivîskarê rojnameya Agosê, li Stenbolê bû. Armanca rojnameyê bidengxistina ermeniyên li Tirkîye'yê û avakirina diyaloga navbera tirk û ermenîyan bû. Di xebata parastina mafên mirovan de Hrant kesekî herî li pêşê singvekirî bû. Hrant û Orhan Pamuk her du jî gelek caran rexne li dewleta tirk digirt ji ber ku dewlet komkujiya ermenîyan ku di sala 1915'an de pêk hatibû red dike û naxwaze ku digel sazgehên navneteweyî hevkarîyê bike da ku belgeyên rexnekirî werin eşkerekirin. Her du jî ji ber fikrên xwe hatin xapandin, darizandin û gef li war hat xwarin. Ê dawî Hrant di sala 2007'an de li Stenbolê li ber pêşiya nivîsgeha xwe hat kuştin.

Ji 100 hezarî zedetir mirov di merasîma veşartina Hrant de beşdar bûn. Ew meş bû nîşaneyê piştigirîya civakî, nerazîbûneke hevpar a li dijî nijadperestî û netewperestî. Hrant sembola qirkirina ermenîyan e lê belê dewleta tirk dixwaze vê komku-

jiyê, piştî Holocaustê ku li dinyayê herî zêde dihe gotûbêj-kirin, reş bike, bixe binê xaliyan û veşêre.

Mîlyonek an jî 2 mîlyon mirov hatin kuştin. Ji bo çi heta îro qebûlkirina komkujiya ermenîyan ji bo dewlet/saziyên tirk dijwar e û şîrovekirin qedexe ye?

Her çi qas saziyên fermî li Tirkîye'yê qirkirinê red jî bikin, gelek kes li derveyî Tirkîye'yê vê meselê tînin ziman. PEN a navneteweyî jî pêşniyar kir ku benda (301), ku xebardana li ser qirkirina Ermenîyan ku ji aliyê tirkan ve hatibû pêkanîn, ceza dike bê rakirin. PEN'a navneteweyî îro darizandinên (ên ji ber 301) 25 nivîskar, rojnamevan û gerîndeyan dişopîne. Kongreya Dewletên Yekgirtî yê Amerîka'yê kuştina ermenîyan wekî "komkuji" bi nav kir. Her çi qas li Swêdê partiyên liberal di destpêkê de li dijî pejiwandina peşniyaza partiyên sor û keskan ji bo qebûlkirina komkujiya ermenîyan bûn jî, parlementoya Swêdê jî di 11'ê Adara 2010'an de qirkirina ermenî, asurî/ suryanî/keldanî û yûnanên pontus ên ku bi destê dewleta tirk pêk hatibû, wekî komkuji nas kir.

Tirkîye'yê jî bi vekişandina balyozên xwe yê li Swêd û DYA'yê bersiv da û piştî wê jî Recep Tayyip Erdoğan seredana xwe ya bo Swêdê betal kir. Serokwezîrê tirk Erdoğan gef li wan kesên xwar ku navê komkujiyê tînin ziman û got ewê 100 hezar ermeniyên li Tirkîye'yê ku ne xwedî hevvelatiya Tirkîye'yê ne dersînor bike.

Di Sibata îsal de gava ku rûniştina 12'emîn pêk dihat, li derve li ser kolona koşê, di nav meşa ji bo mirovên kuştî û Hrant de mirovan bang dikir û digot: "Kuştina Hrant biryareke fermî û hevpar e." Çavdêrên navneteweyî û parêzerên mafên mirovan him li nav û him jî li derveyî Tirkîye'yê dixwazin ku nîşanê dewleta tirk were dayîn ku têkoşîna li hember pêkanînan li dijî azadiya ramanê û dad-xwaziye wê her berdewam be.

**Wergera ji swêdî
Sharo Brahîm Garip**

Ev nivîs ji bo Le Monde diplomatique kurdî hatiye nivîsandin

* Nivîskar, endamê PEN'a Norwecê



Foto: Murat Yazar

Nihêrîneke huqûqî li ser mafê self-determinasyonê

1 ◀

webûn, otonomî û tevlêbûna dewleteke heyî.

Ji bo gelek encama tatmînkar a yekane ya vê prensîbê serxwebûna giştî ya siyasî ye. Ev yek piranî ji bo welatên dagirkirî yan jî neteweyên kolonî rast e. Ji bo yên din mebesta sereke asteke otonomiya siyasî, çandî û aborî, nebûna mudaxele û êrîş/dagirkeriya ji derveyî welêt û carina jî dirûvê avabûneke federal e.

Mafê self-determinasyonê di huqûqa navneteweyî de wekî mafê pêvajoya endambûna gelekî hatiye ragihandin, ne ya dewlet yan jî hukûmetan (3). Lê belê, di pêkanîna de, dewlet di

warê bidestxistina vê yekê de ji gelan bêhtir bandoker in ji ber ku daxwazên otonomiya çandî ji aliyê dewletan ve bi awayekî hêsanîr dihên pejirandin û daxwazên serxwebûnê ya komekê piranî dihên redkirin.

Sebareti bi mafê self-determinasyonê du xebatên sereke yên NY'yê hene ku tê de du faktor dihên destnîşankirin ku mafê bikaranîna self-determinasyonê dide gelan: Dîrokeke (raboriyeke) serxwebûnê yan birêvebirineke xwe bi xwe ya li ser axeke diyarkirî, çandeke cihêreng û vîn û zerengiya dubare bidestxistina birêvebirina xwe bi xwe (4).

Dema ku yekparebûna xaka

welatekî were rojevê, mafê self-determinasyonê di prensîbê de derbaz nabe (5). Dîwana Navneteweyî ya Edaletê di nêrîna xwe ya şewrê ya sebareti bi yekparebûna axa dewletan de serî li xala 6'emîn a biryara şîretî ya Lijneya Gelemperî hejmar 1514 (6) dide û biryara xwe dispêre wê (7). Xala 6'emîn weha dibêje: "Hemû hewldanên ji bo xerabkirina, giştî yan qismî, ya yekitiya neteweyî û yekparebûna xaka welatekî digel mebest û prensîbên Şerta NY'yê bi hev nake" Bi gotineke din mafê self-determinasyonê ya gelan, wekî ku di pergala NY'yê de peyda dibe, bi tenê ji bo wan gelan derbaz dibe ku li jêr desthilat-

dariya mêtînger yan a biyaniyan de ne an ku ev maf ji bo wan gelan derbaz dibe ku li jêr desthilatdariyeke rewşa de najîn.

Di peyman an jî di pêkanîna rêxistina NY'yê de mafê veqetînê ji dewleteke endam nîn e. Ji ber ku dozkirina vî mafî ji bo parçekirina yekitiya netewî û yekparebûna axî ya dewletekê wê bibe çewt şîrovekirina prensîba mafê self-determinasyonê ya li dij mebestên Şerta NY'yê (8). Lê belê, rastiyek heye ku kes nikare li dij derkeve, di ronahiya têkiliyên modern a navneteweyî de, prensîba self-determinasyonê xwedî taybetmendiya jus cogens e (9). Him Dîwana Navneteweyî ya Edaletê û him jî Komîsyona Înter-

Amerîkan a li ser Mafên Mirovan a Rêxistina Dewletên Amerîka'yê di wan dozan de ku hatibûn pêşiya wan weha biryar dan ku ew piştgirî didin wê nêrîna ku dibêje prensîba self-determinasyonê her weha xwedî statuya erga omnes e (10).

Di heman paralelê de, di sala 1970'an de bi boneya 25'emîn salvegera damezrandina NY'yê de biryara hejmar 2625 hate pejirandin. Her çend gelek mijarên biryara hejmar 1514 di vir de jî hatin dubarekirin, sebareti bi yekitiya netewî û yekparebûna axa dewletekê de ev biryar hin şert û mercan rêz dike ku tê de yekîtî û yekparebûnê derbaz nabin. Li dû wê:



Foto: Adem Sönmez

“Prensîba yekitiyê digel prensîba mafên yeknesak û mafê self-determinasyonê bi rê ve diçe û ji bo wan hukûmetan derbaz dibe ku hemû şênîyên welat bêyî ku cudageriya ji ber nijad, bawerî û reng hebe temsîl dike.” Bi xwendina berevajî hukûmetek ku cudageriyê bike nikare ji prensîba yekitiyê sûdê werbigire.

Lê mixabin, dema em li wan rewşan dinihêrin ku tê de doza prensîba self-determinasyonê

hatiye kirin, em rastî siyaseta jêrevînê (îmtînakirinê) dihên: Prensîba self-determinasyonê veguheriya çeka vegotinên siyasî. Komeleya navneteweyî, ji ber vê yekê, ew gelên ku doza prensîba self-determinasyonê dikin, bi tenê hiştine. Divê were israrkirin ku komelgeya navneteweyî wan rewşan ku tê de doza mafê self-determinasyonê dihê kirin bi awayekî rêk û pêk, bi awayekî legal binirxîne.

Di huqûqa navneteweyî de self-determinasyon

Prensîb û mafê bingeîn a self-determinasyonê yê hemû gelan di huqûqa navneteweyî de bi awayekî eşkere hatiye ragihandin.

Prensîba self-determinasyonê cara pêşin ji aliyê Serokê Dewletên Yekgirtî yê Amerîka'yê (DYE) Woodrow Wilson ve hat pejirandin. Wilson di sala 1916'an de gotibû ku ‘Her gel

xwedî wî mafî ye ku hîlbijêre ka li jêr kîjan desthilatdariyê bijî’. Lenîn jî piştgirî da mafê self-determinasyonê ji ber ku bi ya wî ev prensîb rêyeke baş bû li dij kolonyalîzmê.

Paşê, li dû Şerê Yekemîn ê Cîhanê ev prensîb bû prensîba jî-nûveavakirina Ewrûpa'yê. Ev prensîb her weha di sala 1941'ê de li Şerta Atlantîk hat zêdekirin û paşê jî bi awayekî eşkere di xala yekemîn a Şerta NY'yê de teşe girt. Şerta NY'yê diyar

dike ku naskirina vê prensîbê di asta gerdûnî de pewîst û bingeîn e ji bo domdariya tekiliyên hevalbend û aştiyane ya di navbera dewletan de.

Mafê self-determinasyonê her weha di xala pêşin a hevbeş a Peymana Navneteweyî ya sebareti bi Mafên Medenî û Siyasî (ICCPR) û Peymana Navneteweyî ya sebareti bi Mafên Aborî, Komelgeyî û Çandî (ICESCR) de, ku ev her du peyman di sala 1976'an de ketin meriyetê, wekî

mafê hemû gelan hat ragihandin. Rêza yekemîn a vê bendê dibêje:

“Her gel xwedî mafê self-determinasyonê ye. Li jêr vî mafi ew dikarin bi serbestî statuya xwe ya siyasî diyar bikin û bi azadî pêşketina xwe ya aborî, komelgeyî û çandî pêk bînin.”

Mafê self-determinasyonê yê gelan di çendîn peymanên herêmî û navneteweyî de jî hatiye pejirandin. Guncan e ku mirov bibêje ku mafên gelan li jêr huqûqa navneteweyî hatiye naskirin lê belê listeya mafên bi vî rengî ne gelek zelal e. Hevdem, huqûqa girêdêr (hard law) di wateya Peymana li dijî Nijadkujîyê de mafê self-determinasyonê û mafê hebûnê dihevwîne.

Pêşketina vî mafi ya di peymanên navneteweyî yên li ser mafên mirovan û Danezana Viyana'yê û Bernameya Tevgerê de, destnîşan dike ku mafê self-determinasyonê parçeyê bingehîn a huqûqa navneteweyî ya mafên mirovan e ku ew huqûq li seranserî gerdûnê derbaz dibe. Ji aliyê din de jî, hatiye derblêdan ku bicihanîna mafê self-determinasyonê şerta bingehîn e ji bo bikaranîna mafên din ên bingehîn ên mirovan û azadiyên bingehîn ên wekî medenî, siyasî, aborî, komelegeyî û çandî.

Gelek dewletan sebareti bi mafê self-determinasyonê li dijî ICCPR û ICESCR'ê şert daniye. Wekî mînak, Komara Hindistan'ê sebareti bi xala 1'ê mîna a ICESCR'ê angaşt dike ku mafê self-determinasyonê bi tenê ji bo wan gelan derbaz dibe ku li jêr desthilatdariya biyanî dijîn û nabe ku li dijî dewletên serdest ên serbixwe were doz kirin. Her weha divê yekitiya neteweyî jî were parastin. Bi awayekî wekhev, Keyaniya Tayland'ê jî radi-gihîne ku mafê self-determinasyonê divê weha were şirovekirin ku bi wê şirovekirinê bi hev bike ku di Danezana Viyana'yê û Bernameya Tevgerê de hatiye ragihandin ku di 25'ê Pûşbera 1993'an de ji aliyê Konferansa Cîhanî ya li ser Mafên Mirovan hatiye pejirandin.

Li hember van şert û angaştan, Komara Federal a Almanya'yê bi hişkî li dijî gotinên Komara Hindistan'ê derket û diyar kir ku ew prensîb ji bo hemû gelan derbas dibe, ne tenê ji bo wan gelan ku li jêr desthilatdariya biyanîyan dijîn. Lewma, her gel xwedî mafê bi serbestî diyarkirina statuya xwe ya siyasî û bi azadî pêkanîna pêşketina xwe ya aborî, komelgeyî û çandî ye. Almanya'yê her weha gotûbêj kir ku tu tixûbên ji bo pêkanîna vî mafi ku yê hemû gelan e wê bi mebest û armancên peymanan hev neke. Bi awayekî wekhev, Hollanda'yê jî diyar kir ku hemû hewldanên ji bo tixûb-kirina bergeha vî mafi yan jî girêdana wan a bi şert û mercên

nû, wê naveroka têgiha self-determinasyonê teng bike û bi vî awayî taybetmendîya wî ya ku li seranserî gerdûnê dihê peji-randin qels bike (11).

Ji nebûna hevberîyê diyar e ku sebareti bi bikaranîna mafê self-determinasyonê di nav dewletan de lihevkirinek nîn e.

Hin şert û mercên taybet hene ku tê de mafê self-determinasyonê dihê peji-randin. Her çend, self-determinasyon ragihandineke yekalî ye jî, heger dewlet jî jê razî be wê demê veqetîn hêsantir dibe. Ji aliyê destûra bingehîn ve jî, divê destûra bingehîn a dewletê destûrê bide veqetîna yekalî. Destûrên bigehîn ên Yekitiya Sovyetên berê, Çekoslovakya ya berê û her weha Yugoslavya ya berê (12) destûr didan veqetîna yekalî. Wekî mînak, di destûra bingehîn a Çekoslovakya ya berê de dihat gotin; “heta radêya veqetînê, naskirina mafê self-determinasyonê, ya ku nabe ku paş de were standin, û rêzgirtina serdestiya her neteweyê û mafê wan ê bi serbestî diyarkirina şewaz û teşeya jiyana xwe ya wekî neteweyek û wekî dewletek. (13)”

Di doza veqetînê ya Quebec'ê (14) de dadgeha Kanada'yê diyar kir ku mafê gelan ê self-determinasyonê ku di çendîn peymanên navneteweyî de hatiye pejirandin xwedî du hêmanan e: self-determinasyona navxweyî ku dibêje; “pêkanîna pêşketina siyasî, aborî, komelgeyî û çandî ya gelekî di nav çarçoveya dewleteke heyî de (15)” û self-determinasyona derveyî ku dihe wateya “mafê veqetîna yekalî (16)” jî ber ku mafê self-determinasyonê her tim digel “rêzgirtina yekparebûna axa dewletên heyî (17)” dihe rojevê, divê weha were têgiştin ku ew prensîb mafê veqetînê nahe-wîne... “ji bilî şer û mercên taybet (18)”. Dadgehê wan şert û mercên taybet rêz dike ku ew gelên ku tê de ne xwedî mafê veqetîna yekalî ne:

(a) Ew gelên ku li jêr desthilatdariya dagirkeriya koloniyal a hêzên biyanî de ne (19);

(b) Ew gelên ku tûşî “zordestî, serdestî yan jî mêtîngerîya biyanîyan a li derveyî çarçoveya kolonyalîzmê (20)” dibin û her weha;

(c) Ew gelên ku “ji mafê bikaranîna watedar a mafê self-determinasyona navxweyî bêpar hatine hiştin.”

Li jêr ICCPR'ê mafê self-determinasyonê

Xala yekemîn a ICCPR'ê mafê self-determinasyonê yê gelan nas dike. Her çend mafê self-determinasyonê ku di peymanê de hatiye pejirandin mafekî takekesî nîn e, dema mirov li avabûna peymanê bi giştî binihêre diyar dibe ku mafê self-deter-

mînyonê mafekî hevbeşî ye ku ji gelan re vekirî ye. Hev-dem, komelgeyên ji bilî wan komelgeyan ku tûşî “zordestî, serdestî yan jî mêtîngerîya biyanîyan a li derveyî çarçoveya kolonyalîzmê” dibin di çarçoveya xala yekemîn a ICCPR'ê de wekî “gel” nayên pejirandin. Ji aliyê din de jî, du hêmanên sereke hene ku mafê self-determinasyonê didin gelan. Ev; “dîrokeke serxwebûnê yan birêvebirineke xwe bi xwe ya li ser axeke diyarkirî, çandekê cihêreng û vîn û zeren-giya dubare bi dest xistina birêvebirina xwe bi xwe. (21)”

Lê belê, serlêdanên li jêr Protokola îxtiyarî bi tenê dikare ji aliyê takekesan ve were bikaranîna divê sebareti bi bînpêkirinê mafên takekesî be. Bi vî awayî, serlêdaneke ji bo mafê self-determinasyonê nabe ku di çarçoveya vê Peymanê de were kirin û serlêdaneke weha wê li jêr xala sêyemîn a Protokolê wekî “nabe ku were qebûl kirin” were ragihandin.

Kurdistan û self-determinasyon

Kurdistan di wateya kelepurî de ne koloniyek e ne jî ji aliyê hêzên rojavayî ve hatiye dagir kirin. Ji ber vê yekê mafê self-determinasyonê, ku di biryara hejmar 1514 de hatiye naskirin, ji bo kurdan derbaz nabe û her weha yekitiya “neteweyî” û yekparebûna axên Tirkiye, Iraq, İran û Sûriye'yê dihe parastin.

Hêjayî gotinê ye ku Bengladeş û Xirvatistan jî ne koloniyê kelepurî bûn lê di sa jî serxwebûna xwe bi dest xistin. Di vir de, her weha, bi awayekî mafdar, mirov dikare li jîyan û temsîliyeta kurdan di hukûmet û rêvebiriyên dewletên gotî de binihêre û doza biryara hejmar 2625 bike. Ji bilî Iraq'ê (ew jî ji 2003'an û vir ve) niha li tu welatên ku kurd lê dijîn, mafê self-determinasyona navxweyî ji kurdan re nehatiye dayîn. Di sa li van welatan rêyeke huqûqî (dadgehî) yan jî siyasî nîn in ku kurd bikaribin serî lê bidin. Berevajî vê yekê, hebûna kurdan dihe înkarkirin û mafên wan ên bingehîn ên mirovî dihe bînpêkirin û kurd tûşî siyasatên pişavtinê dibin.

Wekî mînak li Tirkiye'yê, ku ew dewlet bi tevkariya kurdan re di encama şerê li dijî hêzên rojavayî de hat damezrandin, hebûna kurdan nayê naskirin û her kesê ku hewlê dide ku qala kurdan bike bi xalên qanûna cezayî ve dihe cezakirin ku tê de gelek hukmên ji qanûnên Mûsolînî cih digirin. Wekî mînak “qedexeya afirandina hindikahîyan, heqaretkirina hestên neteweyî û heqaretkirina tirkibûnê.” Her weha “yekitiya neteweyî û yekparebûna axa welêt ku nabe were perçekirin” di qanûna cezayî de xwedî ciheke gelek gi-

rîng e. Gelek biryarên dadgehên Tirkiye'yê yên li dijî kurdan, ji aliyê Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpa'yê ve hatiye tescîl kirin ku neheq in. Di nav van dozan de şewitandina gundan, kuştinên bêdarizandin, bêserûşûnkirin û îşkence xwedî hejmareke gelek zêde ne.

Destûra bingehîn a Tirkiye'yê, ku piştî 3'yemîn darbeya leşkerî hatiye amadekirin, hîna jî hemû hemwelatîyên welêt wekî “tirk” bi nav dike û nahêle ku tu zimanek, ji bilî tirkî, wekî zimanê dayîkê were hinkirin. Qanûna li ser partiyên siyasî, digel gelek qedexekirinên din, benda ji sedî deh li dijî kurdan û hindikahîyên neteweyî yên din ên li welêt wekî astengekê bi kar tîne û da ku nikaribin bikevin parlemantoyê.

Kiryarên dewleta tirk ku li jorê hatin rêzkirin dikevin çarçoveya xala 2'yemîn a Peymana Pêşlêgirtina Nijadkujî, ji ber ku hemû kiryarên vê dewletê bi awayekî sistematîk in û bi mebesta pişavtin û tunekirina kurdan dihe lidarxistin.

Hev-dem, biryara hejmar 2625 diyar dike ku şer û pevçûnên ji ber doza self-determinasyonê nabe ku wekî şerê navxweyî (şerê sivil) werin dîtin. Divê ew şer, wekî şerê navneteweyî werin qebûl kirin ku di van şeran de endamên NY'yê xwedî mafê mudaxelekirinê ne. Lê belê, Tirkiye serhildana çekdarî ya kurdan, ku ew 25 sal in di dome, wekî kêşeya terorê bi nav dike da ku welatên din mudaxele nekin. Ji ber ku Bengladeş bi mudaxeleya Hindistan'ê û Bosna û Xirvatistan jî bi mudaxeleya Amerîka û endamên din ên NY'yê ve bûn serbixwe. Lê belê Bîafra (Nijerya) û Katanga (Zaire ya berê- Komara Demokratîk a Kongo'yê) ji ber nebûna piştgiyariya ji derveyî welêt nikaribûn serxwebûna xwe berde-wam bikin.

Tiştê balkêş ew e ku, DYA'yê bi mudaxeleya leşkerî rejîma Saddam Husên rûxand û dewleta federal a kurdan nas kir. Lê belê heman DYA'yê çav û guhên xwe li mafên kurdên li welatên din ên wekî Tirkiye'yê girtine.

Encam

Li dijî kurdên li Tirkiye, İran û Sûriye'yê kiryarên bînpêkirina mafên mirovan û pişavtinê bi awayekî sistematîk pêk dihe. Her weha, kurd li van welatan nikarin bibin xwedî temsîliyeta siyasî. Tu rêyeke dadgehî û siyasî jî nîn in ku ew bikaribin sîdê jê werbigirin, an ku kurd ji mafê self-determinasyona navxweyî bêpar hatine hiştin. Her çend rewşa kurdên li Iraq'ê jî ji kurdên din baştir be jî seqemgîriyek nîn e. Rewş ji van hêlan ve gelekî dişibe rewşa li Yugoslavya û Bengladeş'ê. Lewma dikare were gotin ku

kurd xwedî mafê self-determinasyonê ne.

Di nav partî û komên kurdan de sebareti bi bikaranîna mafê self-determinasyonê lihevkirinek nîn e. Daxwaz çî dibin bila bibin, serxwebûn, federasyon yan jî otonomî (çandî yan siyasî), divê gelê kurd di encama referandûmekê de bi xwe biryarê bide ka çî dixwaze!

Ev nivîs ji bo Le Monde diplomatique kurdî hatiye nivîsan

(1) Di Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan de dihe gotin: “Vîna gelan divê bibe bingeha desthilatdariya hukûmetan.” Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan, G.A. Res. 217A (III)(1948), Bend. 21; Peymana Navneteweyî ya li ser Mafên Sivil û Şiyasî (ICCPR), Mar. 23. 1976, 999 U.N.T.S. 171, Bend. 1; Peymana Navneteweyî ya li ser Mafên Aborî, Komeleyî û Çandî 3, 1976, 999 U.N.T.S. 3, Bend. 1.

(2) ICCPR, Art.1; ICESCR, Art. 1; Danezana Viyana'yê û Bername ya Tevgerê (1993) xala 2, H. Gros Espiell, U.N. Doc. E/CN.4/Sub.2/405/Rev.1, U.N. Sales No. E.79.XIV.5 (1980).

(3) Doza Sahara ya Rojava, 1975 Dîwana Navneteweyî ya Edaletê 12, 31.

(4) Hector Gros Espiell Raportorê Taybet li dijî cudagerî û parastina kêmneteweyan (E/CN.4/Sub.2/405/Rev.1), 1980.

(5) Dadger Nagendra Singh Doza Sahara ya Rojava ~C.J. Reports 1975, p. 80.

(6) Ibid p. 31.

(7) Ibid. p. 68.

(8) Rapora Konferansa San Francisco ya li ser mafê self-determinasyonê 1/1/34 (vol. VI, p. 396).

(9) Jus Cogens têgiheke Latînî ye ku dihe wateya ‘huqûqa serdest/îcharî/bilind’. Divê hemû dewlet bi ya vê huqûqa bilind bikin. Qedexeya komkujî, koletî û îşkenceyê çend mînak in ku li jêr tu şert û mercî nabe ku werin pêkanîn. Di Peymana Viyana'yê ya sala 1986'an de jus cogen wekî doktrîneke huqûq navneteweyî hatiye pejirandin.

(10) H. Gros Espiell, op. cit. at p. 12.

(11) Erga Omnes têgiheke Latînî ye ku dihe wateya mafê kû dikare li dijî her kesî were doz kirin. Di huqûqa navneteweyî de ew têgih dihe wê wateyê ku her dewlet, ne hewce ye ku peymanek îmze kiribe, divê bi ya vê prensîbê bike. Wekî mînak qedexeya korsanî, koletî û cudageriya nijadî.

(12) Doza Belçîka- Îspanya, 1970 Dîwana Navneteweyî ya Edaletê 3, 32, Doza Nikaragûa, 1986 Dîwana Navneteweyî ya Edaletê 14. Komîsyona Înter-Amerîkan, daxuyanî, no. 13/93 (Gulan 25, 1993).

(13) <http://www.unhchr.ch/html/menu3/b/treaty4.asp.htm>

(14) Destûra Komara Federasyona Gelan a Yugoslavya'yê, 1946, art. 1; 1963, xala 1, 1974.

(15) Destûra Çekoslovakya'yê No. 143/1968 Sb., 1968, No. 327/1991 Sb., 1991.

(16) Doza Veqetînê ya Quebec'ê [1998]

(17) Ibid. 282.

(18) Ibid.

(19) Ibid 277-78, 280.

(20) Ibid 280-81.

(21) Ibid 285.

(22) Ibid.

(23) Hector Gros Espiell Raportorê Taybet li dijî cudagerî û parastina kêmneteweyan (E/CN.4/Sub.2/405/Rev.1), 1980.

KALAŞ; YÛNAN AN JÎ MAKEDON IN?

Aleksanderê Mezin û nêviyên wî yên wenda

NICOLAS AUTHEMAN*

Ji bo wan rojavayîyan ku hîna jî li Pakistan'ê dîkevin pey geşteke serpêhatiyane, gera li geliyê dûr ê Şîtralê li herêma Hindou-Kouch'ê, ku dikeve nav tixûbên Afxanistan'ê, yek ji aliyên herî balkêş ê rêwîtiyê ye. Di nava vê dekora xwezayî de, ku mirovan matmayî dihêle, heger rêya wan rêwîyan bikeve warê gelê kalaş, ewê bibin xwedî heman hestan ku Aleksanderê Mezin di dema dagirkirina herêma persîyan de, li bajarê Nysa'yê (1), hîs kiribû. Qewmê vî bajarî bi awayekî ecêb, wekî ew li welatê wî ji dayîk bûne, rojane îbadet û rîtuêlên bi awayê Dionysos pekdînin (2).

Gelê kalaş li herêmê xwedî taybetmendiyên cihê ye, di urf û adetên wan de hewayeke nerm heye, ji atmosfereke îslamî ya (derengmayî) dûr e û ew xwedî baweriyeke polîteîst (fire-xwedawendî) in, bi gotineke din baweriya xwe ne tenê bi yezdaneke di hînin, lê bi pir yezdanan di hînin. Ew di nava îbadet û rîtuêlên xwe yên olî de araqê vedixwin û awayê lixwekirina îslamî, wekî hicaba jinan red dikin. Li herêma Bumburet'ê, ku yek ji 3 geliyan e û ji wan re bûye war, surprîzeke mezin li ber çavên me ket: li Kalaşa-Dur, avahiyeke mezin a sê qatî hatiye avakirin. Baniyê wê bi mîmariya yûnana hatiye çêkirin. Di vê avahiyê de dibistanek, naven-deke tendurûstiyê û heta muzexaneyek jî hatine vekirin, stûnên avahiyê weha hatine neqşandin ku şopên mîma-riya yûnana antîk a îyonîyan di hîne bîra mirovan.

Ev çend sal in ciwanê kalaşî yê bi navê Wazir Zada li parlamentoya Peşawar'ê hewlê dide mafên hindikahiyên neteweyî yên gelê kalaş bi dest bixe. Helbet, li van zozanan pir dijwar e ku mirov doza bidestxistina herêmeke azad bike. Di destpêkê de armanc ew e ku bikaribin di

nava vê tevliheviyê de bidin qebûl kirin ku ew xwedî urf û ade-teke cuda ne û her weha bibin xwedî wî mafî ku bibikaribin bi serbestî araqê hilberînin û ji bo vexwarinê bikaribînin. Hilberîna û birakaranîna araqê ji ber ku di hê de ew made heye ku mirov pê serxweş dibin, ji aliyê musulmaniyê ve hatiye qedexekirin. M. Zada dibêje "Hemû hewldanên ji bo qedexekirina şerabê, çalakiyeke durû ye, ji ber ku gelek musulmanên niştcihên geliyê Şîtralê di hê cem me û şerabê vedixwin. Ev vexwarin li van herêman adeteke pir kevin e."

Ciwanê bi navê M. Zareen Xan ku ji bo xwendinê niha li Peshawar'ê di jî bi bîr dixê ku di salên 1950'î de, hejmara şênîya kalaşan dora 30.000 bû. Piraniya van kesan, di encama zora Îslamê de, ku Pakistan kir qangi- ren, neçar man, ola xwe biguherînin û bibin musulman. Zareen Xan mizgefta ku di nava gelî de hatiye avakirin nîşan dide û bi xemgînî dibêje "Îro hejmara me daketiye heta sê hezaran" (3000).

Di dema van axaftinan de, navê Alexanderê Mezin hat bi-lêvkirin, Zareen Xan dibêje "Berîya çend salan, di sikefteke li herêma Bumburet'ê de, perçeyekê zêr a bi figurê Aleksanderê Mezin hatiye dîtin." Mirovên berê yên kalaşî tu car naxwazin qala figurê Aleksanderê Makedonî bikin. Lê ciwanên wan di her firsendî de, qala wê ihtîmalê dikin ku Alexandrê Mezin wira û di vî herêmê re derbas bûye. Bi vî ihtîmalê ew dixwazin ku gelê herêma Kalaşa-Dur xwedî li kevnesopiyên xwe derkevin û bav û kalên xwe ji bîr nekin.

Herêma Kalaşa-Dur berî her tiştî berhema yûnaneke dilsoz e. Athanasios Lerounis mamoste- yekî kevn e, ev nêzikî sî sal in ku li geliyên derdora Kalaşê li ser navê rêxistineke ne-hukûmetî (NGO) ya bi navê Greek Volunteers (Dilxwazên Yûnan) kar dike. Ev kesê ku di heman demê

de profesor û bijîşk e, ev bîst sal in, li van gelî û zozanên bilind, gelek bi nav û deng e. Gelê herêmê di sala 2001'ê de, di çarçoveya bernameya tevkariya wezareta kar û barên derveyî ya Yûnanistan'ê ya bi navê Hellenic Aid (Alîkariya Helenî) de, alîkariyeke girîng a aborî bi dest xist. Di Nîsana 2005'an de, Adihîna û Îslamabad di navbera xwe de peymanekê tevkariyê îmze kirin û bal kişandin ser "têkiliyên çandî" yên di navbera her du welatan de. Di van demên dawî de jî gelek xwendevanên kalaşî ji bo ku biçin li Yûnanistan'ê perwerdehiyê bibînin, ji vî welatî mafê bûrsê bi dest xistin.

Rêxistina Hellenic Aid bi biryar naxwaze mîqtara alîkariyê ku ji herêmê re kiriye, eşkere bike. Xanim Maureen Lines ku zêdeyî 20 salan in ku rêxistina ne-hukûmetî ya îngilîz Hindu Kush Conservation Association (Komeleya Parastina Hindu Kush) bi rê ve dibe, di wê baweriyê de ye ku gelê yûnan heta niha "bi milyonan rûpî" alîkarî daye herêmê. Mirov dikare sedema vê alîkarî û tevkariyê di nivîsarên d'Arrien (3) de bibîne, Ev pirtûk qala rêwîtiya Aleksanderê Mezin û leşkerên wî (sala 329 beriya Îsa) ya li van herêman dike. Bi ya hin teoriyan, hukûmdariya yûnan a îyonî û ya sûriyeyî girtiyên di zindanên xwe de ne, da ku li herêmên herî dûr ên tixûbên împaratori- yê leşkerî bikin, wan serbest berdidin û di şînin wan deran.

Lê di rastiyê de heta niha di navbera gelê kalaş û artêşa yûnaniya kevin a Aleksanderê Mezin de tu têkilî nehatiye îspat kirin. Bi ya dîrokê ev herêma Hindou-Kouch tu caran di nava tixûbên fetihkirî yên Baktrian de cih negirtiye. Etnolog, civaknas Augusto Cacopardo ku bi qasî sih salan li herêmê di nava xebatên lêkolînê (4) de ye dibêje dema ku wî dest bi xebatên xwe kiriye, di nava gelê kalaş de, ne bi awayekî devkî ne jî bi rêya çîrokên efsanewî tu caran qala

rêça Aleksanderê Mezin nehatiye kirin. Ji aliyê din ve, lêkolînvanên zimanan û zimanzan jî di wê baweriyê de ne ku di navbera zimanên yûnanî û kalaşî de tu xalên hevbeş xuya nakin. Zimanê kalaşî ji ber ku ji malbata zimanên Hîndo-Ewropî ye, demekê hin zimanzanên yûnanî ketin nava heyecanê ku bikaribin bi zimanê xwe re aliyekî hevbeş bibînin. Kalaşî di rastiya xwe de, bi ya musulmanan, berramayiyên gelê kafir in. (wateya lîteraturî ya gotina kafir: ne îta- atkar). Piraniya wan îro çûne ser ola îslamê. Ev herêma li aliyê Afxanistan'ê, niha navê Nuristan (diyarê ronahiyê) lê hatiye kirin. Hebûna wan a li vî herêmê digihîje gelek beriya hatina Aleksander.

Efsane ya nêviyên yûnanî ku ev bîst sal in li herêmê vejiyaye, îro li serê çiyayên Hindou-Kouch'ê wenda bûye. Li rojava, referansên dîrokî her tim di navbera seyahatname (ya Marco Polo kaşîfê îngilîz) û efsaneyên wêjeyî (5) de diçin û di hê. Xebatên Etnolog Cacopardo yên li ser vî mijarê aliyekî din ê mese- leyê derxist holê. Dêhilatdarên musulman ên herêmê bi sed salan e, sebarê bi koka vî gelî pir îddîa li hev rêz kirine. Yek ji wan ew e ku dêhilatdarên Badaxshan'ê vî gelî wekî "Zulqarnain" bi nav dike (xwediyê du qiloçan). Ev sîfat di Quran'ê (6) de ji bo Aleksander di hê bikaranîna. Li herêma Hunza û Swat'ê ya Pakistan'ê jî meselokên bi vî rengî hene.

Yek ji mantiqên bingeîn ku koka vî qewmî bi Aleksander ve girê dide ew e ku dêhilatdarên nû yên herêmê îngilîz bi vî wêsiyê karibûn bi hêsanî ji xwe re di bin navê "têkiliya biratî" de hevalbendî çêbikin. Bi qasî du sed sal piştî hukûmdariya Badaxshan, nav û dengê Aleksanderê Mezin ji nû ve li herêmê belav dibe. Lêkolînên psîkosoyolog Nikos Kalampalikis nîşan didin ku di avakirina nasnameya nûjen a yûnanî de (7) he-

bûna Aleksander wekî navgîn di hê bikaranîna. Bi taybetî jî di van bîst salên dawî de navê wî her ku diçe bêhtir dikeve rojevê. Balkêş e ku li herêma Hindou-Kouch'ê jî tam di heman dema de an ku ev bîst sal in qala têkiliya wî ya bi vî gelî re di hê kirin. Ev navê kesayetiya dîrokî her weha di navbera Yûnanistan û Makedonya'yê de jî bûye mijara nîqaşan. Ji sala 1991'ê û vir ve hingî Makedonya ji Yugoslav- ya'ya berê veqetiyaye û serxwebûna xwe ragihandiyê, sebarê bi parvekirina mîrata navên dîrokî bi Yûnanistan'ê re li hev nake.

Yek ji aliyên girîng ku Komara Makedonya'yê ji cîranên wê, Albanî û Bulgaristan'ê cuda dike ew e ku ev welat sembolên xwe yên antîk ku li ber wendabûnê ne, ji nû ve derdixe ser rûyê avê. Lê belê Atîna hê jî di têkiliyên xwe yên dîplomatîk de Makedonya'yê wekî komareke serbixwe bi nav nake, wekî herêmeke dîrokî ya girêdayî xwe qebûl dike. Di sala 1992'an de Makedonya'yê ji bo amadekirina ala xwe ya neteweyî, Roja Vergîna wekî sembol hilbijart. Ev sembol di sala 1977'an de di gora Philippe II yê Makedonî de - bavê Aleksander - de hatibû kifş kirin. Ev hewldana Makedonya'yê ku xwest vî sembolê bixê ser ala xwe ya neteweyî bûbû sedema nerazîbûneke tund a rêvebirîya yûnan. Di encama wan dijberî û nerazîbûnan de, Komara Makedonya'yê neçar mabû ku di sala 1995'an de ev sembol dîsa ji ala xwe derxîne. Digel her tiştî Makedonya'yê dîsa jî di sala 2007'an de navê balafirgeha xwe ya li Skopy'ê (Uskup) kir "balafirgeha Aleksanderê Mezin."

Di vî tevliheviyê de, her du alî ji bo aîdiyetên nasnameya xwe ji hev cuda bikin û her kesê xwe îspat bike, ketin nava hewldan û di vî çarçovê de çûn cem gel û qewmên ku wekî "nêviyên" xwe dibînin. Alîkariya aborî ku Yûnanistan ev bi salan in

* Şewirmendê têkiliyên navneteweyî



Foto: Paşa İmrek

dide gelê kalaş dikare di vê çarçovê de were xwendin. Di van demên dawî de, li Yûnanistan'ê sebareti bi koka gelê kalaş de bi dehan belgefilm, film û pirtûk hatine amadekirin. Ji aliyê din ve, makedonî jî îddîa dikin ku li geliyekî din ê herêma Hindou-Kouch'ê, li geliyê Hunza'yê nêviyên rastîn ên Aleksander dijîn. Di Tebax'a 2008'an de, prensê herêma Hunza, Ghazanfar Ali Xan bi tevî prenses Rani Atiqa, ji aliyê Makedonya'yê ve hatin vexwendin û di axaftinên xwe yên li Skopye'yê de gotin: "Ji bo me rûmeteke mezin e ku îro em vegeriyane welatê xwe Makedonya'yê (8)." M. Kalampalikis ku li ser mijarê pirs jê hatin kirin, bê îronî dibêje: na, ev bûyereke psîkolojîk e ku wekî "cîhguherandin" dihê binavkirin.

Dîsa di van deman de, li ser vê efsaneyê fenomeneke din derketiye holê. Bi rêya navgînên danûstendinê yên nûjen, li ser gelê Kalaş gelek belgeyên din hatine amadekirin. Bi ya van belgeyan, bêtir ku haya gelê

kalaş jê hebe, dihê îddîa kirin ku li herêmeke dîr a xwedî îslamiyeke diwar, hin qewmên rojavayî ji bo bidestxistina nasnameya xwe di nava tekoşînê de ne. Xanim Lines dibêje her sal bi dehan lêkolîner û rojnamevan serî li wan didin da ku bikaribin sebareti bi vî gelî ku li hemberî hewldanên îslamizekirinê li ber xwe didin, agahiyan bigirin. Di cîhana entelektuelî de ku îro dunya kirine du beş: medenî û barbar (9), "nêviyên" Alexander her ku diçe gelek bi nav û deng dibin. Gelek derdor bi rêya roportaj û malperên internetê piştigiriyê didin hewldanên ji bo parastina nasnameyek ku dişibe ya rojavayî him ji aliyê neteweyî (10) ve him ji aliyê olî (11) ve.

Vejîna prisgirêka kalaşan bêguman pir dişibe, prisgirêkên din ên nasnameyî. Ji Anabasis'a Aleksander bigire heta roja me, mijarên sebareti bi cudahî, barbarî û asimilasyonê (12) bi dawî nebûne. Mantalîteya ku "pevçûna şaristaniyan" wekî teorî derdixe pêş û mantalîteya îs-

lamê ku kesên derveyî xwe tim wekî "yê din" destnîşan dike prisgirêkên nûjen ên nasnameyî ne. Doza Kalaş'ê wekî perçeyek ji van prisgirêkan dihê hesibandin. Di vê çarçoveyê de mirov dikare li ser armanca filma Oliver Stone ya bi navê Aleksander (2004) hin pirsan ji xwe bike. Gelo armanca wî ne ew e ku Alexanderê Mezin û George W. Bush wekî kesayetiyan nêzî hev nîşan bide. Ji ber ku her du jî kurên "rêberên serkêş" in ku hewldan tekoşîna diwar a bidestxistina Rojhilata Navîn ku bavê wan nîvco hiştibû, bidin berdewam kirin.

Ev teoriya dawî bêguman a herî nêzî rastiyê ye. Cacopardo destnîşan dike ku bi ihtîmaleke mezin, qewmê kalaş temsîla dawî ya çanda Paiyen a Hind-Ewropa'yê ye ku beriya belavbûna baweriya monoteîzm (yek-xwedawendî) û yekyezdanî, li herêmê bi cih bûne. Di rîtuêlên wan de hin aliyên ku dişibin îbadeta awayê Dionysos hene. Bi ya mîtolojiya yûnan ev xwedawendê kevin Dionysos ji

Rojhilat'ê hatiye. Ev mînaka prisgirêka kalaş jî nîşan dide ku "xeyalên nasnameyî" û cureyên wan ên neteweyî, pir caran dibin sedem ku çîrokên cur bi cur derkevin holê û di vê çarçoveyê de civînên ew qas hêsan û surprîz ên entelektuelî dihên organîzekirin ku mijarên Huntington û Dionysos li ber çîrokên wan kêmtir dimînin.

Wergera ji fransî Bedran Dere

(1) Dibe ku navê wî yê îro Celalabad a li Afغانistan'ê be, dibe ku ji ber îbadeta awayê Dionysos, navek wisa lê hatibe kirin.

(2) Cf. Arrien, L'Anabase d'Aleksander le Grand, Minuit, Paris, 1984, pirtûk V, beş. I heta III. Di sesala II'an de piştî îsa hatiye nivîsandin. Ev nivîsên d'Arrien li ser rêwîtiya Aleksander wekî belgeya herî girîng dihê dîtin.

(3) Ibid, pirtûk IV.

(4) Cf. Augusto S. Cacopardo û Alberto Cacopardo, Gates of Peristan,

Rome, Istituto Italiano per l'Africa, L'Oriente, 2001, û Augusto S. Cacopardo, Proceedings of the First International Conference on Language Documentation and Tradition, with a Special Interest in the Kalaş of the Hindu Kush Valleys, Himalayas – Thessaloniki, 7-9 novembre 2007.

(5) Cf. Rudyard Kipling, The Man who would be King (1888), û filma John Huston (1975).

(6) Coran, S. XVII, 83, 84, 85.

(7) Nikos Kalampalikis, Les Grecs et le mythe d'Aleksander. Etude psychosociale d'un conflit symbolique à propos de la Macédoine, L'Harmattan, Paris, 2007.

(8) "Hunza Royals visiting Macedonia", Macedonia Daily, 12 Juillet 2008.

(9) Cf. Tzvetan Todorov, La peur des barbares: au-delà du choc des civilisations, Robert Laffont, Paris, 2008.

(10) Li ser malpera Altermediainfo.com, sebareti bi kalaşan de, pir referans hene. Versiyona wê ya amerîkî ji aliyê David Duke ve hat çekirin

(11) Li ser pir malperên olî yên orthodoxes.

(12) Li vê derê serhildana Opis dihê ziman, berê îsa di sala 324'an de serleşkerên Aleksander rastî artêşa pers dihên.

“GLOBALÎZM HÊMANEKE AŞTIYÊ YE?”

Di nava werçerxeke gerdûnî de

ANDRÉ BELLON*

Ya rastî ew tiştê ku mirov bi awayekî lezgîn û bi kurtî, navê “globalbûnê” lê dikan, yan jî bi navê gelekî îdeolojîk ê “gerdûnbûnê” dihê nasîn, bi awayekî gelekî nakok pêk hat. Yên ku ev nav lê kirin jî guman nedikarin ku ev nakokî ew qas mezin e. Wan xwest ku li ser mirovan ferz bikin da ku bibin xwediyê nihêrînekê ku pesnê dîroka modern bide. Wan her weha ya bihurî yan jî bîr dikir yan jî piçûk dixist, sedemên muxalefetan ku bandor li serdeman kiribûn îhmal dikir. Wan an lîberalbûnê li pergala nû ya dinyayê hemû piçûk dikirin, an jî wekî kevneperestî dinirxandin.

Lê belê şirovekirîneke gelekî cuda guncan e. Robert Bonnaud, analîstekî dem û werçerxên diyarker ên dîrokê, weha rave dike: “Di sedsala 20’an de, êdî dîrok ji navendbûnê û ji serweriya Rojava’yê xelas bû. Hetta digel afirandinên teknolojîk jî pêşveçûn êdî bi awayekî heqanîtir belav dibûn. ... Ji ber ku ji salên 1970 û 1980’î û vir ve, vê rewşê rê li ber rewşeke berevajî vekir. ... Gelo wateya wê ew e ku ji bo ji çar paran sisîyê mirovatîyê hatiye dawîya dîrokê? (1)” Ya rastî armanca se-reke ya destwerdana nihêrînê li ser globalbûnê ew bû ku, serdestiya aborî ya Rojava’yê di bin kirasê gerdûnbûneke erînî û xwezayî de rewşa bike.

Nezanîn û nehesibandin du tişt in ku di bingeha vê nihêrînê de ne: Ji aliyekî piraniyê ve globalbûnê ku îro li dar e û baş girêdayî şert û mercên heyî ye, bi tenê globalbûneke pîrsgirêkên aborî ye; ji aliyê din de jî bi hev ve girêdayîbûna bûyerên dîrokî yê cihanê ne, diyardeyeke nû ye. Beriya sedsalek û nîv, dîroknas û fîlozofê fransî-îtalî Joseph Ferrari weha nivisîbû: “Di dîroka min a şoreşên Îtalyayê de, min nîşan da ka çawa dewletên gelekî ji hev cuda, bêtî ku pê zanibin, di heman rêyê de bi hev re dimeşîyan ... [ez hewlê didim rastiya] van giştîkirinan [bidim

fêm kirin] ji bo vê jî rewşa dinyayê bi mînakê Çînê diyar bikim (2).” Heger em wisa lê bi-nihêrin, wê demên dîrokî hemû wekî gerdûnbûneke, yan jî bêhtir wekî bûyereke cihanî bîn dîtin. Wê gavê bi tenê pîrsek dimîne; kîjan bûyerên cihanî girîngtir in û kî ji wan kar dike.

Bi awayekî têra xwe derengmayî, Navenda Neteweyî ya Lêkolîna Zanistî (CNRS) di sala 2008’an de ev pîrsa girîng kir: “Gelo gerdûnbûnê hêmaneke aştiyê ye yan na?”. Hin encam di heman demê de hem têkiliyên îro yê navneteweyî û hem jî yê şerên dema bihurî ronî dikin: “Çendîn welat ji bazirganiya navneteweyî re vekirî dibin, xetera qewimîna şer li cem wan ew qasî mezintir dibe. Bazirganiya dualî di navbera du welatan de ihtîmala şer kêmtir dike. Bazirganiya bi temamî ya pîralî di navbera van her du welatan û welatên din ên cihanê de, ihtîmala ku di paşerojê de şerek di navbera wan de derkeve, zêdetir dike. Têkiliyeke li ber çavan û eşkere di navbera bazirganiya cihanî û derketina şeran de tune ye (1870-2001) (3).”

Îro, lawazbûna dinyaya yekqutbî, ya ku dema sedsala bihurî qulipî sedsala nû, pêk hat û derket li ser dîka bazirganiyê, pêşketina welatên nû (Brezîlya, Çîn, Hindistan, Afrîka ya Başûr...) ku xwediyê demografîyên dînamîk in, van dijberîyan xurttir dikin. Ji ber ku neolîberalîzm tiştên gelekî girîng vediguherîne çavkanîyên kêmtir peyda yê wekî – av, erdên berhemdar ên cotkariyê, sotemeniyên fosîl, û hwd...

Erê, sexlembûn û pêşdetirbûna berjewendiyên Rojava karibûn îluzyona hebûna hev-kêşîyeke cihanî ya nisbî peyda bikin. Tevî ku kirrîndîrotenên transatlantîk (yên di navbera parzemîna Amerîka û dinyaya mayî de) hîna bi rola motorê bazirganiya navneteweyî radibin, wisa xuya ye ku hêza amerîkî garantiya seqemgîriyê ye. Lê dinyaya yekqutbî ku bi salên 1990’î re ava bû, nakokiyên heta vê demê kifş nekirî, darî çav kirin.

Planên vejandina aborî ku li pey hev hatin, seqemnegîriya

aboriya amerîkî nîşan dan. Ji dema ku amerîkiyan Iraq dagir kir, an ku ji sala 2003’an, û vir ve, Dewletên Yekgirtî yê Amerîka’yê lawazbûn û bi tîkçûna hard power (hêza hişk) a leşkerî diêşin. Derfetên budçeya wan êdî têra lêçûna wan nake û hêzên serbazî bi xwe ketine rewşeke mîna krîzekê. US Air Force (Hêzên Hewayî yê DYA’yê), Navy û marines (hêzên deryayî) dibînin ku alav û cîhazên wan êdî kevin bûne û lêçûnên tamîrkirinê jî giran dibin. Her çend ihtîmala êrîşbirina ser Îranê heye jî, çî bi awayekî sererast çî jî bi alîkariya Îsrailê, wisa xuya ye ku “siyaseta bi darê zorê” êdî ne realist e, guncan nîn e ku bi ser keve. Bi ser de jî, rejîmên ku rola Amerîka’yê li herêma xwe bi cih dianîn, yê wekî rejîma Misir an jî ya Cezaîrê, westiyayî û bêbandor xuya dibin.

Wisa xuya ye ku pardariya transatlantîkê ya kevin gelekî serûbinî hev bûye û bazirganî ku şerta teorîk a tîkiliyên baş e jî nîşanên kêmbûna xwe dide der. Li ber vê rewşê Konseya Aborî û Civakî ya Fransî vê tespîtê dike: “Bazirganî cihê ku bi taybetî Yekîtiya Ewrûpa’yê û Amerîka li hev radikin, xisletên wan ew in ku qanûnên çareserkerîna li-hevnekirinê Saziya Bazirganiyê ya Cihanê her diçe kêmtir pêk tînin. (4)” Naxwe em ê çawa ji hebûna ahengekê bawer bikin ku heta niha wekî rastiyeke dîrokî ji me re qala wê dihat kirin? Di sala 2005’an de Axel Poniatowski di rapora Komisyona Kar û Barên Derve ya Meclîsa Neteweyî ya Fransa’yê (Assemblée Nationale) de van bûyeran weha analîz dike (5): “Gelo Dewletên Yekgirtî yê Amerîka’yê û Ewrûpa êdî di du dinyayên cuda de dijîn? Axaftinê li ser tîkiliyên transatlantîkê gelek caran rê vedikin li ber axaftineke li ser dîmendirîjîyê nîrxên hevpar ên di navbera her du parzemînan de (6).”

Ewrûpa, ku di warê mezinkirina bazara xwe ya yekane de gelekî pêşveçûyî ye, bi xwe jî dibîne ku hêzên navendî bandorê lê dikan. Her çî qas li aliyekî zêdebûneke gelekî eşkere ya ba-

zirganiya navbera dewletên Ewrûpî ji demê avabûna wê heta bi salên 1990’î pêk hatibe jî, digel firehbûna Yekîtiya Ewrûpa’yê heta bi 27 dewletan, êdî piştgiyê mezinbûna vê bazirganiyê ji firotinê ber bi derveyî welatên Ewrûpa’yê ve kêmtir e. Bazirganiya di nava qada euroyê de jî, bi awayekî eşkere kêmtir bû (7).

Bi awayekî paralel, tîkiliyên siyasî yê nav Yekîtiya Ewrûpa’yê bi kûrahî pêş ve çûn. Ji dema hilweşîna Dîwarê Berlînê ya di sala 1989’an de û firehbûna Yekîtiyê ya di sala 2004’an de bi tevîbûna welatên rojhilata Ewrûpa’yê pêk hat, Almanyayê êdî dibe navenda jeostratejîk a parzemîna pîr (Ewrûpa wisa dihê binavkirin). Wekî sembola vê girîngiyê Almanyayê di nava koma tîkildariyê ya sebarê bi pîrsgirêka bîrnamaya navokî ya Îranê cihê xwe digire (8). Dadgeha Destûra Bîngehîna Almanyayê ya li Karlsruhe, bi qebûlkirina Peymana Lîzbonê, wateyeke huqûqî da vê rewşê. Lê belê dadgehê xwest ku “ji bo ewlekirina kêrhatîbûna mafê hîlbijartinê û ji bo parastina mafê bîryardayîna xwe ya demokratîk” tedbîr werin girtin (9). Dadgehê hebûn û bîrdawîbûna gelê alman û nebûna gelê ewrûpî jî di bîryara xwe de derdixist pêş.

Lewra hem yekbûn û ahenga Yekîtiya Ewrûpa’yê bi awayekî eşkere û hem jî zêdebûna nelihevîkirin û nakokiyên navxweyî di heman demê de hene. Bi vî awayî du tişt bi hev re pêk dihên: Li aliyekî rêvebirên ewrûpî pêkanîna peymanekê wekî ya Lîzbonê – di salên 1990’î de çêbûye – bi darê zorê ferz dikin, li aliyê din de jî Joschka Fischer, wezîrê berê yê Karên Derve yê Almanyayê balê dikişîne ser dawîya vê demê û dibêje: “Dibêjin îro em êdî euroyê di bazarê de bikar nayînin. Em dibin wekî alîgirên De Gaulle... em Ewrûpa’yê her ku diçe zêdetir wekî amûrekê dibînin, ne wekî projeyekê. (10)”

Ji van hemû bûyeran, ya ku em karin derbixin bi tenê jinûvepêkanîna hev-kêşîyê ye.

Helbet, eger mirov bawer

bike ku Yekîtiya Ewrûpa’yê, duqutbiya Dewletên Yekgirtî û Çînê û veguherandina G-8’an, heta ku bibe G-20, wê destûrê bidin ku karê cihanê baştir were birêvebirin – bêtî ku guman ji “rêvebirîya baş” were kirin. Lê belê dinya ji xwe him di nava hewldaneke parastina vê aramiyê de ye û him jî di nava ji-hevketîneke berevajî ve rewşê de ye.

Seqemnegîriya di navbera ahengeke kevin û yeka din de ku nû ava dibe, bi tevneke tevlihev a hevgirtinê en ku dirûve wan diguhere dihê karakterîzekirin. Li hemberî globalbûna darayî, ruh careke din bi stratejiyên neteweyî dihê: Welatpareziyeke aborî û civakî li Almanyayê û Rûsya’yê çêdibe. Ev welatparêzî li Amerîka ya Latîn renegekî wisa digire ku li ber pergala global bêtir radibe.

Hejmara komên dewletan ku bi peymanên fermî girêdayî hev in zêdetir dibe: Paralelî Yekîtiya Ewrûpa’yê, peymanekê wekî ya Kirîndîrota Serbest a Bakurê Amerîka’yê (NAFTA) (11), Bazara Hevpar a Başûr (Mercosur) (12), Yekîtiya Neteweyên Başûrê Rohilata Asya’yê (Asean) (13) hatin mohrkirin. Çîn îro ew dewlet e ku Japonya herî zêde pê re bazirganiyê dike. Japonya jî nîvê kirîndîrotenê xwe yê derve bi herêma ji Kore ya Başûr û Çîn heta bi Awûsturalya’yê re dike. Di heman demê de koma dewletan a ku ji Brezîlya, Rûsya, Hindistan û Çînê pêk dihê (BRIC) (14), bi awayekî fermî doza ahengeke nû ya aborî ya navneteweyî dikin; weha dihê gumankirin ku “giraniya wê (BRIC) ya di aboriyê de ku sala 2004’an ji sedî 10 bû, sala 2025’an ji sedî 20’an bi-bihure. (15)”

Ev piştgiyê û hevgirtinê nû, pergala aborî ya heyî ya serwer hem rexne dikin û hem destek dikin. Binketinê wekî ya dewra Doha’yê (peymanekê 3 salî) li ser bazirganiyê, û wekî civîna bilind a Kopenhagê ya li ser avûhewayê, vê yekê nîşan didin. Netewepareziyên aborî ku li hemberî ve pergale radibin, bi awayekî radikaltir derdikevin pêş. Ev yek bi mînakê Rêxistina Hevkariya Şangayê (OSC) (16)

* Serokê berê yê Komîsyona Kar û Barên Derve ya Meclîsa Neteweyî ya Fransa’yê.




Foto: Murat Yazar

baştir dihê fê m kirin: Bêguman li aliyekî armancên wê yên aborî hene, lê li aliyê din jî rûyekî wê yê gelekî siyasî derdikeve holê û çalakiyên serbazî yên rûs-çînî organîze dike û tatbîkatekê ku dişibe dagirkirina Taywanê pêk dihiîne.

Li parzemîneke din, Hevgirtina Bolivarî ji bo Gelên Amerîka'yê (ALBA) (17) welatên Amerîka ya Latîn û yên Karaîban li hev dicivîne. Ev welat li dijî serdestiya kevneşop a amerîkî ne. Prensîba serweriya gel derdixin pêş û serdestiya dolar jî bi avakirina Sîstema Yekane ya Berdêla Buha ya Herêmî (SUCRE) (18) red dikin. SUCRE pereyekî hevpar bû û di 16'ê Nîsana 2009'an de hat qebûl kirin. Avabûna Yekitiya Neteweyên Başûrê Amerîka'yê (UNASUR) (19), nemaze zêdetir otonombûna Brezîlyayê bi xwe re anî.

Di "dinyaya nû ya pîr qutbî" de, heman beşdar dikarin hem li dijberî hev bin û hem jî hevalbendê hev. Bi vî awayî Rûsya û Çîn ku endamên BRIC'ê û Koma Şangayê ne, nihêrînen dijberî terorîzmê yên Washingtonê qebûl dikin ... û tekiliyên xwe bi Tehranê re jî qut nakin. Pekîn a ku bi kirrîna bonoyên xezîneya Amerîka'yê ewlekariya dolar misoger dike, qala derfeta ava-

kirina bazarekê dike ku ev bazar wê bi pereyê asyewî bixebite. Pişt re jî heman Pekîn qala, endekskirina yuanê (pereyên Çîn'ê) bi ya dolar dike. Têkiliyên Brezîlyayê û Washingtonê baş in, belê têkiliyên wê û rêvebiriya Havana'yê jî baş in. Ew piştgirî dide Tehranê da ku bigihîje hêza navokî ya sîvîl. Serokdewletê Venezuela'yê Hugo Chavez li welatê xwe li ser navê laîkbûnê, li dijî hiyerarşiya katolîk têdikoşe û di heman demê de rejîma dînî ya Mahmûd Ehmedînejad erê dike û vê yekê eşkere nîşan dide. Serokdewletê Bolîvyayê Evo Morales, ku hevalekî baş e Serokdewletê Brezîlyayê Luiz Inacio Lula da Silva ye, dewra G-20'an red dike ... Brezîlyayê bi xwe di G-20'an de bir rola xwe radibe.

Di hewladana nîşandana nerazîbûna ji yên alîgirê azadiyê û serxwebûnê de, hêzên muhafazakar piştgirtiya darbeya serbazî ya li Hondurasê dikin, gefan li Venezuela'yê dixwin, yan jî dema rastgir li Şîli'yê dibin desthilatdar hev du pîroz dikin û kêfxweşiya xwe nîşan didin. Îluzyonên li ser gerdûnbûneke bi exlaqîr, civakîr an jî ekolojîktir û aramtir zêde dibin. Tevî ku navgînên hê jî dewamîkirinê yên pergala heyî hene jî,

krîza îdeolojîk a gerdûnbûnê ku navenda wê Dewletên Yekgirtî ye, baweriyê bi vê pergalê hebû, lawaz dikin. Krîza aborî ya sala 2008'an vê yekê eşkere dike.

Hevgirtinên nû yên zêde yan jî potansiyela hevgirtinên nû, nîşana lêgerîneke paradiğmayeke nû ye, ya ku karibe wan marjînal bike. Dîroknas û kronîkvan William Pfaff, pisporê siyaseta derve ya Amerîka'yê ye. Ew derdixe holê ku di navbera hîlbijartina B. Obama li Dewletên Yekgirtî, serketina muxalîfên sosyal-demokratên a li Japonayê û li Îngilistanê gengeşeyên li ser paşeroja têkiliyên transatlantîk de pêwendiyek heye (20). Em dikarin li vê listeyê gelek alîgirtinên nû zêde bikin ên wekî pêşveçûna dîplomasiya alman, tekiliyên di navbera Rûsya û Polonyayê de nû peyda dibin, ji nû ve diyarkirina helwestên stratejîk ên Tîkiyeyê (21) ... Bi vî awayî bi maneya ku Joseph Ferrari dixwest bibêje, xetên gerdûnbûneke nû dihên kişandin, maneya vê jî hebûna girêdaneke objektîf a di navbera beşdaran de ye ku xuya ye ji hev belawela ne.

**Wergera ji fransî
Lokman Turgut**

(1) Robert Bonnaud, Y a-t-il des tournants historiques mondiaux? (Gelo demên diyarker ên dîrokî yên gerdûnî hebûn?, Kimê, Parîs, 1992.

(2) Joseph Ferrari, La Chine et l'europe. Leur histoire et leurs traditions comparées (Çîn û Ewropa: Dîrok û reûresmên wan bi awayê li ber hev girtî), Parîs, weşanên Librairie académique, 1867.

(3) CNRS, Institut de sciences humaines et sociales (Instituya Zanistên Mirovan û Civakî), 14'ê Nîsana 2008'an.

(4) Conseil économique et social (Konseya Aborî û Civakî), fikra 24'ê Adara 2004'an li ser rapora Michel Frank, Parîs.

(5) Rapora hejmara wê 2567 ya 11'ê Cotmeha 2005'an.

(6) Devjêberdana çêkirina mertalê li dijî mûşekan, mirov dikare wekî berjewendiyekê kê mî pîşde ya Dewletên Yekbûyî beramberî Ewropayê binirxîne.

(7) Para bazirganiya bi derve re ya di nava herêma de ya 'panzdehan' (15 dewletên endamê wê demê endamê Yekitiya Ewropayê) di sala 1990'î de ji sedî 66 bû, di sala 2004'an de ji sedî 61 bû. Di nava qada euroyê de ev rêje ji sedî 55'ê sala 1990'î daketa ji sedî 51'ê sala 2004'an.

(8) Di nava vê komê de pênc endamên daîmî yên Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekgirtî ku hemû jî hêzên nukleer in û Almanya cih digirin.

(9) Biryara 30'ê Hezîrana 2009'an a li ser ligorîbûna Destûra Bingehîn a Peymana Lîzbonê.

(10) Arnaud Leparmentier di rojnemaya Le Monde a 16'ê Tîrmeha 2009'an de ji devê wî ev gotina wî nivîsiye.

(11) Jêrenota wergêr: North American Free Trade Agreement

(12) Jêrenota wergêr: Mercado Común del Sur

(13) Jêrenota wergêr: Association of Southeast Asian Nations

(14) Jêrenota wergêr: Ji tîpên destpêkê yên dewletên Brezîlyayê, Rûsya, Hindistan (India) û Çînê (China) pêk tê.

(15) "BRIC II et la croissance Big-Bang (BRIC II û mezînbûna Big-Bangê", Rediff.com, 10'ê Mijdara 2004'an.

(16) OCS, jêre her weha Hevgirtina Şangayê jî dihê gotin, di vê hevgirtinê de Rûsya, Çîn û gelek dewletên Asya ya Navîn jî cih digirin.

(17) Jêrenota wergêr: Alianza Bolivariana para los Pueblos de Nuestra América

(18) Jêrenota wergêr: Sistema Único de Compensación Regional

(19) Jêrenota wergêr: Unión de Naciones Suramericanas

(20) "Notes sur une tentative de révolte (Notên li ser hewldaneke serhildanê)", 5'ê Îlona 2009'an, dedefensa.org.

(21) Bixwîne Wendy Kristiansen, "Ni Orient ni Occident, les choix audacieux d'Ankara (Ne Rojhilat û ne Rojava, tercîhên Enqerê yên wêrek)", Le Monde diplomatique, Sibata 2010'an.

PEYMANA BELAVNEBÛNA NUKLEER

Kunên di mertalê de

OLIVIER ZAJEC*

Fikra Peymana Belavnebûna Nukleer (Navokî) di salên 1950'î de dest pê kir. Di vê demê de sê welat (Dewletên Yekgirtî, Rûsya û Brîtanya) ji xwe xwediyê çekên navokî bûn û du dewletên din Fransa û Çîn'ê jî lêkolînên xwe dewam dikirin. Çavdêran qet guman jê nedikir ku her du jî wê bigihîjin armanca xwe (Parîs di sala 1960'î de bû xwediyê çekên navokî û Pekîn jî di sala 1964'an de). Ji ber ku di vê mijarê de xwediyê hêza herî pêşketî bû, Dewletên Yekgirtî têkildarê sereke yê bisînorkirina pêşbîrka çekên navokî bû. Ji destpêka salên 1950'î ve ji bo "bisînorkirineke" diplomatîk a ji aliyê dewletan ve çekirina bombeyê, amerîkiyan hewl da. Bi vê mantiqê serokê Dewletên Yekgirtî Dwight Eisenhower di 8'ê Kanûna 1953'an de, di Cîvîna Giştî ya Neteweyên Yekgirtî de pêşniyar kir ku Ajansek were damezrandin ku peywira wê kontrolkirina bikaranîna madeyên navokî be (1).

Di perspektîfa aştîya cîhanî (û ji bo parastina statuyên xwe yên heyî) de hêzên din ên navokî û yên ku hindik maye bibin hêzên navokî bi lez û bez hesabên xwe kirin: Wekî din berjewendiya wan e ji ku saziyek hebe ku pêşketina wan bipejirîne û "demokratîzasyona" navgîneke hêza rawestandinê ku bêhtir cudageriyê dike. Hevgirên objektîf xwe ji badana zend û bendan venadin.

Fikra Eisenhower ku xwe dispart xetera belavbûneke giştî, rêya xwe çekir. Demeke dirêj di têkiliyên navbera Dewletên Yekgirtî û Yekîtiya Sovyetan (Şerê Kore'yê hîna nû bi dawî bûbû) ev fikr wekî çek hat bikaranîn. Piştî nîqaşên bi heraret û

kelecan Neteweyên Yekgirtî di dawiyê de di Cotmeha 1956'an de Ajansa Navneteweyî ya Enerjiya Navokî (IAEA) damezrand. Erka wê ya rastî bi ya xala 3.5 a destûra wê weha ye: "Mîsogerkirina ku wê maddeyên navokên wan parçe dibin (radioaktîf) ên taybet û madeyên din, xizmet, ekîpman, bicihkirin û zanînen ji aliyê ajansê yan bi daxwaza wê, yan bi rêvebirîya wê û yan jî di kontrola wê de ji bo armancên leşkerî neyên bikaranîn." Li aliyê din xala wê ya 3.1 weha dibêje: "ajans li tevahiya dinyayê teşwîq û hêsan dike ku enerjîya navokî ji bo armancên pasîfîk û di qada lêkolîna wê mijarê de were pêşxistin û bikaranîn."

Rêza peywirên li pêş dihen girtin, di nivîsa destûrê de berepaş e: Ji ber hevkeşîya di navbera hêzan a wê demê de xala 1'ê encama ya 5'an e û ne berevajî. IAEA pêşî nobetdarek e û paşê jî derfet-afirîner e. Xala 3.5 rê li ber encameke mezin vedike: Tevî ku xeter heye wekî komîteyê teknîk a dîrî navendê û lawaz bimîne, IAEA neçar e ku xwediyê peymanê ferzker be ya ku peywira wê ye ku wê bide qebûlkirin. Nabe bibe notirvanekî bêqanûn.

Ev "nexşerê" ya xwediyê nirxa qanûnî û gerdûnî wê bibe Peymana Belavnekirina Navokî (Treaty of Non-proliferation - TNP). Di 1'ê Tîrmeha 1968'an de 43 dewletan (Koreya Bakur jî tê de) ev peyman mohr kir. Di 5'ê Adara 1970'î de peyman hat erêkirin. Ji bo 25 salan kete meriyetê. Ewê bi serketana heta ku bibûya peymana herî zêde "komker" a cîhanê (bi tenê sê dewletan angî Îsraîl, Hindistan û Pakistan'ê peyman qet mohr nekirin). Deqa peymanê di destpêkê de qala armanca gihiştina gerdûnî ya enerjîya navokî ya sîvil dike û ya ku me ji bîr kirî angî îdeala mirovatiyê bibe çekên navokî, bi bîr dixê. Ya ku dewletên peyman mohr kirî

dixwazin di encamê de ev e: "Kêmkirina tengezariyên navneteweyî û xurtkirina bawerîbêhevanîna dewletan da ku guncan bike hilberîna çekên navokî were rawestandî, tevahiya çekên navgotî, çekên navokî û bataryayên wan ên li cebîlxaneyên neteweyî werin tunekirin. Ev hemû jî bi ya peymanê bêçekkirina giştî û bêkêmasî ya di kontrola hişk û kêrhatî ya navneteweyî de wê pêk werin." Bi vê wateyê, serokê Amerîka'yê Barack Obama heger li şûna axaftina xwe ya li Pragê ya li ser "sifir alternatîf" - ya ku ji îddîayan hindiktir wêrek bû - deqa peymanê TNP bixwendana wê tiştê guhertî negotana (2).

Li benda vê "vîzyona devê mirov ji hev dihele", TNP bi rewşa xwe ya niha nivîsî, teknolojiya navokî ya leşkerî bi deh xalan carnane eşkere û carnane sergirtî diparêze. Bi awayê eşkere di xalên 8. û 10. de her dewleta peyman mohr kirî, mafê wê heye ku guhertinan pêşniyar bike û eger "bûyerên awarte yên têkildarî mijarên vê peymanê biqewimin û ev bûyer ne bi ya berjewendiyên sereke yên welêt bin" ev welat dikarin xwe ji peymanê vekişînin. Xalên 2. û 3. cewherê bi rastî yê deqa peymanê ne. Wekî mînak di van xalan de bi awayê sergirtî qala saziyê belavnekirina plan û madeyên çek bi wan dihen hilberandin dike û ev xal her weha dibêjin "welatên ne xwediyê çekên navokî (WNXSN)" ne, wê soz bidin ku ewê çekên navokî ji bo leşkerî hilneberînin û ewê rejîma mufetîşiyê (çavdêriyê) ya di bin reveberîya IAEA de qebûl bikin. Li hemberî wê yekê, mafê van welatan wê hebe ku bigihîjin teknolojiya sîvil a ku ji aliyê "welatên xwediyê çekên navokî (WXSXN)" ve dihe misogerkirin (3).

Tevahiya hêza peymanê û tevahiya zelaliya wê jî di vir de ye: Da ku bi dilê xwe û azad

WNXSN dev ji çekên navokî berdîn divê li hemberî wê WXSXN li aliyekî bi awayekî rêkûpêk û bi rastî çekên xwe yên navokî kêmbikin (4), li aliyê din divê teknolojiya xwe ya navokî bi awayekî serbest belav bikin. WXSXN wê her weha doktrînen bikaranîne yên gelekî bisînorkirî û hişk qebûl bikin da ku WNXSN xwe di xeterê de his nekin. Yek ji van sê xalan jî wê tu carî bi rastî pêk neyê, lê belê tevî gelek nîqaşan jî (5) heta ku sala 1995'an ji bo demeke bisînornekirî bikeve meriyetê peymanê TNP wê ji xwe re rewabûnek çekirana. Di sala 1998'an de protokoleke li peymanê zêdekirî azadiya giştî û bêkêmasî ya tevgerê ya mufetîşên IAEA yên li ser peywir misoger kir (6).

Sê zehmetiyên mezin peymanê lawaz dikin: Li aliyekî sînora di navbera teknolojiya navokî ya sîvil û ya leşkerî de her diçe bêhtir dikeve nav hev; li aliyê din xisleta danezanîne ya pêvajoya kontrolê (dewlet haya IAEA'yê bi tesîsên ku divê werin kontrolkirin dixin, lê dikarin hinan veşêrin) û her weha binavnekirina "delîlên" reel ên kêmasiyên pêkan; û herî dawî derfeta hin WNXSN'ên peyman mohr kirî heye ku ji bo werin "ber hilberîna" navokî yan jî jê bibihurin manevrayan dewam bikin, wê jî dikarin bi rêze mohrkirin-erêkirin-serlêdanan dirêj bikin (7).

Tevî tedbirên di nivîsa peymanê belavnekirine de jî, hejmara binketinan gelek e. Lê belê gelo ev binketînen ku mirov dikare yekser bi peymanê TNP ve girê bide ya na? Hêja ye ku mirov wê pirsê bike. Xalên tarî yên sereke yên ku divê mirov qala wan bike ev in: Birayên dijmînen hev ên başûrê Asyayê Hindistan û Pakistan bûn xwediyê çekên navokî û di 1974 û 1985'an de bûn hêzên navokî yên leşkerî- her duyan jî peymanê TNP mohr nekiriye. Di mijara Hindistan'ê de di çarço-

veya şerê sar de Washington'ê heta 1965'an û paşê Mosko-va'yê ji qestan ji ber sedemên hevkeşîya jeopolîtîk alîkarî dan Delhiya Nû. Lê belê ev "pêvajoya dersdayîne" berê ya çekirina peymanê TNP û erêkirina wê ya bi giştî di sala 1970'î de baş pêk hatibû. Beriya 1974'an an ku sala ku Hindistan'ê yekemîn bombeya xwe teqand, êrîş hatibû kirin (8).

Mijara Pakistan'ê bi xwe bi zelalî û nediariyê dest pê dike: Fransa jî di nav de hin dewletan zanîna xwe ya sîvil dan Pakistanê, bi hêviya ku Îslamabad wê tev li peymanê TNP'ê bibe. Ev yek pêk nehat û piştî rawestandina wê alîkariyê, Çîn'ê ev alîkarî dewam kir heta ku Pakistan di sala 1985'an de bi ser ket. Gelo ev "bînpêkirina peymanê" ji aliyê dewleteke xwedî çekên navokî ve bû? Bi awayekî xwerû teknîkî na, lewra Pekîn'ê heta sala 1992'an peymanê TNP'ê mohr nekiribû.

Îsraîl jî yek ji binketînen mezin e û di nava listeya yên ku peyman mohr nekirî de ya herî bi pîrsgirêk e. Lewra Îsraîl bi awayekî fermî rastiyê înkâr dike (berevajî Pakistan û Hindistan'ê) û Dewletên Yekgirtî tevî ku gelekî baş pê dizane Tel Avîv wekî ku nexwediyê çekên navokî be nîşan dide jî alîkariyê bi dilê rehet û wêrek dide Îsraîl'ê. Ev yek jî rewşê xirabtir dike.

Di nava dewletên peyman mohrkirî de Taywan, Koreya Başûr û Japonya bîguman di warê teknîkî de bûne "dewletên li ber hilberîne". Lê belê Taywan nikare peymanê bin pê bike, lewra statuya wê destûrê nade ku peymanê mohr bike (siyaseta hebûna yek Çîn'ê). Di dawiyê de Washington'ê "projejen" wê asteng kirin. Koreya Başûr û Japonya yên ku peyman dereng mohr kirî (1975 û 1976) û di warê teknolojiyê de di asta herî bilind de ne, her du jî di bin parastina "miso-

* Peywirdarê lêkolînê di Compagnie européenne d'intelligence stratégique - CEIS (Înstitûya îstîxbarata stratejîk a ewrûpî) de, li Parîs'ê



Foto: Murat Yazar

gerkirina ewlehiya navokî” ya amerîkî de ne.

Rewşa Îran’ê zelaltir xuya dike: Dewletek e ku peyman mohr kiriye, diyar e hewlê dide çekên navokî bi dest bixe û peyman mohr kirî bin pê dike. Di mijara garantiyê de tu kes, ne Çîn ne jî Rûsya nikarin bibin xwediyê îddîaya peymanê dualî ya hewldana bibandor beramberî Îranê. Koreya Bakur bi xwe jî ji bo ku em lê bikolin mijareke gelekî xirab e, lewra ew berevajî Îran’ê ji peymanê vekîşiya (sala 2003) û pêşketinê wê dereng jî bin bi awayekî neyekser jî be ji aliyê bikaranîna WXSŞ ve hatin ser girtin. Ev welatê WXSŞ Çîn bû (tevî ku piştî erêkirina peymanê TNP wekî ku alîkariya xwe ya yekser dida Pyongyangê qut kiribe xuya dikir jî).

Dema mirov bi vî rengî pê re rû bi rû dibe rewş ne gelekî baş e. Mirov dikare bi rengekî erînî jî li mijarê binihêre. Koreya Bakur ne tê de, tu dewlet ji peymanê venekîşiya. Û di sala

2010’an de tu dewleta peyman mohr kirî û ne xwediyê bombeyê, hîna jî nebûye xwediyê wê. Ji roja peymanê TNP ji dayik bûyî û vir ve, dinyayê şahidî ne li şerekî navokî, ne jî li bilindbûna tansiyonê ya mîna ya Kuba’yê ya sala 1962’an kir. Herêmen jî navokî bi rêya peymanan paqijkirî (ya ku diviyabû bi ya xala 7’an a peymanê TNP pêk were) (9) zêde bûn - Antartîka di 1959’an de (beriya TNP’yê), başûrê Pasîfikê di 1985’an de, Amerîka Latîn di 1995’an de. Kazaxistan, Ukrayna, Belarûs, Afrîka Başûr û Swêdê cebilxaneyên xwe yê navokî tune kirin. Brezîlya û Arjantînê jî lêkolînên xwe rawestandin.

Ev hemû, ne bandora yekser a peymanê TNP’yê ye, dîsa jî peymanê 1968’an siwana hîmê qanûnî û exlaqî ye ku hevdi-tî-nên ji bo aliyan hemûyan gelekî kêrhatî ne, yê dualî yan jî na yê ku ew gihandin serketinê wê, li ser wê zêde dibin yan jî xwe dispêrin wê. Di 1995’an de

dirêjkirina peymanê “ji bo demeke bisînornekirî”, bi serê xwe nîşana pîvana girîngiya vê peymanê ye (ku dikarî bi awayekî teorîk bi tenê ji bo demeke diyarkirî ya wekî bîst û pênc salan bihata dirêjkirin).

Gelo pîrsa kêrhatîbûna peymanê TNP dikare li vir were kirin? “Alternatîfa sifirê” ya îdeal a em li bendê ne pêk neaniye û ev jî nemaze girêdayî doktrînen çavtirsandinê yê “berpirsiyar” ên WXSŞ ye (wekî mînakê Fransa’yê; fikra bikarneanînê û hejmara bi tenê ji bo pêdiviya xweparastinê di destê xwe de girtina çekên navokî). Belkî divê mirov li ser bifikire heger TNP nebûya wê rewş çawa bûna. Ya rastî, bi ya mirov qala wan ku neqewime bike, hêsanîr e mirov tiştên peymanê nikare asteng bike, bijimêre. Di vê qadê de ne serketinek, nemaze jî heger ev serketin bi negatîf-bûnê dihê terîfkin, binketin girîng e.

Di demeke weha de ku polemîka li ser bernameya navokî a

Îran’ê di dilê rojêvê de ye, wekî encam em li xwe mikur werin ku wekî kesên ew piçûk didîtin digotin, peymanê TNP li hemberî xetera belavkirinê mertalekî tijî kun e û nikaribû vê xetera belavkirinê rawestîne. Belê mirov tê re aliyê din bibîne jî, dîsa jî ew mertalek e û tu kes naxwaze wê bavêje nav stiriyan.

Wergera ji fransî Lokman Turgut

(1) Nîqaşa bi navê “Atoms for Peace (Atom ji bo Aştiyê)”. Nivîsa bêkêmasî: www.atomicarchive.com

(2) Bixwîne; Selig S. Harrison, “Le dilemme nucléaire du président Barack Obama (Dîlemaya navokî a serok Barack Obama)”, Le Monde diplomatique, Nîsana 2010’an.

(3) Lihevkirina misogerkirinê ya her dewletê bi IAEA re bi awayekî teorîk divê piştî mohrkirina peymanê di nava 180 rojê de bê mohrkin.

(4) Divêbi ya xala 6’an a peymanê vê bikin.

(5) Tevgera Dewletên Nealî (ku hejmara wan 118 welat e), bi awayekî bi rêkûpêk sebarek bi parvekirina teknolojiya sîvîl banga vekirîbûneke mezintir a WXSŞ’yan dikir û dixwest Îsraîl peymanê erê bike.

(6) Ji sed û bîst û nehe dewletên peyman mohr kirî, li derdora şestî protokola li peymanê zêdekirî jî pêk tînin.

(7) Bixwîne; Pierre Vandier, La prolifération nucléaire en Asie menace-t-elle l’avenir du TNP? (belavbûna navokî li Asyayê gelo paşeroja peymanê TNP dixê xeter yê?), Collège interarmées de défense (Koleja navarteşî ya parastinê), Parîs, 1’ê Cotmeha 2005’an. Em bi bîr bixin ku Fransa’yê heta sala 1992’an peymanê TNP erê nekiribû.

(8) Ya ji vê gelekî xirabtir peymanê hevkarêya navokî ye ku Washington’ê bi Delhiya Nû re di sala 2006’an de mohr kir. Bi vê peymanê xuya ye Hindistan ku tevî hebûna TNP’yê jî bû xwedî çekên navokî hat xelatkin. Bixwîne, “Prime nucléaire pour l’Inde (xelata navokî ji Hindistanê re)”, La valise diplomatique (valîza diplomatîk), Le Monde diplomatique, 23’ê Mijdara 2006’an.

(9) “Tu naveroka peymanê mafê komeke dewletan ku bi armanca bi tevahî nebûna çekên navokî li ser erdê xwe dixwazin peymanê herêmi mohr bikin, asteng nake.”

TAWANEKE JIBÎRKIRÎ

Qirkirina asûriyan

DAVID GAUNT*



Foto: Murat Yazar

Di 11'ê Adara bihurî de parlementoya Swêdê biryarek erê kir û bi vê biryarê di Şerê Yekemîn ê Cihanê de qirkirina ermenî, asûrî, suryanî, keldanî û rûman nas kir. Nerazîbûna fermî ya Komara Tîrkiye'yê weha bû; paşvekişandina bal-yozê xwe yê li Swêdê û zextkirina li ser hukûmeta Swêdê. Ev

* Profesore dîrokê li Södertörn University College a Stockholm'ê

krîza dîplomatîk bi îhtîmaleke mezin baş dihê zanîn û weha xuya ye ku çareser bûye. Lê belê ez wisa bawer dikim ku vê krîza dîplomatîk agahiyên sebarek bi tiştê ku parlemana Swêdê erêkirî vedişartin. Lewma li vir ezê hewlê bidim qala qirkirina gelê asûrî (ev navlêkirineke etnîk e) bikim ku di nava xwe de bi ya gelek dêrên cur bi cur cihê bûne: nastûrî, ortodoksên asûrî, keldanî û her weha yên ku protestanî û katolîkî qebûl kirine. Girêdana bi kurdan ve ya mijarê

jî ew e ku asûrî heta sala 1915'an para bêhtir li navenda bakurê Kurdistanê li herêmên Hekarî, Botan û Tur Abdînê (Tor) diman. Kurd cîranên wan bûn û wan jî mezinahiya axayên kurd qebûl dikir, heta di hin konfederasyonên eşîran de carinan endamên asûrî mezinên eşîran bûn.

Dema Şerê Cihanê yê Yekemîn bi dawî bû, serekên cihanê li Parîsê li hev civiyan da ku aştiyeke mayînde pêk bînin. Gelek hindikahiyên ku zordarî li wan

hatibû kirin, şandeyan bi rê kirin da ku doza serxwebûnê bikin, a ku xwe dispêre prensîba diyarkirina çarenûsa neteweyî. Di nava wan de şandeyeke asûrî-keldanî jî hebû û îddîa dikir ku li ser navê komên suryanîyên li rojhilata Anatolya'yê û bakurê Mezopotamyayê diaxivin û nûneriya wan dikin. Daxwaza wan a dewletekê xwe dispart du argumentan: Wan eş û azara komkujîyên gelekî xerab kişandiye ku ji aliyê dewleta Osmanî ve hatine birêvebi-

rin; fermanدارên leşkerî yên payebilind ên Rûsya û Îngilistanê soza dewleteke serbixwe dane wan, eger ew ji bo armanca hevpar digel wan şer bikin, baskê nastûrî yê gelê asûrî jî bi ya vê yekê, dema ku ketin ber siyaseta paqijîya etnîk a dewleta Osmanî, şer kiribû.

Piştî Şerê Cihanê yê Yekemîn welatê gelê asûrî hema hema bi giştî hatibû valakirin û pêvajoya bicihkirina penaberan, ku ji aliyê karbidestên dewletê ve hatibûn şandin, lê dewam dikir.

Rewşa wan dişibiya ya ermeniyên ku li wan erdan bûn ku hema diket bakurê cih û warê asûriyan. Şandeya asûrî-keldanî di konferansa aştiyê ya Parîs'ê de qala 250.000 kuştîyên di dema şer de kir, bi ya gumana wan ev nivê serjimara wan a beriya şer bû. Ya rastî, guncan e ku ev hejmar kêmtir be jî. Hesabên ji bo eyaleta Diyarbekir'ê rêjeyê gelekî zêdetir nîşan didin: Ji sedî 90'ê keldaniyan, ji sedî 72'ê ortodoksên asûrî û ji sedî 62'ê katolîkên asûrî. Bi ser de jî haya şandeyê ji gelek civakên îzolekirî jî nebû, ji xwe yên ku tevî ermeniyên di heman gundan de diman û carinan jî bi ermenîkî diaxivîn lewma haya tu kesî ji wan nebû.

Tevî ku "Pîrsgirêka Asûrî" ya neteweyî û siyasî, bişibe pîrsgirêka "ermenî" ku baş dihe nasî kirin, asûrî jî ketibûn ber diranên kujer ên qirkirinekê ku armanca wê tune kirina ermeniyên bû. Radeya kuştinan, têgihîştina paqîjiya etnîk, beşdariya serekên payebilind ên hukûmet û artêşê di plankirin û biryardanê de, li ser hev derketina pêşiyê ya çendek rayedarên fermî ya bi rola tawanbar (para bêhtir endamên Teşkilat-i Mahsûsa "Rêxistina Taybet"), daxwaza ji nû ve bicihkirina leşkerên artêşa nîzamnî (dûrî xeta eniya şer) da ku her gund an jî eşîra ku wêriyabû li ber xwe bide tune bike; ev hemû, sistematîkbûna şiddeta osmanî ya li dijî mesîhiyan piştrast dikin. Ev şiddet tam bi ya terîfa fermî ya nijadkujî ye ku di Peymana Neteweyên Yekgirtî ya sala 1948'an de hat qebûl kirin. Bi îddîaya têtikiliya wan bi rûsan re heye, di bin kirasê "pêdiviya leşkerî" de diviyabû asûrî ji deverên nêzîk bereya şer werin veguhestin. Dema wan li ber xwe da rewş bi carekê ve xerab bû û veguherî zordariya paqîjiya etnîk. Yên ku ev paqîjiya etnîk bi rê ve dibirin leşkerên osmanî û xelkê deverê bûn ku dixwestin talanê asûriyan rakin. Paşê hat îddîakirin ku ev şerekî navxweyî bû, lê belê hukûmeta osmanî tedbîrên şiddetê yên pêşilêgirtin û bûyer bi xwe jî nîşan didin ku tu amadekariya asûriyan ji bo şer nebû (ne siyasî, ne jî leşkerî) û bi tenê di hin rewşên awarte de, ji wan hat ku xwe biparêzin.

Lêkolîna min, pê divê ku yekemîn dîrokgotina tecrûbeyê şer a gelên asûrî çêbikim, li ser materyalên ji arşîvên tirkîyan avabûye. Min ev paşê bi şahidiyên arşîvên îngilîz, fransewî, alman, îranî û rûs dan ber hev û her weha şahidiyên asûrî yên hemdem û dîroka devkî ji min li ber çavan girt. Şahidiyên ji çavkaniyên bi tevahî ji hev dûr, hev du yan erê dikin yan jî pêş de dibin. Gelekî kêmtir belge di arşîvên tirkîyan de hene ku nîşan

didin serhildaneke tam a xirîstiyanan hebû. Belge bêtir nîşan didin ku rayedar di panîkê de bûn û bi delîlên gelekî kêmtir an jî her çend hîç delîl nebûn jî wekî tedbîrên li dijî tirsên xiyaneteke pêkan a paşerojê xirîstiyanan tune dikirin.

Dema ku şer dest pê kir, asûrî di nava xwe de gelekî parçe bûn û şiddetê ew bêtir ji hev parçe kirin. Di warê cografî de ji bakurê rojavayê Îran'ê heta rojavayê Mezopotamya'yê belav bûn û têtikiliyên di navbera herêman de kêmtir bûn. Di warê olî de asûrî di nava gelek dêrên dijberî hev de parçe bûbûn: nastûriyên çiyayên Hekariya û rojavayê Îran'ê, keldaniyên (baskî rojhilatî yê dêra katolîk a Roma'yê) li rojavayê Îran'ê, Botan û Mûsil'ê û dêra ortodoks a asûrî ku navenda wê bakurê Mezopotamya û Anatolya'ya Navîn bû. Bi ser van de jî hin parçeyên ku qulibûn ser dînen katolîk û protestaniyê jî hebûn. Newekheviya olî ya ku her ku diçû mezintir dibû, bi awayekî trajîk gelekî diwar kir ku asûrî li dijî bereya dij-xirîstiyana a osmaniyan bereyeke hevîr ava bikin. Bereya dij-xirîstiyana a osmaniyan xwe dispart piştigiriya olî û dikir ku helwestên "parçe bike û dagir bike" bi ser kevin. Komên xirîstiyana gelek caran hev du bi xiyanetê gunehbar dikin.

Asûriyên pêşî li dijî Hukûmeta Osmanî şer kirî, eşîrên serbixwe yên çiyayên Hekariya ne. Di 26'ê Cotmeha 1914'an de bi tenê çend rojan beriya destpêka şerê di navbera osmaniyan û rûsan de, wezîrê karên navxweyî Talat biryar da ku divê nastûriyên li ser sînora Îran'ê dimînin bişînin herêmên Konya û Enqere'yê. Diviya bû ew ji hev bi regekî bihatana belavkirin û li deverên ku lê werin bicihkirin jî nebin xelkê piranî. Sedem: Guman heye ku ne dilsoz bin û guncan e ku rûs wan bi kar bînin. Komkujiyên bi destê hukûmetê li herêmê dest pê kirin û şiddet tevahiya zivistanê û buhara 1915'an her zêde bû û di encamê de bi awayekî pêk hatî dor li herêmê hat girtin. Dema ku artêşa rûs di Gulana 1915'an nêzî herêmê dibû, da ku li ser rîya xwe ermeniyên bajarê Wan'ê jî azad bike, serekên asûrî jî biryar dan ku bi rûsan re bibin yek. Osmaniyan di cih de kiriyareke mezin a leşkerî organîze kir. Asûriyan bi tivingên xwe yên flînta bi qehremanî li ber xwe da, lê hem hejmara wan kêmtir bû û hem jî çekên wan kevin û kêmtir bûn. Piştî şerên diwar, birçîmana li çiyayan û mirina gelek zilamên wan, Îlona 1915'an bermahiyên eşîrên nastûrî ketin nav erdên Îran'ê. Tevî çend hewldanên paşê yên ji bo vegeerê, ewê êdî qet vene-

geriyane ser erdên xwe.

Li Îran'ê serpêhatiya asûriyên li herêma Urmiye'yê guhertî bû, lê bi qasî ya asûriyên din bi şiddet bû. Ev nastûrî û keldaniyên cotkar ên Îran'ê yên li ser erdên nêzî sînora osmaniyan bûn ku diketin ber daxwazên berfirehbûnê yên rûsan û tirkîyan. Di sala 1915'an de ji Çile heta Gulanê herêm ji aliyê Împaratoriya Osmaniyan ve hat dagirkirin. Osmaniyan li vir artêşeke ne nîzamnî ya cendermeyan, kurd û endamên Teşkilat-i Mahsûsa bi cih kirin. Ev hêzeke leşkerî bû ku ji rêvebirina sivilan bêtir bi kêrî sabotajan dihat. Rewş jî di demeke kin de xerabtir bû. Di dawiya Sibata 1915'an de komkujiyê mezin li dijî asûrî û ermeniyên li devera Heftewan'ê pêk hat û 700 zilamên asûrî û ermenî hatin kuştin. Yekîneyên leşkerî yên di bin fermanariya waliyê Wan'ê Cewdet Beg de ev tawan kiribûn. Li Urmiye'yê mirov ji cihê xwe spartibûnê û li stargehek geriyabûn an ku ji aliyê misyona fransî ve dihatin girtin û dihatin kuştin. Dibe ku ev şewazeke tolhildanê yê osmaniyan be li dijî yekîneyên xweparastinê yên asûrî û ermenî ku rûsan ew çekdar û perwerde kiribûn. Di destpêka Gulana 1915'an de hêzên tirk ku fermandarê wan Halîl (ku paşê bi serketineke xwe ya li dijî îngilîzan a li Kutê navdar bibûya û her weha apê wezîrê şer Enver e) bû di şerekî mezin ê li Dilman'ê de têtik cûn û osmanî neçar man ji Îran'ê vekişin. Alayên şervanên dilxwaz ên asûrî û suryanî yên femandariya wan Antranîk'ê ermenî dikir, di têtikbirina tirkîyan de xwedî roleke girîng bûn. Piştî vê têtikcûnê Halîl dest bi qetilkirina leşker û sêbayên ermenî yên di artêşa xwe de kir. Dema ku vekişiyana artêşa wî xirîstiyanan ku rastî wan hatin hemû qetil kirin û li bajarên Elbak, Sêrt û Bedlîs'ê xirîstiyana tune kirin.

Li Tûr Abdîn'ê, herêma li başûrê Diyarbekir'ê piraniya asûriyan bi ser dêra ortodoks an jî katolîk a asûrî ve ne û li bajarên jî para bêtir ew û ermeniyên katolîk bi hev re ne. Ev devereke dûrî bereya şer bû û waliyê Diyarbekir'ê, bişîşkê berê yê leşkerî Reşîd Beg, bi mehan beriya ku fermaneke nivîskî ji Stenbol'ê bigihîje Diyarbekir'ê, dest bi tepisandina bi şiddet a nemusulmanan kir. Li vir weha xuyaye ku siyasatmedarên herêmî yên ku endamê komîteya İttîhad û Terakkî'yê bûn, biryara tune kirina tevahiya xirîstiyanan herêmê dabûn û di nameyan de ku ji Stenbol'ê re dişandin qet xwe jê venedana ku asûriyan wekî "ermenî" an jî "serhildêr" bi nav bikin da ku destûra girtina mexdûrên xwe bidin destpêkirin. Di bajarên mezin de ku

tê de gelek komên cihê yên xirîstiyanan hebûn, pêşî ermenî birin, paşê katolîk û protestan û herî dawiyê ortodoksên asûrî.

Hêja ye ku em li vir bi bîr bînin ku hejmareke baş a rayedarên osmanî planên dijberî xirîstiyanan red kirin. Rayedarên payebilind para bêtir ji bo erkên li herêmên din hatin peywardarkirin, lê belê rayedarên payeya wan kêmtir, hatin qetilkirin. Di nava dijberên planê de du muteserif (walî) ên li Mêrdîn'ê peywardar jî hebûn: Hilmi Beg û Şevket Beg.

Li Diyarbekir'ê karmendên walîtiyê komîteyêke taybet ji bo plankirina kiriyarên tune kirinê organîzekirin. Vê komê yekîneyên kuştinê yên herêmî ava kirin ku li Mêrdîn'ê ji ber ku hejmara endamên wan pêncî bû wekî el-xemsîn (bi erebî pêncî) bi nav û deng bûn. Yekîneyên kuştinê yan uniformayên wan hebûn yan jî bazbendên wan, çekên wan ên artêşê bûn û sêbayên yedek ew bi rê ve dibirin. Wan dor li gundên cotkariyê digirt û paşê şênîyên wê qetil dikirin. Li gundên mezin an jî li deverên ku ew li benda berxwedaneke xurt bûn, bangeke hewarê dişand û çend eşîrên kurdan kom dibûn. Kesên ku ji qirkirinê filitîn para bêtir navê heman eşîran hildidin: Li Tûr Abdîn'ê Rama û beşek ji baskê Haco yê konfederasyona eşîran a Hevêrkan ên herî çalak bûn.

Belê hin eşîrên kurd bi awayekî zelal li dijî komkujîyan bûn. Li Tûr Abdîn'ê baskê mala Çelebî, beşek ji baskê mala Haco yên Hevêrkan bi awayekî çalak xirîstiyana parastin. Wan asûrî û ermenî li gundên xwe veşartin, heger dor li gundekî asûriyan hatibûna girtin qût û çek bi dizî ji wan re dişandin. Piştî şer bi taybetî navê Çelebî dihe hildan ku alîkarî daye xirîstiyanan da ku vegerin gundên xwe. Li Dêrsim'ê gelek eşîran, ermenî parastin û heta hin asûriyan bi rîya derbasbûna di Dêrsim'ê re xwe xelas kirin. Li Sêrt'ê artêşa Halîl Beg di Pûşbera 1915'an de bi navê tolhildanê li dijî şênîyên xirîstiyana ên bajêr û wîlayetê, ku hejmara wan gelek bû, êrîşên tirsnaq pêk anîn. Du serek eşîrên kurd Osman Axa û Omer Axa neserketî hewl dan hevalê xwe, metranê Sêrt'ê Addaî Şer, xelas bikin. Addaî Şer alimekî navneteweyî yê navdar bû. Wan karibûn metran ji Sêrt'ê derxin, lê belê cihê ku xwe lê veşartibû, gundê Tanzî, hat dîtin û metran û Omer Axa hatin kuştin.

Di gelek bûyeran de kurdan asûriyên ku heval û cîranên wan bûn parastin û bi awayekî spontane ew yek kirin. Mîna-keke vê yekê ya şahane êzdiyên çiyayê Şengal'ê ne. Wan bi awayekî sistematîk asûrî û ermenî rizgar kirin. Ew li çolê digeriyan

da ku mirovên ji karwanê teh-cîrê rizgar bûyî yan jî yên ji şiddetê reviyayî bibînin. Bi sedan penaber li vir sitirîn û gundekî mezin tevî xanî, klînîk û dêrê ava kirin. Sala 1918'an osmaniyan artêş şand çiyayê Şengal'ê da ku êzdiyan ceza bike û stara xirîstiyanan xerab bike. Pênc sal cezayê girtîgehê, tevî karê giran li mezinê êzdî Hemo Şaro hat birin.

Li Tûr Abdîn'ê gundê asûriyan Hezêxê (ku îro navçe ye) û Êwert'ê li dijî dorgirtinê bi mehan li ber xwe da. Di nava êrîşan de êrîşên artêşa nîzamnî jî hebûn. Van êrîş û berxwedanan heta peymanê 28'ê Mijdara 1915'an hatî mohrkirin, dewam kir. Heta vê demê piraniya gundên asûriyan û bajarên wan ji xirîstiyanan hatibûn xalîkirin. Di 28'ê Îlona 1915'an de walî di rapora xwe de digot, ew ji heqê 120.000 "ermeniyên" li herêma xwe derketiye û yek ji wan jî êdî li herêmê nemaye.

Piştî şer hin darizandin pêk hatin, ku di wan de êrîşkarên herî navdar hatin darizandin. Reşîd bi tawanên şer ên li dijî şênîyên xirîstiyana ên li herêma Diyarbekir'ê hat gunehbarkirin. Wî di îfadeya xwe de got, wî xirîstiyana wekî bakteriyên ku zirarê dikin didîtin û pîrs dikir, ma ne peywira doktokekî ye ku bakteriyên tune bike. Beriya doz bi dawî bibe wî xwe kuşt. Piraniya bersûcan ji bo pîrsiyarkirinê şandin Malta'yê, lê ew qet nehatin dadgehkirin û demeke kurt paşê di çarçoveya lihevkerinekê de ku hukûmeta îngilîz bi serekê tirkîyan ê ku nû derdiket ser dîroka Kemal Atatürk re çêkirî, hatin berdan. Hin ji tawanbarên şer û organîzatorên qirkirinê kariyerên xwe yên siyasî yan jî îdarî di Komara Tirkiye'yê de dewam kirin. Tu lê-pîrsîneke giştî sebareti bi tawanên şer ên li dijî asûriyan ku bi destê karbidestên hukûmeta osmanî yên wê demê pêk hatî, nehat kirin.

Hema wekî di mijara qirkirina ermeniyana de gelek hukûmetên tirk siyaseta xwe ya qebûlnekirina bi awayekî sistematîk tune kirina asûriyan, dewam dikin. Dîsa jî belgeyên dîroknasan komkirî tîra xwe encaman derdixin holê û baweriyê bi xwe tînin. Gelê asûrî mexdûrê qirkirinekê bû. Eger (û kengî) hukûmeta tirk vê yekê qebûl bike, hingî yek ji karên se-reke ew e ku mirov dest pê bike kar û barên kurdên merd ên hewldan cîranên xwe yên asûrî biparêzin, qebûl bike û nas bike.

**Wergera ji îngilîzî
Lokman Turgut**

Ev nivîs ji bo Le Monde diplomatique kurdî hatiye nivîsandin

“Dibû her tirkekî ev yek bikirina...”

1 ◀

Xwediyê qehwexaneya ku êrîşbir lê dixebitî, li wî xwedî derket. Xwediyê qehwexaneyê got: “Tiştê ku wî kir, dibû her hevvelatîyekî tirk bikirina. Ez pê serbilind im. Zilamê wekî zilaman e.” (Radikal, 13.4.2010)

“Tiştê ku her hevvelatîyekî tirk dibû bikirina ...”?

Ka em bêjin, li kuçeyê, li taxê şewatek heye. Di nav xaniyê de ku agir lê heye kesekî pîr heye, û xelk dibêje divê ev kes were rizgarkirin. Ji nav wan, xortekî ciwan xwe çeng dike û diçe nav avahiyê, bîsteke din digel wî kesê pîr derdikeve derve, niştecihên taxê û nûçegihan awirên heyranane diavêjin. Û ew xort jî dibêje, “Tiştê ku min kir, wê her tirk, her hevvelatîyekî tirk bikirina.” Ka em bêjin, kesek li sûkê, li bazarê, li xeracê çenteyek wenda dike ku tê de gelek pere hene. Kesek vî çenteyî dibîne û dibe qereqolê. Polêsên peywardar ên li qereqolê awirên pesndayîne diavêjin.

Ka em bêjin, têsîkekî pisîkan hilkişiyaye ser dareke dirêj. Lê belê nikare dakeve. Xelk vehewiyane û li pisîkê dinihêrin, gotûbêjê dikin ka ew çawa dikarin wê pisîka hejar bînin xwarê. Di wê keliyê de xortek hildikişê serê darê, têsîk rizgar dike û wê tîne xwarê. Dema xelk bi dilweşî û pesndayîne awiran vedidin ew jî dibêje “Tiştê ku min kir, wê her tirk, her hevvelatîyekî tirk bikirina.” Belê, bi kulman êrîşbirina Ahmet Türk jî weha dihê fêmkirin ku “Tiştê ku her tirk, her hevvelatîyekî tirk dixwaze bike...”

Mirov nikare bifikire ku, kurdek ku ji Ahmet Türk hez bike yan neke, dixwaze hevdilê PKK be dixwaze nebe, bi kulman êrîşî Ahmet Türk bike. Lê belê, ev yek hejayî liserfikirinê ye ku tirkek vê êrîşê wekî “tiştê ku her tirk, her hevvelatîyekî tirk dixwaze bike...” têdighêje.

Tirkek çawa dikare bîra van tiştan bike û çawa dikare bi hêsanî wan pêk bîne? Divê mirov li ser vê pêvajoyê hûr bibe. Beriya her tiştî êrîşbir dizane ku ji ber vê çalakiyê tûşî darizandinê nabe, ceza naxwe û hetta dewlet jî wê pesnê wî bide. Ev yek asayî ye ku heger ew weha bifikire, hîs bike û tev bigere. Ji ber ku, dadgehên tirk, gotinên wekî “dema serbazek hat şehîdkirin divê pênc DTP’yî werin kuştin” wekî tawaneke, wekî derbirîneke teşwîqkirina ji bo şiddetê nabînin. Ji ber ku, dagêh daxwazên kurdan ên ji bo mafên demokratîk wekî tawan dibînin, van daxwazan didarizandin û derbirinên ji bo şiddeta li dij kurdan asayî dibînin, ev yek jî hêz û piştgirîyeke

mezin dide êrîşbiran. Wekî mînak, li stranbêj Rojda’yê ji ber ku bi kurdî striye sal û heşt meh cezayê zindanê hat birîn. (Radikal 26.3.2010).

Haya êrîşbir ji wî tiştî jî heye ku, polês, dozgerî li dij wan kesan ku kevîr avêtine kurdan dest bi tu lêpîrsînan nake. Wekî mînak, polês temaşeyî wan kesan dike ku kurdan didin ber kevîran, û her weha temaşeyî bersiva kurdan a li dij kevîran. Lê dema ku kurd kevîran biavêjin polêsan, panzêran an jî tîmên taybet wê demê li wan cezayên giran dihên birîn ku di nav wan kesan de gelek zarok jî hene. Bi hezaran zarok ji ber ku kevîr avêtine polêsan tûşî lêpîrsîn û darizandinan dibin. Bi sedan zarok jî hîna di zindanan de ne. Li van zarokan îşkence jî dihê kirin. Ev reftara cudager a li dij tirkan û kurdan wêrekiya êrîşbiran zêde dike.

Êrîşbir dizanin ku dewletê heta niha sebareti bi kurdan û zîmanê kurdî tu tiştêkî êrînî negotiye, tenê tişt ku gotiye ev e: ‘emê wan tune bikin, koka wan biqelîhînin...’ û her weha êrîşbir ji ber pêngava kurdî û ji pêngava TRT şeş bi hukûmetê hêrs ketine.

Bi kulman êrîşbirina bi ser kurdekî ku bahsa mafên neteweyî dike, doza mafên demokratîk ên kurdan dike, bi tenê ne çanda garsonêkî ye ku li qehwexaneyekê dixebite. Ev çanda siyasî li cem polêsan jî heye, li cem cendermeyan jî. Piraniyeke berbiçav a dozger û dadgeran jî ev çanda siyasî ya gelek mamosteyên zanîngehan jî bi heman awayî teşe girtiye.

Ev yek asayî ye ku li dij kurdan çandeke weha ya siyasî pêş ve biçe. Ji ber ku, li Tirkîye’yê di warê hin mijarên bingeşîn de dewlet hêza yekta ye ku nihêrîna gelemperî diyar bike. Di warê hin mijaran de, ên wekî kêşeya kurd, kêşeya ermenî, kêşeya Qibris’ê, elewîtî, destgehên ragihandinê peyvdariya dewletê dikin. Dewlet jî, wekî mînak sebareti bi kêşeya kurdî, ji kokqelehandin, tunekirin û taswîyekirinê pê ve xwedî tu fikr û ramanên din nîn e.

Rakirina darizandinan

Divê mirov li serî raweste ka çima dozên sebareti bi hin bûyeran ku li herêmên kurdan rû didin radikin hin bajarên li herêmên rojava yê Tirkîye’yê.

Di 21’ê Mijdara 2004’an de li navçeya Qoser’ê ya bi ser Mêrdîn’ê Ugur Kaymaz’ê 12 salî û bavê wî Ahmet Kaymaz, li pêşiya malên xwe, ji aliyê polêsan ve hatin kuştin. Ugur wê rojê hîna nû ji dibistanê vegeriyabû malê. Cilên dibistanê jî hîna lê bûn. Ev doza ku diviya li Mêrdîn’ê bihata dîtin rakirin Eskişehir’ê.

Di 12’ê Adara 1995’an de li taxa Gazî’yê piştî ku qehwexaneyek ji aliyê endamên dewleta kûr ve hatibû gullebarandin bûyeran rû dabû. Pevçûnan bi rojan ajot. Dozên sebareti bi van bûyeran, bi

awayekî xwezayî, diviyan li Stenbol’ê bihatana dîtin. Lê belê ev doz jî rakiribûn Trabzon’ê.

Sedema rakirina van dozan çi ye? Heger tu ji dewletê bipîrsî sedem ewlekarî ye. Dibêjin doz ji

ber sedemên ewlekariyê dihên rakirin. Sedema rast jî pêkanîna şert û mercên ji bo beraatkirina endamên hêzên ewlekariyê ne ku di qetlîaman de cih girtine. Dema ku doz radikin yek ji baja-



Foto: Mu



rat Yazar

rên rojavayê, êdî diwar dibe ku qurbanî, xizm û parêzerên qurbanîyan dozên xwe bişopînin. Heger bivê ku mirov ji Mêrdînê here Eskîşehîrê yan jî ji Mûşê here Samsûnê yan jî ji Stenbolê

here Trabzonê wê demê şopandina dozê helbet diwartir dibe. Serê pêşîn astengiyên aborî pirs-girêkeke mezin derdixin holê. Jê girîngtir, hawîrdora komelgeyî, siyasî û psikolojîk a li wan baja-

ran ku doz lê dihên dîtî astengiyeke mezin e li pêşîya şopandina dozan. Harkirin, rê li lînkirina kurdan vedike. Qurbanî, xizm û parêzerên qurbanîyan û şahid ji ber ku xelk bela xwe bi wan dide,

erîşî wan dike nikarin xwe bigihînin hêwana dadgehê. Her weha dihê zanîn ku di vê pêvajoyê de polêsan bi tenê temaşeyî bûyeran dikin û hetta jî hawîrdoreke rehet ji bo êrîşan pêk tînin. Di wan rewşan de ku tê de li şahidan dihên xistin, gef li wan dihên xwarin, parêzerên bersûcan, ku endamên hêzên ewlekariyê yên dewletê ne, dikarin dozê bi ya daxwaza xwe bi rê ve dibin.

Wekî ku li ber çavan e, her çend ji wan re hêzên ewlekariyê dihê gotin jî, lê belê diyar e ku mijareke ewlekariya kurdan qet nîn e.

Û em carekê bi vî awayî bifikirin: Em bêjin doz li Mêrdînê, li Mûşê û Stenbolê dihên dîtî. Wê demê qurbanî, xizm û parêzerên wan û şahid wê çalakî bibin û bikaribin di rûniştinan de, wekî ku divê, cih bigirin. Di van şert û mercan de hejmara wan kesan ku herin temaşeyî rûniştinê bikin zêdetir be. Qurbanî û xizmên wan û her weha kesên din ku temaşeyî rûniştinê dikin, dikarin hêzên ewlekariyê şermazar bikin. Lewma, da ku bikaribin pêşî li van bûyeran bigirin, dozan ji bajarên kurdan radikin bajarekî li rojavayê yan ji bajarekî gelek dûr.

Di 4'ê Gulana 2009'an de, li gundê Zangirt a bi ser navçeya Şermix a Mêrdînê komkujiyek pêk hat. Di vê qetlîamê de 44 kes hatibûn kuştin. Him kesên ku ev komkuji pêk anîbû û him jî kesên ku di vê komkujiyê de hatibûn kuştin ji heman malbatê bûn. Ev komkujiyê weha bû ku ji aliyê berevanên gundan ve hatibû lidarxistin. Weha hatibû plankirin ku berpîrsiyariya bûyerê wê bixistana stûyê PKK, lê belê ev plan bi gotina şahidekî û daxuyaniya wezîrê karûbarên navxweyî hatibû pûçkirin. Ev doz jî rakiribûn Çorumê. Mebesta vê rakirinê li dij protestoyên pêkan, ewlekariya hêzên ewlekariyê bû.

Çanda siyasî ya rûniştî û pêşniyazên ji bo veguherînê di destûra bingehîn de

Li ber çavan e ku pergaleke siyasî, ku xwe spartîye înkarkirina kurdan û zimanê kurdî, çandeke siyasî ya çawa afirandiyê. Pêşniyazên guherandinê xwedî wê taybetmendiyeke ne ku dixwazin vê nihêrîna siyasî biguherînin, pergaleke demokratîk bikin û mudaxeleyî wan dezgehên bingehîn bikin ku vê pergaleke pîk tînin.

Taybetmendiya sereke ya pergala siyasî ya tirkî ew e ku li ser wesayetê hatiye avakirin. Di birêvebirina vê wesayetê de artêş û dadgehên bilind wekî destgehên bingehîn derdikevin pêşîya me. Ew hêzên nepenî, ku nahêlin demokrasî û mafên mirovan pêş bikevin, di hawîrdoreke weha de pêk dihên û hêzdar dibin. Pêşniyazên ji bo guhertina destûra bingehîn jî xwedî wê taybetmen-

diyê ye ku vê pergaleke tîk dibe.

Hevdem, divê mirov li serî raweste ka dadgehên bilind cihan û Tirkîye'yê çawa fêhm dikin. Yek ji nûnerên dadgehên bilind, dema ku li dij pêşniyazên ji bo guhertina destûra bingehîn ên AKP'ê derdiket nîşan dabû ku ewê dest ji kar vekêşe. (Milliyet, 18.4.2010) "Dadgerên li Pakistanê da ku guhertinên destûra bingehîn erê nekin dest ji kar kişandibûn. Em ji wan kêmtir hesitîyar nîn in..." Lê belê wan dadgeran, da ku Ziya-ul Heq, ku li dû darbeyeke leşkerî desthilatdarî girtibû destên xwe, protesto bikin, da ku darbeya leşkerî protesto bikin dev ji kar kişandibûn.

Qala serbixwebûna erka darizandinê, dadgerên dadgehên bilind dihê kirin. Derblêdaneke mezin li serbixwebûnê dihe kirin. Dadger jî pir caran diyar dikin ku ew serbixwe ne. Lê belê, erka darizandinê, dadgerên bilind û dadgerên din bi hişkî dilsozê bîrdoziyê ne. Gotina "dema ku dewlet bibe mijar wê demê dad ne xwedî tu girîngîyan e." jî ya dadgeran e. Rastiyeke eşkere jî ew e ku bîrdoziya fermî xwe dispêre derew û înkarkirinê. Helwesta erka darizandinê û ya zanîngehan, ku hewlê didin ku van derewan meşrû bikin, ev her du destgehan yekser rizandine. Gelek balkêş e ku erka darizandinê, ku ew qas dilsozê bîrdoziya fermî ye, her tim qala "serbixwebûnê" dike lê belê tu caran peyva "bêalîbûn" nayê bilêvkin.

Têgihiştina ku dibêje "AKP hewlê dide ku xwe rizgar bike" têgihiştineke rêk û pêk nîn e. Hewldana AKP'ê ya ji bo rizgarkirina xwe û diwartîrkirina girtina partiyên siyasî wê her weha bi kêrî partiyên din jî were. Wekî mînak, 11 dadgerên Dadgeha Destûra Bingehîn bi awayekî gelek hêsan dikaribûn partiyên siyasî yên wekî Partiya Kedê ya Gel (HEP), Partiya Demokrasiyê (DEP), Partiya Demokrasiya Gel (HADEP) û Partiya Komelgeya Demokratîk (DTP) bigirin û li dij birêvebirên partiyê û endamên parlamentoyê cezayên cur bi cur bibirin. Heger guhertinê di warê vê mijarê de bikevin jiyanê, an ku di girtina partiyên siyasî de komîsyona nav-partiyan, ku di TBMM'ê de were damezrandin, bi awayekî çalak cih bigirin, wê demê girtina partiyên siyasî ew qas hêsan nabe. Ji ber ku partiyên ku di komîsyonê de cih bigirin xwe begav hîs bikin da ku bi awayekî hesabê bidin gel. Lewma, divê beriya her kesî Partiya Aştî û Demokrasiyê piştgirî bide van pêşniyazên guherandinê. Ji ber ku, statuko ji her kesî zêdetir zirarê dide kurdan û partiyên wan ên siyasî.

Ev nivîs ji bo Le Monde diplomatique kurdî hatiye nivîsandin

Wergera ji tirkî
A. Celîl Kaya

DI NAVBERA ZIMAN Û HEVWELATIYÊ DE

Li mîrnîşînên ereb pirsgirêka nasnameyê

AKRAM BELKAÎD*

Zarokê dora deh salî ku di nigên wî de pêlavên bi teker hebûn, li ser mermerên Marina Mall ku navenda bazarekê sereke yên bajarê Abou Dhabi ya paytexta Mîrnîşînên Erebe, hewl dida ku zû biçe û her weha bizavên akrobatîk bike. Bavê wî, mîrnîşîniyek ku cilên kelepûrî dishdasha lê bûn, bi erebî bangî wî dikir da ku zarok zû here cem wî. Wisa diyar bû ku zarok bavê xwe nedibihîst, wî dewam dikir ku bizavê du heb rojavayîyan bike ku li ser cemedê xwe xiş dikirin. Bavê zarok bi hêrs ket û vê carê bi zimanê îngilîzî, jê re sond xwar ku ewê pêlavên wî jê bistîne û wî terbiye bike. Zarok wê demê li bavê xwe hesiya, û bavê wî ji çend kesên li dora xwe re weha got: “We dît, dema ku mirov bi zimanê wan ‘îngilîzî’ diaxive ew fêhm dikin, lê belê dema ku mirov bi erebî diaxive ew naxwazin tişteki bibîhîsin!”

Bav û zarok çûn, pişt re mîrnîşîniyên ku li ser terasa avahiyê cîran rûniştibûn dest pê kirin ku heman bûyerê şîrove bikin. “Di nav pir malbatan de wisa ye, got birêz Jalal Al-Sultan, karmendekî ji Dubaî’yê. Em nizanin gelo ev zarok ji vir in an ew ên bibin amerîkiyên piçûk û îngilîzên piçûk ku nikarin xwe bi erebî derbibirin. Ev pirsgirêkeke ciddî ye ku divê em pê re têkildar bibin. Ev rewş me neçar dihele ku em di sistema xwe ya perwerdehiyê de reforman çêbikin. Ev her weha mijara parastina nasnameya me ye jî.” Cîranê wî, birêz Youcef Al-Aisa, karmendekî dewleta federal, bi bîr xist ku, li Mîrnîşînê, zimanê îngilîzî her tim wekî çareserîya hemû pirsgirêkan dihele xuyan: “Henekvan dest pê kirine ku bêjin ku di nêzik de wê

mûezzîn ji bi zimanê îngilîzî, bi taybetî ji bi devoka Oxfordê, azan bidin...”

Ji sala 2008’an û vir ve, dîroka ku bi awayekî fermî, ji aliyê rêvebirîya federal ve, wekî sala “nasnameya neteweyî” hatiye naskirin, nîqaşên sebarêt bi îngilîzî her ku diçe gurtir dibin û civakê bi xwe re mijûl kiriye, hetta car caran ew nîqaş bûne sedema şiddetê jî. Di aliyekî de kesên ku dixwazin ew li cihanê vebibin, modern bibin û îngilîzî jî bibe zimanê perwerdehiyê, di aliyê din de jî kesên ku li dijî tişteki wisa ne û dibêjin wê zerarê bide nasnameya neteweyî û her weha mîrnîşînî, ereb û musulmanên herêmê, ji wan re dibêjin xurbetiyên rojavayî.

Di Mijdara 2009’an de, li pêşberî rojnamevanên ku, ji bo sî û heştê salan salvegera damezrandina Federasyona Mîrnîşînên Erebe hatibûn, birêz Abdul Aziz Al-Ghurair, “berdevkê” Konseya Neteweyî ya Federal, organeke şewirmendiyê ku nivê endamên wê hilbijartî ne, peyameke eşkere da “Em civakeke vekirî ne, lê belê ev nayê wê wateyê ku em nasnameya xwe ya neteweyî ji bîr bikin. Heke em wê neparêzin, ewê wenda bibe, ji aliyê pêşketina globalîzmê ve wê were xeniqandin. Ez fêhm nakim, gelo çima Quebec’î dikarin wekî xwe bimînin lê belê em na!”

Heman rojê, û li hemberî heman civata ku wezîrên payebilind ên perwerdehiyê amade bûn, Şêx Nahyane Ben Moubarak, axavtineke pir cuda dikir: “Em hemû bi nasnameya xwe û bi zimanê xwe serbilind in, lê belê ev nayê wê wateyê ku îngilîzî zimanê zanistiyê û teknolojiyê nîn e. Ne guncan e ku em di nava reqabeta navneteweyî de cih negirin. Heger em dixwazin welatê me di nava reqabeta cihanî de cih bigire û pêş bikeve,

ji bilî perwerdehiya bi îngilîzî tu derfeteke din tune.”

Di meha Sibata 2010’an de, civîna ku sebarêt bi cihên kar ji bo xwendevanên ku bawernameyên xwe girtine, ya ku ji aliyê Emirates Center for Strategic Studies and Research (Navenda Mîrnîşîn’an ji bo Lêkolîn û Xebatên Stratejîk- ECSSR) ve, think-tank a sereke li Abou Dhabi, hatibû rêxistîkirin, me baş dît ku nîqaşên sebarêt bi ziman wisa zû naqedin. “Ji me re hate gotin ku zanîngehên me pir xerab in û divê ew îngilîzî qebûl bikin. Pişt re, ji me re gotin ku divê em bang li zanîngehên biyanî bikin ku ew ji me re alîkar bin da ku asta perwerdehiya me bilind bibe. Lê belê me hîna pirsgirêkan xwe çareser nekirine, ciwanên me yên ku bawernameyên xwe digirin bêkar in, her ku diçe hejmara wan zêdetir dibe û di nava wan de pir kes nizanin ew kî ne. Ew îngilîzî biaxivin an na, dîsa jî bêkar bêkar e”, Ev gotin, bi awayekî îronîk, ji aliyê xwendevanê zanîngeha Khalifa Al-Souwaidi ve hatin ziman.

Ji derveyî van nîqaşên kevnar ku armanca wan ew e ku civakên Kendavê wekî koçeran nîşan bide, divê ew nîqaşan wekî wergera pirsgirêkeke pir kûr û dorfireh were dîtin. Digel dijiyarîyên aborî yên Mîrnîşînên Dubaî’yê, bi alîkariya çavkaniyên pir mezin ên Abou-Dhabi, Federasyon di nava welatên pir dewlemend de cihê xwe diparêze. Di sala 2010’an de, pêşketina berhemên navxweyî gihîştîye ji % 5’an û krîza aborî nikaribû ji hatina xebatkarên biyanî re bibe asteng: bi ya rojnameya fermî ku di Cotmeha 2009’an de hate weşandin, hejmara van xebatkarên gihîştîye % 83’yê ji serjimêra heyî, ku 5 mîlyon kes in. Ev girêdana bi xebatkarên biyanî, çî yên pispor û çî jî yên

din, ji bo nasnameya neteweyî, pirsgirêkeke sereke ye û mijûliyekê derdixe holê.

“Em li welatê xwe bi xwe bûne hindikayî, li vê derê kesên nêzikî ji du sed neteweyan dijîn, rêvebirekî payebilind jî, bi rewşa xwe ya anonîm heman nihêrîne par ve dike. Ev rastî dikare bi wateyê çemberbûyîne were xwendin, heman çember dikare tundbûneke nasnameyî derxe holê. Wekî mînak, ew rewş her weha nîqaşên sebarêt bi îngilîzî jî dide xuyan. Em dixwazin ji van kesên ku me ji bo çêkirina welatê xwe aniye ji me cuda bimînin. Eger em hewlê bidin ku zimanê wan biaxivin, ev faktoreke homojenizasyon ku pir kesan ditirsîne derdixe holê. Ji ber vê yekê ye, ku sebarêt bi cilên neteweyî, ew ew qas şiyar in û hemû karmend mecbûr in li xwe bikin.”

Haya her kesî ji vê xetera nasnameyê heye, gelek pisporên herêmî xemgîniyên xwe yên sebarêt bi vê mantiqa bêrehm a demografîk venaşêrin. Çi senaryoya ku hatiye çêkirin dibe bila bibe, pêdiviya mîrnîşîniyan wê her tim bi xebatkarên biyanî hebe û ew ên di welatê xwe de her tim wekî hindikahî bijîn. Bi xemgîniyê be jî ew dizanin ku di sala 2020’an de wê hejmara wan, bi ya kesên li welatê wan dijîn, dakeve ji % 10’an. Birêz Gameel Mohamed, lêkolîvanê College for Advanced Education (Koleja Perwerdehiya Pêşketî) a mîrnîşînî weha digot “Pir lezgîn e ku em nîqaşê neteweyî ya ciddî li ser vê pirsê pêş bixin. Heke tişteki neyê kirin, heke çareseriyên ji bo kêmkirina pêdiviyên me yên bi xebatkarên biyanî neyên dîtin, pir eşkere ye ku, rojekê em erebên kendavê bibin gelên xwecih ên herêmê. “Neteweyên pêşîn” ên wekî îndiyanên emerîkî, ji ber hejmara wan a qels, aded û nîrxên ku bi

pêşeroja wan re têkildar nîn in, hatine empozekirin.”

Ev rastî wisa bûye her ku ji aliyê gelek derdorên ve dihele parvekirin, di aliyê din de hin daxwazên ku ji aliyê civakên biyanî ve dihele kirin zêdetir xwe biisrar dikin. Her weha, nûnerên derdorên karmend ên hindistanî, ku ji nîşfa sêyem vir ve li Dubaî û li Abou Dhabi’yê dijîn, her tim daxwaz dikin ku biyanîyên ku li ser axa Mîrnîşînê ji dayîk bûne bibin xwediyê nasnameya mîrnîşînî. Xanim Nancy R. Natyam, ciwanek e ku şewirmendiyê dike, weha şahidî dike, “Ez li vir hatime dinyayê û min tu car gav neavêtiye Hindistanê, welatê bav û kalên min. Ez Dubaî wekî bajarê xwe dibînim, Mîrnîşînan jî wekî welatê xwe, lê belê ez dikarim her rojê bi bûyera ji vê derê şandinê ve rû bi rû bimînim. Ev ne rast e.”

Çapemeniya herêmî, bi taybetî ya îngilîzî, her tim gilî û gazinên kesên bi eslê xwe hindistanî diweşîne. Her weha gilî û gazinên rewşenbîrên anglosakson jî ji aliyê heman çapemeniyê ve dihele weşandin. Daxwaza wan hemûyan ew e ku reformeke ciddî di qanûna nasnameyê de were kirin. Ev daxwaz zêdetir ji aliyê civakên ku li vê derê, bi taybetî di warê aborî de, entegre bûne dihele ziman. Ev derdor, ji vir deh sal berê, bi alîkariya rêvebirên wê demê, wekî xebatkarên biyanî hatibûn û wan di şantiyan de kar kiribûn.

Digel hemû hewldanan, daxwaza sebarêt bi nasnameyê, ya kesên biyanî, bi taybetî ji yên asyayî, ji aliyê rêvebiran ve hatiye paqijkirin. “Em destûrê nadin ku nasnameya mîrnîşînî ji derveyî me ji kesên din re were naskirin. Ev gotin ji aliyê rêvebirekî payebilind e Abou-Dhabi ve hatine ziman û sebarêt bi çareseriyê jî wî wisa berdewam kiriye “Ji bo ku em pêdiviya bi

* Rojnamevan



Foto: Adem Sönmez

xebatkarên biyanî kêm bikin, divê em ciwanan bikin nava ji-yana xebatê.” Li vir divê em gotinên birêz Majid Al-Alawî, Wezîrê Kar ê Mîrnişîna Bahreyn’ê jî bi bîr binin: “Xebatkarên biyanî ji bo gelên Kendav’ê xetereyeke wisa ye, ew ji bombeya atomê yan jî ji êrişbirineke Îsrail’ê xeternaktir in”

Ev bêbawerî, her weha, sebarret bi biyaniyên ku ji welatên ereb hatine jî heye. Ji ber ku, tenê di nava wan de hin filistinî karibûn mafê nasnameyê bi dest bixin, bi taybetî jî ewên ku ji sala 1948’an vir ve li herêma ne. Ev mafê ku wan bi dest xistiye wekî rewşeke pir taybet e. Bi ya bankevanekî serbixwe yê Dubaî’yê, ku ew pêşketineke

weha wekî tiştekî xwezayî dibîne “Naskirina mafê nasnameyê mîrnişînî ji bo misiriyên û magrebiyan, bêyî ku zerarê bide nasnameya ereb û musulman, wê gelheya Mîrnişîn’ê jî zêdetir bike. Heke em naxwazin ji aliyê nifûsa ku ji Hindistanê hatiye ve werin dagirkirin ev tiştekî pir pêwîst e.” Heman kesî balê kişand ser bêbaweriya rêvebirên herêma ku li dijî ereban heye û wisa dewam kir: “Kengê ew mafê nasnameyê bi dest bixin wê dest bi daxwazên siyasî jî bikin.”

Dema ku mirov mijara nexwasteka entegrasyona biyaniyan digire dest, rêvebirên herêma balê dikişînin ser nêzîkatiya wan a li dijî dijminatîya

biyaniyan. Di vî warî de kesên li dora Emir Khalifa Bin Zayid Al-Nahyan, serokê Federasyonê, weha dibêjin “Em derewan nakin, her kesê ku heq dike were Mîrnişînê Erebbên Yekgirtî serçavan hatine, lê belê dema ku peymana wan a xebatê qediya pêwîst e ew biçin. Em nikarin wekî Fransa’yê an jî Kanada’yê bikin, li van welatan biyanî dikarin, piştî çend salan, mafê nasnameyê bigirin. Ji bo me, ji ber ku hejmara me pir kêm e, ev dibe aloziyeke mezin.”

Şefê polîsên Dubaî’yê, general Dhahi Khalfan Tamim, yek ji şexsiyetên medyatîk e, û her weha ew yek ji kesan e ku vê mijarê, bi awayekî eşkere, li pêşberî raya giştî diaxive. Bi ya

wî, bi hinceta parastina mafê kesayetiye, kes nikare daxwaza nasnameyê, ji bo bi sed hezaran biyaniyan ku li Mîrnişînan dijîn, bike. “Kêmbûna mîrnişîniyan li ser axa wan bixwe dikare wekî mafê mirovan were dîtin?”, her dema ku ew sebarret bi vê mijarê diaxive weha dibêje “Bêguman biyaniyan di çekirina destgehên bingeînê Emiratên de bi awayekî çalak kar kirine, lê belê sûda ku wan wergirtiye jî zêdetir bûye.”

Di bihara 2009’an de, di dema foruma li ser nasnameya neteweyî de, li Dubaî’yê, heman generalî, bi dengê bilind û li pêşberî gelek rayedarên payebilind ên Dewleta Federal, weha got “gelo di dema pêş de hindû-

yek nebe berendamê serokatiya welêt?” Dema ku mijara pirsgerêka nasnameya Mîrnişînê Erebbên Yekgirtî û her weha bêhevkêşiya demografîk dihe nîqaşkirin, ev helwesta pir medyatîk wekî referans derdikeve pêşî. Ev helwest di heman demê de pozîsyona muhafazakar a rayedaran û her weha ya parçeyê mezin a mîrnişîniyan e jî. Lê belê, divê dema ku welat di nava pêvajoya pîrozbahiyên çilemîn, di Kanûna 2011’an de, ên salvegera serxwebûna xwe de ye, ev nîqaş tu çareseriyekê dernaxin holê.

Wergera ji fransî
Ahmet Dere

DI NAVA ŞERÊ PROPAGANDAYÊ YÊ ÎSRAÎL'Ê DE

Muftiyê Qudus'ê ku her dimîne

GILBERT ACHCAR*

Di van salên dawîn de, bi piştgiirtiya çalak a partîzanên her du alîyan ên li Ewropa û Dewletên Yekgirtî, şerê propagandayê ku Îsraîl li dijî filistinîyan û ereban bi rê ve dibe, bi awayekî pir darî çav gur bû. Ev qonaxa taybet a şerê ereb-îsraîlî ji bo dewleta Îsraîl'ê her tim gelekî girîng bû: Îsraîl ji destpekê ve wekî keleheke di nava derdoreke herêmî ya dijminane de xwe bi cih kiriye, neçar e piştgiirtiya welatên Rojava ji bo doza xwe bi dest bixe.

Di sala 1982'an de, di dema dagirkirina Lubnanê de, cara yekem îmaja Îsraîl'ê li ber çavên Rojavayê gelekî xerab bû. Raya giştî ya cihanê, bi dorgirtina demdirêj a li Beyrûd'ê û bi komkujiyên di kampên filistinîyan, Sabra û Şatîla de yên ku bi çavdêriya Îsraîl'ê pêk hatî, behitî û matmayî ma. Di nava Îsraîl'ê bi xwe de ev trawma, ku dişibe ya li Dewletên Yekgirtî ya bi şerê Vietnam'ê re çêbû, hîna jî didome.

Di vê keliyê û dema întîfadaya yekemîn a salên 1987-1988'an de, yên ku bi navê "dîroknasên nû" dihên naskirin, çirokên efsûnî yên herî girîng ên îdeolojiya siyonîst a dewleta îbrî bi awayekî rexnegir, ji nû ve analîz kirin. Ev jinûvenivîsandina dîroka destpêka Îsraîl'ê, rê li ber fikreke "post-siyonîzmê" vekir. Ev tevgera fikrî, kêmjimar be jî, di warê çawanîyê de girîng e. Lê vê yekê ne karibû gav bi gav alîrastbûna civaka Îsraîl'ê rawestîne, ne jî karibû xitimîna pêşwext a Lihev- kirinê Oslo'yê, heta bi îddîakirina "neo-siyonîzmeke" êrîşkar rawestîne.

Bi ya vegotina civaknasê îsraîlî Uri Ram, "post-siyonîzm welatîbûneke (piştgiirtiya yek-saniya mafên -ji bo herkesî- dike û bi vî rengî dewleteke ji bo tevahiya welatîyên xwe yên di nava sînorên xeta kesk de [sînorên Îsraîl'ê beriya şerê 1967'an] tercîh dike) gerdûnî û

dinyayî dixwaze. Neo-siyonîzm tiştê e ku xwe taybet dibîne, eşîrparêz e, cihû ye, etno-netewperest e, muhafazakar e, û hinekî jî faşîst e."

Sabotekirina gotûbejên aştiyê ya ji aliyê Îsraîl'ê ve, bi çekirina wargehan, dagirkirina bi lez û bez a Filîstîn'ê û êrîşên wê yên kujer ên bi ser Lubnan'ê (2006) û Gaza'yê (2008-2009) de, îmaja Îsraîl'ê bi awayekî diwar xerab kir. Da ku vê xerabbûna îmaja xwe baş bikin, karbides-tên fermî yên îsraîlî û alîgirên wân ên zexm ku li rojava ne, wekî her tim, serî li bîranînên Shoah didin. Bi vî awayî ew hêvî dikin ku kiryarên xwe rewa bikin.

Ya ji vê jî çêtir ev e: Wan her tim hewl da ku filistinîyan û ereban jî bikin hevkarên tawana nijadkujiyê ya bi destê Naziyan. Bi vê armancê, hema piştî Şerê Cihanê yê Duyemîn, payedarên siyonîst mixabin mî-naka bi nav û deng a "Muftiyê Qudus'ê" der dixin pêş. Muftî di salên 1920'an û 1930'î de figûrekî girîng ê neteweperweriya filistinî bû. Ev zîlam ê ku navê wî yê rastî Emîn el-Huseynî bû, di sala 1937'an de ji aliyê Îngîlistan'ê ve ji Filîstîn'ê hat mişextkirin. Ew jî, piştî ku çendekê li Iraqê ma, di sala 1941'ê de tev li nav Hêzên Mihwerê bû. Ew, li Berlîn û Roma'yê, di propagandaya rêjîmên faşîst û nazî de, û di damezrandina komên musulman ên boşnak ên di nava SS'ê de bi roleke çalak rabû- lê belê van koman kiryarên li dijî cihûyan nemeşandin.

Emîn el-Huseynî beriya mişextbûna xwe ya Ewropa'yê jî, di nava civaka ereb de û heta li Filistin'ê jî têra xwe bêqîmet bû. Bi ya daneyên dîroknasekî leşkerî yê amerîkî, tevî ew qas hewldanên tevlêkirina nava refên Hêzên Mihwerê, bi tenê 6 hezar û 300 leşker ji welatên ereb tev li "saziyên cihê yên leşkerî yên alman" bûn. 1.300 ji wan ji Filîstîn, Sûrî û Iraq'ê bûn, yên mayî jî ji Afrîka'ya Bakur bûn. Divê em vê hejmarê li ber hejmara 9 hezar leşkerên ereb ên ku bi tenê ji Filistin'ê tev li nav refên arteşa Îngîlîz bûbûn bidin ber hev. Divê mirov wê her weha bi hejmara erebên Mexrebê, ku di nav refên Arteşa

Fransî ya Rizgariyê de şer dikirin jî bide ber hev ku ev hejmar 250 hezar bû. Piraniya kuştî û birîndarên vî şerî jî ew bûn.

Tevî vê yekê jî, di propagandaya tevgera siyonîst de, muftî wekî nûnerê fermî yê filistinî û ereban dihe nîşandan. Tevgera siyonîst xwest di sala 1945'an de muftî li Dadgeha Navneteweyî ya Nurnberg'ê wekî ku di pêvajoya qirkirina bi destê Naziyan de xwediyê roleke mezin be were dadgehkirin. Ev daxwaz pêk nehat. Vê propagandaya îsraîlî ew qasî nivîs, kovar û pirtûk derxistin ku di wan de Huseynî dike tawanbarê mezin ê li hemberî gel ku divê bê cezakirin, ku mirov bi hêsanî dikare bawer bike ku ev zîlam yek ji celadên girîng ên Nazî'yan bû. Divê em qebûl bikin ku figûra muftî destûr da ku filistinî wekî hev-berpirsiyarên qirkirina cihûyan a Hitler werin nîşandan û bi vî awayî Îsraîl'ê karibû xwe rewa nîşan bide ku welatê wan bike "dewleteke cihû."

Ev motîvasyon, ji dema avabûnê û vir ve, bû dubareyeke misêwa di nava propagandaya Dewleta Îsraîl'ê de. Ew sedema girîngiya figûra muftî bi diwarê abîdeya Yad Vashem a ji bo bîranîna Shoahê li Quds'ê tîne ziman. Tom Segev balê dikşîne ser ku ev diwarê ji bo bîranînê avakirî, wisa hatiye lêkirin ku mirov projeya qirkirinê ya naziyan bi dijminatîya ereban li dijî Îsraîl'ê re girêdayî hîs bike. Li aliyê din jî, Peter Novick bala xwe da Encyclopedia of the Holocaust (Ansîklopediya Qirkirina Cihûyan) û dît ku tê de nivîsa danasîna mutftiyê li ser Yad Vashemê cih digire, ji nivîsên danasîna Himm- ler, Heydrich, Goebbels yan jî Eichmann gelekî dûvdirêjtir e. Ji nivîsa li ser Hitler bi tenê hinekî kurttir e.

Bi agirê gêsê e nijadperestîya dij-ereb û yê tîrsa ji Îslamê (îslamofobî) ku ji dema êrîşên 11'ê Îlona 2001'ê û vir ve harbûye, çapkirina nivîsên armanca wan îspatkirina hebûna xetereke qirkirineke li dijî cihûyan di sala 1948'an de li Filîstîn'ê hebû, gelekî zêde belav bûn. Ma ne rast e ku wekî muftî, ereb bi qasî naziyan kîna wan li dijî cihûyan hebû - û îro jî ev kîna wan dimîne? Di van şert û

mercan de, ma derxistina filistinîyan bi avakirina Dewleta Îsraîl'ê re, û di vê çarçoveyê de tepisandina wan, ne mafê xweparastîneke rewya ye?

Di nava vê loda propagandayê de nivîs û pirtûkên wisa bi kar tîne, didu ji wan ji ber xebatekê li ser arşîvên naziyan in, cihê û ciddî xuya dikin: Ya Klaus-Michael Mallman û Martin Cuppers û ya Jeffrey Herf. Di her duyan de nivîskar dinyaya ereb û zîmanê wê gelekî kêma nas dikin. Dosyayeke rexnekirinê ya li ser pirtûka Mallman û Cuppers a bêkêmasî di kovara Weqfa Auschwitzê de heye, Témoigner entre histoire et mémoire (Şahidbûna di navbera bîr û dîrokê de). Di tevkariya xwe ya vê dosyayê de Dominique Trimbur îddîa dike ku ev nivîs "di nava herikîneke dîrokî de ya ku di bin têsîra rojevê de ye, cihê xwe digire. Rojeva destpêka salên 2000'î [...] Tevahiya xebatê bênuans hatiye çekirin. Wekî mînak wexta qala ereban an jî qala cîhana musulman dike, mirov dikare tê de dubarekirin û bêhtir qebûlkirina îdiyoma 'şerê şaristaniyan' bibîne."

Li hemberî bikaranîna bi vî rengî ya bîranîna Shoahê ji aliyê Tel Aviv'ê ve û ji bo ku doza filistinî rewya bike, du meylên bi hev re nakok li aliyê ereb peyda bûn: Li aliyekî şibandina kirinê Îsraîl'ê û kirinê naziyan, versiyona ereb a kevneşopîya gelekî kevnar a îsraîlî ku aliyê îsraîlî pê filistinî û ereban dişibîne naziyan; û li aliyê din jî inkarkirina bûyerên Shoahê (ku jê re dibêjin negasiyonîzm).

Di cihana ereb de têkelkirina van her du nihêrînên nakok ji aliyê gelek ereban ve - nihêrînek jê nazîzmê wekî asta herî bilind a xerabiyê dike dibîne, û ya din îddîa dike ku nazîzm bi qasî ku dihe gotin xerab nîn e - bi awayekî eşkere nîşan didin ku: Ev bi şiddeteke sembolîk hewldaneke bersivdanê ye ku armanca wê telafîkirina bêgaviyeke bersivdaneke bi bandor a li dijî şiddeta bi rastî ye. Serokomarê Îran'ê Mahmûd Ehmedinejad dixwaze bilindbûna vê negasiyonîzma muhafazakar û hisî di pêşbaziya xwe ya bi melîkiya Suûdî re bikar bîne. Ew dixwaze sempatiya Îslam'a sînî

ya ereb bi dest bixe.

Ya rastî, yên ku di civaka ereb de ji dil û bi zanîn piştgiirtiya vê nihêrîna nenormal a negasiyonîzma rojavayî dikin - ji bo wan negasiyonîzm dibe "antisiyonîzma ehmaqan" (em li vir bi şiklekî din, biwêja navdar ku antîsemîtîzmê dike "sosyalîzma ehmaqan" dubare dikin) - gelekî kêma in, hindikahiyeke pir piçûk in.

Piraniya alîgirtina negasiyonîzmê, bêhtir ji ber qedandina sebra mirovan e. Anketên li ser fikra raya giştî ya filistinîyên li Îsraîl'ê hatî kirin, vê rastîyê derdixin holê. Ev ereb bêguman di nava ereban de yên sebare bi qirkirina cihûyan de herî zêde agahdar in. Lewra ev mijar di bernameya perwerdehiya dibistanan de ya ji aliyê meqamên îsraîlî ve hatî amade kirin têra xwe cih digire. Zanîngeha Haifa'yê sala 2006'an anketek çekir. Di encama vê anketê de surprîzeke giştî derkete holê. Ji sedî 28'ê erebên îsraîlî êdî "shoahê" qebûl nedikirin, ev hejmar bi ya asta xwendinê ya kesên tev li anketê bûn, mezin-tir dibû (asta xwendinê çî qasî bilind be, hejmara kesên ku qirkirin inkar dikirin zêdetir dibû). Du salan paşê di çarçoveya şiddeta zêdebûyî de heman anket careke din hat kirin û anketê nîşan da ku ji sedî 40'ê beşdarên anketê negasiyonîst bûn!

Wisa xuya ye ku tirsakbûna vê rewşa heyî, ji her demê bêhtir komunîkasyona di navbera her du alîyan de neguncan dike. Lê belê dîsa jî herkesê ku dijberiya di navbera ereban û Îsraîl'ê de nas bike ku di dehsalên hema piştî sala 1948'an û yên hema piştî sala 1967'an de dest pê kir û xuya ye kêma nabe, dizane ku îro tevî her tiştî, hejmara ereb û filistinîyên ku amade ne bi Îsraîliyan re di nava aştiyê de bi hev re bijîn, zêdetir e. Ew kes her weha hejmara îsraîliyên zilmkirina li filistinîyan ji aliyê dewleta xwe ve wekî gunehekî qebûl dikin jî, ji ya ku em guman dikin, bi gelekî zêdetir e.

Werger ji fransî
Lokman Turgut

* Profesore Dîbistana Perwerdehiyên Rojhilatî û Afrîkî ya Zanîngeha London'ê (SOAS), nivîskarê pirtûka *Les Arabes et la Shoah. La guerre israélo-arabe des récits (Ereb û Shoah: Bi gotina xelkê şerê di navbera Îsraîl û ereban de), weşanên Sindbad/Actes Sud, Paris, 2009.*

AMERÎKA YA LATÎN

Rê, pir, elektrîk û Pacha Mama

MAURICE LEMOINE

“E m di cihaneke cuda de dijîn. Ew li Bolîviya’yê dijîn, em li Colasuyo’yê!” Zilamê şêrîn ku li vê derê dijî, birêz Constantino Lima, rêvebirê Tevgera Indiyayî Tupaj Katari (Mitka), li La Paz’an hêrs dikeve, bi gotinên tund li dijî Q’aras –kesên sipî. “Axa dayîk, Pacha Mama, Ewropa’yê daye wan; wê Afrîka ji bo afrîkiyan hişt, Asya ji bo asyayîyan û, ji bo me jî Bolîviya hişt. Bi ya qanûna me ya “bingehî”, pêwîst e cezayê îdamê li hemû ewrûpiyan were birrîn, ji ber ku wan, bi dagirkirinê, sûcê herî mezin ê li dijî mirovahiyê pêk anîne. Belê, ev hinekî dijwar e, lê ev rastiya pêşniyara me ye.” Ji xwe... “Em, Çermesor, bi hejmar em piranî ne! Çawa em dikarin xwe bi xwe bikin hindikayî?” Kinayî, wekî gulmisteke çermesoran a radîkal, birêz Lima dixwaze serxwebûneke gelê xwecih, li ser axa împaratoriya kevin a Înka ji nû ve ava bike. Serdema zêrîn. Dema ku gelên xwecih hukûmdar bûn, di nava ahengê de, li ser axa Amerîka’yê (her kesî bi vê rastiye dizanibû, lê belê nedianîn ziman)

Di nava ahengê de? Di sala 1519’an de, perdeyên xwe li dikeya transatlantîkê vekir. Împaratoriya Aztek axa ku niha bûye Meksîka, kontrol dikir. Dagirker derdikevin holê. Top û tîfingên bi heybet, şûr, hesp – heywanên nedîtî, ên bipirç, bêhevsar û bi dêliyên dirêj! Ji bo ku parzemînekê bigirin bin destê xwe pir hindik bûne. Tenê.... Bi armanca hukûmdariya Împarator Montezuma bişkinin, serokê çermesoran Totonaque’yê çar sed (400) hemalan diyariyê karwana Hernan Cortes dike. Bi armanca heman sedeman, Tlaxcala jî sed hezar (100.000) kesên dike xizmeta dagirkeran. Li başûr, li ser wê axê ku ku pişt re dibe Guatemala, Pedro de Alvarado bi Cakchiquels re hevkarîyê dike, yên ku bi Quichés’an re di nava şer de ne. Hîna li Başûr, li cihên bilind ên Andes, li cihê ku jê re Cuzco dihat gotin cihan dagir kiriye, Francisco Pizarro ji têkoşînên ku Împaratoriya Înka parçe dikin sûdê werdigire. Ew alîkariya Kanarrs, Cahachapuyas, Wankas û yên din jî digire

ku dawî li dewleta teokratîk bîne – û dawî li jiyana Athualpa tîne.

Hevkariyên trajîk, jihevqetandinên kûr. Ev e dawî. Bi zora şûran, bi alîkariya waazên keşîşan, dojahê hemû sawa xwe di carekê de dida der. Xwecih bin ketiye, şerpeze û birçî bûye. Kolêtî, xebata bi darê zorê -di galeriyên mayînan de-, di nava têlan de- di zêviyan de- dibin sîstemên afirînêr ên herî kêrhatî.

Dema hate gumankirin ku Amerîka’yê komar ava kirine, gelên xwecih bûn ên ku ji mirinê xelas bûne. Digel hemû berxwedan, serhildan û vîna xwe. Mixabin..... Serxwebûna wan di nava şertên bêhemwelatîyê de digire. Di nava rewşa herî baş de jî projeya siyasî ya neteweyî, ji wan re pişavtina bi darê zorê pêwîst dike. Ji axavtînan dagirkeran wê de tir, ên bi niyetên tije başî an jî xerabî, kesên spî û biyanî hemûyan dest dane hev ku siyasîyê, aboriyê, pişesaziyê, karsaziyê û saziyên dewletê hemû bi hev re bimeşînin.

Giraniya wan a demografîk çiqas dibe bila bibe, ew wekî hindikayî hatine dîtin. Lewre çermesoran pir şertên objektîf (taybetmendiyên çandî, rêkûpêkiya civakî, girêdana bi axê) û sêbjektîf (hestên aîdbûnê) ji xwe re kirin sedema berxwedanê. Bi vî awayî wan hestên xwe yên nasnameyî xurttir kirin. Lewre bi awayekî sîstematîk wan nehişt ku ew girtî bimînin.

Di sala 1992’an de, bi boneya kampanyaya parzemînî ya “Pênc sed saliya berxwedana çermesoran û reşikan û ya girseyî” Mapuche’ê ji Şilî’yê Ana Yavo weha digot “Dê em bi tevgerên girseyî, xwendevan û sendîkayan re bibin yek”. Wê xanimê, ku gelek kes nas dikirin. ... Augusto Pinochet. Du salan pişt re, heman daxwaz jî aliyê Chiapas û Zapatîsta ve hate parastin: “Artêşa me ya hêviyê, li dijî biyaniyan nîn e; ew li dijî reha pere ye. Ew li dijî rengê kîrî çerm nîn e, ew li dijî rengê pere ye. (...) Em ji bo xwecihan têdikoşin. Lê belê ne tenê ji bo wan jî. Her weha (...) em ji hemû kesên ku niha di nava xizaniyê de ne lê ji bo paşerojê rû-

meta wan mezin e jî têdikoşin.”

Amerîka ya çermesoran ku jê re dibêjin “latîn” niha bi piranî ketiye destê biyaniyan. Heke rast be ku çermesor marjînal bûne, niha bi dehan milyonan gelên xwecih ji pêşketinên civakî, perwerdehî û hemwelatîyê bêpar mane. Ji xwe pêvajoya biyanibûnê wisa pêş ketiye ku êdî ne guncan e ku mirov di navbera yekê û yê din de sînorekê çê bike. Civaknas Yvon Le Blot [Gelên Xwecih] weha dibêje “Ew di nava daristanan de, li serê çiyayî an jî di nava bajaran de jî bijîn, ew di nava civakên vekirî de ne, pêwendiyên wan bi gelên cur be cur re heye, navê wan di nava dînamîkên neteweyî û navneteweyî de hatine nivîsandin.”

Yekbûna di navbera hêzên çermesor û yên girseyî de wekî mijareke rojevê, di navbera tevgerên xwecih de dihê nîqaşkirin. Dema ku hinek daxwaza entegrasyona neteweyî, di nava cudahiyeke de, dike, ên din daxwaza xwe-pêşketina li ser bingeha etnîstîyê dikin. Di nava salên 1960 û 1980’î de, yên ku daxwaza entegrasyonê dikin ser ketine. Hewldanên gelên xwecih zêdetir di warê têkoşînên gundiyan de, bi taybetî bi rêya tevgerên girseyî, pêş ketine. Lê belê, pir caran vê nêzîkatîyê ew tengav kirine û bûye sedem ku ew di nava xwe de bimînin.

Li hember nihêrînên aktorên civakî, globalîzma ku pêş dikeve wê encama pir tiştan biguhere. Westandin an jî xerabbûna partiyên siyasî, paşveçûna çepgirên qels, tunebûna projeyên alternatîf ên civakî pêwîstiya bi nûkirina hewldanên ji bo pêşxistina çanda herêmî derdixe pêş. Bi ya rêxistîbûna wan, a ku ji derdoran pir cudatir e, çermesor ketine nava pêvajoyeke dînamîk a ji bo tevgerkirina civakî ku heta niha nehatiye naskirin. Ji serhildanan heta serhildanan –ku tê de bi giranî ew hatine pelçiqandin- li dijî bazara global wan her tim li ber xwe dane û civaka xwe li pêş xistine. (berewajî wî jî her im rast nebû)

Baş dihê zanîn ku Konfederasyona Neteweyên Xwecihan a li Ekvatorê (Conaie), li welatê xwe bû sedema rûxandina sero-

kên wekî Abdallah Bucaram (di sala 1997’an de), Jamil Mahuad (di sala 1999’an de) û Lucio Gutiérrez (di sala 2005’an de). Li Bolîviya’yê, di destpêkê de “şerê avê” pişt re jî “şerê gazê” bûn sedema daxwazên çermesoran û her weha yên giştî; ew şer bûn sedemên dawîlêanîna neolîberalîzma Gonzalo Sánchez de Lozada (di sala 2003’an de). Heman rewş dibe qedera Carlos Mesa (yê ku di sala 2005’an de bû serok) û dibe destpêka pêvajoya ku ji çermesorekî re rêya serokatiya dewleteke Başûrê Amerîka’yê vekir, birêz Evo Morales. Bi awayekî sembolk be jî, birêz Morales destpêkê ji aliyê derdorên kevneşop ve, li qada arkeolojîk a Tiwanaku, hate naskirin, rojekê pişt re wî li pêşiya Kongreyê sond xwar. Bi her awayî, di nava cudahiya “dij-minê bira” de, ew li dijî Felipe Quistpe, yê radikalê xwecihan, bi ser ket. Divê birêz Morales tenê xwe bi alîkariya xwecihên, ku di piraniyê de ne, negire, divê ew li ser sektora bajariyê, li ser firmayan, li ser kesên teqawîbûyî, li ser nîfşa biyaniyan jî bisekine û zimanê wî “neteweyî” be.

Li derveyî welat, kesên ku, -civaknas, etnolog, rojnamevan, komeleyên alîkariya mirovî û yên ekolojîk- sebarek bi saxlemkirina çermesoran de xeyalan dikin, bi awayekî egzotîk û îddîa dikin ku ew nasnameya wê saxlemtir bikin, bi nêzîkbûnên pir xerab ve rû bi rû dimînin. Pir caran ew rastî fêmnekirinan û her weha nêzîkatîyên dijwar jî dihên. Lê belê carna jî ew serkevtin û pêşketinên xwe jî dibînin. Ji bo vê nostaljiya paqijiyê “ji ber ku wan xurura xwecihbûnê wenda kir, ew dev ji cudabûna xwe berdidin û dikevin nava hewldanan da ku xwe entegre bikin.” Her weha ew wisa guman dike “Lewre, divê civakên xwecih her tim têbikoşin ku taybetmendiyên xwe biparêzin, lê belê divê ew baldar bin ku ew hewldanên wan nebin sedema asimilekirina cihêrengiya kesên din.”

Li Bolîviya’yê, birêz Quispe –le malku (condor en aymara) – hêrsa xwe naşkinê. “Em li ser neteweyekê diaxivin, ku serxwebûna xwe dixwaze. Em dix-

wazin Komareke Callasuyo’yê ava bikin û bibin xwediyê rêvebiriyên xwe, hêzên xwe yên leşkerî û yên polês” Lê belê nîjadperestiya wî ya Aymara di dema hîlbijartinan de nikaribû alîkariya hemû nîfûsa xwecih bike. Li Ekvatorê, di sala 2006’an de, digel hewldanên serekê dîrokî yê Conaie, Luis Macas, ku li hemberî berendamê din (biyani) Rafael Corea ê çepgir, ketibû hîlbijartinan, tenê karibû ji % 2 dengên girsêya xwe bigire. Gelo dibe ku mirov xwe zêde hêrs bike?

Xwecihbûn nabe sedem ku mirov ji nêzîkatîyên nîjadperest, şûndemayî û muhafazakar were parastin (li vir em sebarek bi birêz Macas naaxivin). Di sala 1993’an de, Bolîviya’yê karibû şefekî fraksiyona katarîzm, birêz Victor Hugo Cardenas, bîne ser peywira cihgirê serokkomariyê. Di aliyekê de ev kesê ji Aymara’yê daxwaza guhertîneke destûra bingehîn ku “fire-etnîkî û fire-çandî” yê bike, di aliyê din de jî wî siyaseta fire-lîberal a serok Sánchez de Lozada (wê demê di dema xwe ya yekem de bû), yê ku çermesoran (her weha yên din) li ber mirinê dihişt, garantî dikir. Li Peru’yê, birêz Alejandro Toledo, yê ku xwe wekî cholo dide xuyan, hemû derfetên xwe dixebitîne ku xwe careke din bide hîlbijartin (di 2001’an de), da ku ew welat ji pisporên Fona Navneteweyî a Pereyî (IMF) û Banke ya Cihanê re nehêle. Ev her du sazî jî li wê derê qadeke balkêş ji xwe re dibînin.

Bi taybetî di warê modela neolîberal de, girîngtirbûna qada civakî dikare bibe sedema rewşeke nediyar. Banke ya cihanê, ya ku ji 2004’an û vir ve foneke global ji bo gelên xwecih veqetandiye, xwe naxapîne û projeyên piçûk finanse dike. Ev banke -çi di warê herêmî de û çi jî di warê hevkarîya bi sektorên taybetî û ên dewletê re, heman karî bi civakê re dimeşîne.

Di bin zextê de -ya rewşa tevgerên xwecih, tevahiya welatên latîno-amerîkî, destûreke bingehîn qebûl kirin û bi ya wê karakterê fire-etnîkî û fire-çandî ji bo neteweyê nas dikin. Di hin rewşan de ev destûr hin mafên spêşîf ji çermesoran re nas




Foto: Murat Yazar

dike, (an jî ji bo wan kesên ku ji Afrîka'yê hatine). Bi rastî, heke tu rêxistineke xwecih serxwebûna xwe ranegihîne, piraniya wan -bi taybetî yên li amazona jêrîn in- wê mafê tayînkirina

paşeroja xwe û otonomiyeke fireh, li ser axa xwe bixwazin. Piraniya dewletên ku ji wan re mafê otonomiyê nas dikin pir bipîvan tevdigerin.

Çiya, şelaleyên pir biheybet,

kendalên tîk, brûsk, dengê ewran, baran... Axa dayîk, Pacha Mama. Ahengeke di qada kâinatê de nihêrîna gerdûnî yê. Bi awayekî giştî, amerîçermisor (Amérindiens), sebareti bi xwe-

zayê, ji rojavayîyan zêdetir xwe-diye nihêrîneke birehm û rêzdar in. Ew dizanin ku hemû xerabbûna jîngehê li ser şertên jiyana wan bandoreke neyînî dike. Çi zêdetir rewşa ye, ji dema

ku ew li dijî berjewendiyên navneteweyan, ên ku daristanên wan diqelişînin, axa wan a tropîkal, zêviyên wan ên avî, axên wan bi berhemên kîmyewî û cihên zivîlan xerab dikin, avên

wan jehr dîkin dernekevin? Ji mijara ji tevlebûna pêkanîna kontrola siyasatên civakî zêdetir biguman e?

Digel hemû tiştan, axên otom, an jî na, ew wekî parçeyekê dewleta neteweyî ne. Li ser axên xwe ew berdewam dîkin ku çavkaniyên xwezayî, bi taybetî yên hîdrokarbûran, bixebitînin. Û, di çarçoveya siyasatên heyî de, ên ku ji aliyê pir welatan ve (Bolîviya, Ekwator, Venezuela) dihên bikaranîn, bi rêya netewekirinê, ji bo berjewendiyên projeyên kolektîf ên pêşxistinê, divê were bandorkirin. Li wê derê xala pevçûnên herdemî û ne erzan ên nakokîyan heye. Ji ber ku, “heman kes dikarin kontrola xwe li ser dewlemendiyên xwe yên binerd, bi rêbazên xwe yên rêxistîbûnê, çêkin. Lewre ew natirsin ku ji mudaxaleyeke mezin a dewletê nerehet bibin.” Wekî hemû kesan, her yek ji wan, daxwaza bixêstxistina ava paqij, rê, dibistan, nexweşxane û hwd. dike. Divê bi lezgîniyê ev hemû werin fi-nansekirin.

Bi awayekî berevajî, bêguman, divê çermesorên amazonî, yên Ekvatorê, bikaribin ji hîdrokarbûranê sûda jiyankirinê werbigirin. Di salên 1970-1980'ê de, dewlemendîya neftê karibû zexta heyî, ya li ser axa Andes, kêmbike. Bi rêya heman dewlemendiyê di bajaran de, bi çêkirina xaniyan, cihên xebatê hatin peyda kirin û ev bû sedem ku koçberkirina girseyî, yên ber bi herêmên daristanan kêmtir bibe. Li heman herêmê mirov dikare kesên xwecih, bi rêya axavtinên sebarê bi netewetiyeke radîkal, bibîne. Bi awayekî giştî ew her tim li ser motorên erdê ne.

Her tiştê “biyanî” ku nêzîkî axa bav û kalan bibe wekî xeter dihên dîtin û her weha hemû tiştên ji derve hatî wekî êrişê li “nasnameyê” dihên pejirandin. Di sala 2008'an de, li Santa Cruz (Bolîviya), cihê ku wekî qeleya muxalefeta “spiyan” a li dijî birêz Morales dihê naskirin, di nivîsgeha walîtiya “cudaxwaz” a Rubén Costas'yê de, yek ji parlamenterê neteweyî yê xwecihên quarayo'yê, birêz Ignacio Urapuka weha digot “Serok dixwaze me di aliyê Oriente'ê de bibe, li aliyê birayên quechuas û aymarâs. Dema ku ew dihên, bêtî ku xwezayê li ber çavan bigirin ew dest pê dîkin ku daristanan biqelîhînin. Em bi vê re nîn in, ev ax a me ye.” Helwesta birêz Adolfo Chávez, serokê konfederasyona gelên xwecihên Amazonî, Chaco û Oriente'ê (sî û çar gel) jî weha bû: “Muxalefet birayên ku li gelê xwecih xiyaret kirin û axa me frotine dagirkeran empresarios digire cem xwe. Ji bo wan bi kar bîne,

ew li wan deran dihên bicihkirin ku dikarin bastir ji wan partîyan re bibin alîkar ku heta niha zeraerê dane welat.”

Li Venezuala'yê, serok Hugo Chavez naskirina nasnameya çermesoran wekî deynekî dîrokî û her weha dewlemendiyekê neteweyî pejirand. Di bin berpirsiyariya wezareteke rêvebirîya gel û civakên xwecih de, ku di sala 2006'an de hatibû avakirin, digel diwariyên pêkanîna projeyên wisa, wî ax di nav gel de belav kir. Bi rêya vê projeyê, kesên ku axa wan ji dest hatibûn girtin gihîştin mafên xwe. Lê belê, li Karañakal'ê, nava Sierrâ de Perijâ'yê de, komeke Jivaros hatin û xwe li ser axa Bari de bi cih kirin. Sebarê bi vê bûyerê birêz Rufino Alawaiko, şefekê gel ê wê herême weha got: “Serok dibêje ku divê em bi xwecihan re bijîn. Em vê naxwazin. Heke Bari naxwaze bi kesî re bijî divê em ji biryara wan re rêzdar bin.” Nijadperestîya etnîkî jî dikare, bi taybetî pir xerab be. Deriyê dogehê ji niyetên baş re jî vekirî ye.

Li dijî bêdengiyê devê xwe ji gefan re vedikin – û nefreta xwecihan- di salên 1980'ê de, li Uruarâ'yê (Brêsil), dema ku hate gotin wê du hezar (2000) gundi-yên xizan werin koçberkirin, ewên ji amazonê hatibûn anîn ku 800.000 hektar axa ku ji xwecihên Ararâ'yê re hatibû veqetandin par ve bikin, çil û du kes di nava daristanê de hatin dîtin. Li Chiapas'ê, biryara ku di sala 1972'an de hatibû girtin, ya hukûmeta meksîkî ku sebarê bi 600.000 hektar axa ku wê ji bo civaka Lacandone hatibûna dayîn, a ku nûneriya wan ji aliyê şêst û şeş şefan ve dihatê kirin, bû sedema pevçûnên di navbera wan û xwecihên Zapatîsta de.

Ev kesên ku bi wan re diyalog hatiye redkirin û bi têkiliyên diwar re, ên bi “cihana siyasî” ve, (çepgir û rastgir tevlihev in) rû bi rû mane dikarin ji helwestên xwe yên tund jî nerehet bibin. Dema ku Fermandar Marcos, ji aliyê birêz Morales ve, zarokê têkoşîna xwecihan ku bûye serok, hatibû vexwendin, ji bo merasîma “dîrokî” ya sondxwarîna serokatîyê ya li La Paz'ê, weha bersiv dabû: “Armanca me ne ew e ku em tev li zirveyan bibin, ya esasî ew e ku em li jêrê binihêrin. Qaîdeyê me ne ew e ku em serekên mezin bibînin. Em difikirin ku divê tevahiya gel tev li rêvebiriyê bibe, ne tenê yek kesek.” Bi awayekî hûnermendiyê wî xwe tenê hişt.

Li vî welatî, –Bolîviya–, serok daxwaza xwe ya ji bo dawîlê-nîna salên neolîberal diyar dike û gotinên “dagirkeriya navxweyî” - yek ji aliyê “nijadperestîya xwecihan” –, derew derdixe. Rêxistîbûna nû ya otonomîya

axê ku li ser esasa naskirina çar rêbazên otonomiyê (beş, herêm, şaredarî û xwecih), yên ku bi hev re zêde nameşin lê belê di warê zagonî de xwediyê heman bingehe ne, digel xwe gelek pirsgerêkan jî derdixe holê. Çawa, wekî mînak, edaleta civakî û edaleta asayî dikarin xwe bidin qebûlkirin. Ji ber ku, di pişt “kevneşopiyê de”, “demokrasiya xwecihan dikare rêbazên xwe yên otorîter, ku bi rêya rûs-piyan dimeşe, veşêre û desthilatîya xwe bide meşandin, an jî bi sedeman derveyî destê xwe zexm bike.”

Di heman demê de, li Guetamala'yê, xwecih her tim di bin zexteke dagirkeriyê de ne. Di meha Gulana 1992'an de Xanim Rigoberta Menchú li wê derê Xelata Aştiyê ya Nobel'ê wergirt, pişt re jî ew bû nûnera taybet a serokatîya neolîberal a Oscar Berger. Şilî her tim qanûnên li dijî terorîzmê yên Pinochet bi kar tîne ku Mapuchan di bin zextê de bihêle. Li Venezuela'yê, birêz Hector Eduardo Okbo Asokma, şefê xwecihên Bari yên Saimadoyî'yê, bi awayekî bêdeng meşa xwe didomîne: “Di aliyekî de em elektrîkê, rêyên baş, tevî piran dixwazin, di aliyê din de jî em naxwazin ji kevneşopiyên xwe dûr Kevin. Mayîna di navbera teknîk û kevneşopiyê de. Em bi her duyan jî bawer dîkin.” Li Ekvator'ê, di meha Adar'ê de, bi alîkariya ekolojîstan, muduriyeta Conaie li dijî serok Correa, ku ji aliyê hevkarên xwe ve hatibû ser Peywirê, şer îlan kir. Ev şer di nava wan nîqaşan de pêkhat ku sebarê bi pêşxistina maden-vaniyê, lêgerînên ji bo neftê û bikaranîna avê dihatin meşandin. Her dem, bi taybetî bi ya şîrovekarê siyasî Pedro Saad, “Rêvebirên Conaie, ji ber banga wan a serhildanan, ji aliyê xwecihan ve nayên şopandin.” Ji Amazoniyan cudatir, ên ku di piraniyê de ne û li cihên bilind dijîn, – la Sierra – piştgiriya xwe ya ji bo serokdewletê ku her tim bi pirsgerêkan xwe ve mijûl e, didomînin.

Çendî wê berxwedaneke demdirêj, di dîroka cihana nû de meşandibe jî, dînamîka nasnameyî jî xwedî sînorên xwe ne. Di vî warî de, bi dijberiya fikrên xwecihîtiyê, “authentique”, “Wisa diyar e ku çermesor rêbazêke sosyal a biyanî derdixin holê. Ev tenê bi xwe re rewşekê nû ya biyolojîk dernaxe holê, lê belê, ew rêbazêke nediyar, a ku tenê ji aktorên xwe re dikare kêrhatî be, jî diafirîne. Hebûna wê tenê bi ya nîqaşên sebarê bi wê de hatine kirin û yên ku wê werin kirin xwediyê nîrxê ye.”

Wergera ji fransî
Ahmet Dere

Hilbijartinên Brîtanya'yê

SERGE HALIMI

Ev afîşekê kampanyaya hilbijartinê bû ku mirov ne li bendê bûn. Serokwezîrê Partiya Karkeran Gordon Brown bi kêfxweşî dida zanîn: “Min qelşa navbera dewlemend û xizanan mezintir kir; Destûrê bidin min ez berdewam bikim.” Ev jêgirtin gumanbar e, lê mijara ku ew qala wê dike rast e. Di dawîya salên rêvebirîya Thatcher-Major de ji sedî 1'ê brîtanîyên herî dewlemend xwediyê ji sedî 17'ê tevahiya jêhatina aborî ya neteweyî bûn; ji dema ku Antony Blair û Brown bûn desthilatdar û vir ve ev rêje gihiştê ji sedî 21'ê.

Plakata îronîk digihîje vê encamê: “Dengê xwe bidin muhafazakaran.” An ku em hinekî şahidiya şerekî hilbijartinan ê berevajî dîkin, Partiya Karkeran parêzvaniya golden boys (xortên zêrîn) ên bajêr dike, ji aliyê din ve hevrikên wê serê xwe herî zêde bi derdorên populer diêşînin. Tiştê di ser vê re nîn e, bi taybetî jî di rewşa dawî de. Lê belê di her du partiyên mezin de hev kêşiyekê siyasî pêk dihê. Ev her du partî jî dûrî hêmanên xwe ketine ku berdevkiya wan dikirin. Ne Thatcher ne jî Blair: Kraliyetê Yekgirtî dest bi serdemeke nû dîkin.

Mijarên ku demeke dirêj qedexekirî bûn jî, ji nû ve di nava gengeşîya siyasî de derdikevin holê: Çînen civakî, destwerdana bi destê dewletê, sendîka. Ji bo şerê diwarê li pêşiyê, muhafazakaran mijara deynan a ji bo wan kêrhatî tercîh kiribû. Neçar man nişana armanca xwe çêtir bigirin; serastkirina malî ne bi tenê bi kêmkirina lêçûnên budçeyê dibe, her weha bi bacên nû jî wan êdî li ber çavan digirt. Ew êdî pesnê National Health Service (Xizmeta Tenduristiyê ya Neteweyî) didin. Ew soz didin ku ewê budçeya vê sistema civakî ya xizmeta tenduristiyê her sal zêdetir bikin, ev sistema ku Thatcher jê nefret dikir. Ya rastî ew ji helwesta xwe ya li dijî hevzayendhezan (homoseksuelan) a berê poşman in û wan niha rengê xwe jî kiriye kesk (nota wergêr: maskeya siyaseta ekolojîk). Ew gelekî girêdayî rêvebiriyên şîrketan e, lê belê li ser vê mijarê diwar e mirov wan ji hevrikên wan cihê bike. Partiya Karkeran jî kir ku 1036 tawanên din jî bi cezaya girtîgehê bikaribin werin cezakirin.

Partiya Karkeran her weha her tişt bi ya lîberalîzasyonê eyar kiribû û London veguherandibûn navenda sosret û skandalên darayî. Êdî ya ku diviyabû topavêtin bû. Lihevderneketina budçeyê ya gelekî mezin (ji sedî 11.9'ê hilberîna brut a neteweyî) ku mirov dikare bi ya Yûnanistan'ê bide ber hev (ji sedî 13.6) dike ku parlamento ji lêçûnên xizmetên civakî qut bike. Vê yekê jî bandora herî xerab li hilbijartîyan kir ku beriya çend mehan ji bo nûkirina xaniyên xwe yên duyemîn û ji bo kîrîna xanîkên piçûk ên li ber golan ji bo parastina werdekan pere ji xezîneya dewletê stendibûn. Şermokîya Partiya Karkeran ji nû ve siyaseta pîşesaziyê dixwe rojevê. Û heta carinan, ... bankavanan jî aciz û zivêr dike!

Demokratên lîberal bi xwe şansa wan heye: Sistema siyasî bi skandalan qirêj bû û demokratên lîberal bi ya hevrikên xwe hindiktir bi qirêja van skandalan bûne. Serokê wan Nick Clegg – kurê bankavanekî, li Cambridge xwendîye, bi parêzereke bazirganiyê re zewiciye, şewirmendê berê yê Leon Brittan e ku komîserê gelekî lîberal ê Yekîtiya Ewropa'yê ya li ser mijara hevrikiya bazirganî bû – wî jî xwe jê neda alî ku fikrên xwe çepgir bike. Ev berhema xwerû ya elîtê bi vê helwesta xwe anî ziman ku bihuştê berê ya Thatcher û Blair dibe ku bi “tevlîheviyekê civakî mîna ya li Yûnanistan'ê” re rû bi rû bimîne.

Wergera ji fransî
Lokman Turgut

DOSYA YA AFRÎKA'YÊ

Parzemîna ku li rûyekî nû digere



Foto: Paşa Imrek

Mirov di navbera dîplomatê gabonî Jean Ping, ku ji bavekî çînî ye û Serokê Komisyona Yekîtiya Afrîka'yê ye û Profesorê norwecî Erik Reinert ku li Estonya'yê aborîyê fêr dike û her wiha ji The Other Canon, komeke aborînasên rexnedêr re serokatîyê dike de dikare çi hevbeşiyê bibîne? Daxwazeke hovanê ji bo pêvajoya pêşxistinê bîne ziman û girtina biryarên ku cesaretê didin welatên kêr endûstriyel.

Her du xwendevan, di dîrokê de, li ser pêşveçûna dewletên kêr bibandor de bandoreke neyînî çêkirine. Ji bo Reinert, kombînezona cîhana hemdem û sistemeke "primitisation"ê – tevliheviyeke cezakirî, ya piçûkxistina ku cefa ya dagirkeriyê

kişandiye – ji makîneya berde-wamkirina neteweyan û hemwelatîyên Başûr re rê vekir. Li gorî wî, çareseriyên ku hatine pêşniyarkirin, wekî hedefên hezarsalî yên Neteweyên Yekgirtî, tenê çareseriyên demî ne, ji ber ku ew nikarin ji pîrsgirêkên girîng ên pêşesaziyê re bibin bersiv.

Ping dibêje ku dewletên afrîkî her tim mehkûmê bêhêztîyê ne û mehkûmê wan rêvebiran in ku rolên wan bi hin "saziyên navneteweyî" re di nava nakokîyan de ne. Ew gazinan dike û dibêje ku "vegara anachronique a imperiyala antan", "çarçoveyeke teng a çend neteweyên taybet, hêzên mezin ku herdem serkeftî û qure, tim li ser moral û li ser qanûnan re, biryardêrên bi tena serê xwe dikarin daxwaza xwe bi cîhanê û bi taybetî jî bi Af-

rîka'yê bidin qebûlîkirin, bêtî ku ji bo berjewendiyên xwe, ji bo pîrsgirêkên xwe ji bo rastiyên xwe, ji bo taybetmendiyên xwe, ji bo kederên gelê xwe tu meraqekê bikin." Ew modeleka "rojavayî ya ebedî" ku bi taybetî ji aliyê Banka ya Cîhanê û Fona Diravî a Navneteweyî (IMF) ve hatiye naskirin pêşniyaz dîkin. Bi vî awayî ew dixwazin ku ew parzemîn bi çî û gêzer were îdarekirin û bikeve xizmeta aborî û çanda globalîzmê. Bi ya Ping, yekbûn û hevkarîya Afrîka'yê dikare bibe çareserîya pêşxistina parzemînê.

Reinert dide xuyan ku her du dibistanên fikrî yên aborî, kapitalîzm û marksîzm ber bi xitimandinekê ve diçin. Cureyên wekî neo-lîberalîzmê aborîyên demî afirandine, bi taybetî li derdora welatên endûstriyel ev yek

zêdetir dixuye. Tevî Ping, aborînasê norwecî tîne ziman ku, pêkhatina "Hevbîriya Washington'ê" bûye sedem ku, welatên xizan nikaribin pêşesaziya xwe biparêzin û her weha bûye sedemê ku ew welat kapasîteyên xwe yên înisîyatîfa bûdçeyê xerab bikin. Her wiha, Reinert dibêje ku, di dîrokê de hatiye dîtin ku, parazvanî û pêşxistina pêşesaziyê her tim ji aliyê dewletên dilxwaz ve pêk hatine.

Di vî rewşê de, ji bo bidestxistina derfetên tevgerê û her wiha serxwebûna afrîkî, ew rêyeke sêyemîn diyar dike. Bi taybetî ew pêşesaziyeke ber- pirsîyar û her weha ekolojîk, li ser esasê ku afirîneriya ku dikare ji aborîyê re derfetên alîkariyê pêşbixe pêşniyar dike. Tu welatekî, bê kapasîteya çêkirinê, afirîneriyê û çeşîtdariyê, nikaribûye xwe li

pêş bixe. Astengkirina welatên feqîr, ji bo ku ew vî rêyê neşopînin, dihê wateya cinayetê û kêmasiyeke mezin a wekheviyê.

"Gavavêtina" ji bo pêşveçûn û paşveçûnên Afrîka'yê, ev yek ji bo Ping wisa ye, bi taybetî di dema piştî dagirkeriyê de, nahêle ku Reinert jî bîdeng bisekine. Ev gotinên dawî yên zanyarên aborîya dînamîk in ku John Maynard Keynes û Joseph Schumpeter jî ji wan re dibin referans. Lê belê, Serokê Komisyona Yekîtiya Afrîka'yê, di şûna "hezar agirî" de wî dikaribû sebarek bi hezar ronahiyê biaxifîya "navê pirtûka wî ye." Ji ber ku agir dikarin zû bitemirin.

YVES EKOUE AMAIZO

Wergera ji fransî
Ahmet Dere

Çalakiyeke nav-parzemînî

Banke ya Afrîkî ya Pêşxistinê (BAD) ji welatên ku hilberînen wan ên navxweyî, ji bo her hemwelatîyekî, ji 1050 dolarî birut (773 euro) derbas bibe alîkar dibe. Fona Afrîkî ya Pêşxistinê (FAD), alîkariyên xwe ji bo welatên ku hilberîna wan, ji bo her hemwelatîyekî/ê, di bin 540 dolarî (397 euro) de ye rezerve dike. Di sala 2008'an de Misir, Tûnis, Fas, Afrîka ya Başûr, Uganda û Gana ew welat in ku ji Koma Banke ya Afrîkî ya Pêşxistinê herî zêde alîkarî wergirtin. Ev kom (GBAD) ji BAD'ê FAD'ê û Fona Taybet a Nîjeriya'yê çêdibe (1). Alîkariya ku van şeş welatan wergirtin bi giştî dikir du mîlyar dolar, lê belê wê salê bi tevahî 3 mîlyar dolar ji bo 53 welatên afrîkî hatibû veqetandin. Tenê Misir, Tûnis û Fas'ê ji 800 mîlyon dolarî zêdetir alîkarî wergirtibûn.

Welatên Magreb'ê û Misir'ê ji bo projeyên rê, avê û hawîrdorê û her weha yên hilberîna enerjîyê, bi taybetî yên neftê dihên piştgirîdan. Afrîka'ya Başûr ji alîkariya BAD'ê sûde werdigire ku ew bikaribe ji Standard Bank of South Africa û ya Nedbank Ltd'ê krediyê bistîne.

Magreb û Misir bingeha aboriya xwe li ser neftê, tûrîzmê û tekstîlê ava dikin. Afrîka ya Başûr jî bingeha aboriya xwe li ser dewlemendiya xwe ya zêr, platîn, elmas û ji demeke nêzîk ve jî ya neftê ava dike. Alîkariya bi armanca pêşxistina van welatan ji bo BAD'ê û piraniya rêvebirên wê balkêş e, heman rêvebir hevkarên aborî yên van welatan in. Wekî mînak, Fransa welatê yekem ê biyanî ye ku li Fas û Misir'ê kar dike.

Uganda û Gana alîkariya FAD'ê distînin. Alîkariya ku Uganda ji heman saziyê werdigire, ji ber projeyên wê yên sebarêt bi hilberîn û belavkirina enerjîyê û her weha yên ji bo nûkirina dezgehên cotkariyê û yên perwerdehiyê ne. Gana jî ji ber bernameya kêmkirina xizaniyê ji FAD'ê alîkariyê werdigire. Ev her du welat, ji bo welatên afrîkî yên herêmên rojava malên wekî neft, paxir, kobalt, qehwe, ji bo welatên rojhilat afrîkî jî yên rojhilat jî zêr, elmas, boksît, alûmînyûm û kakao hildiberînin. Di sala 2008'an tu welatekî Afrîka ya Navîn, ne jî tu firmayeke wan, ji heman saziyê alîkariya aborî wernegirtin. Ev rewş bi nebûna

seqemgîriyê dikare were şîrovekirin.

Welatên bakurê Afrîka'yê û welatên xwedî dewlemendiya binerdî ya wekî neftê ne, bi dolarên BAD'ê û yên FAD'ê hatine avdan û her weha ew, di dîroka xwe de, ji bo Koma BAD'ê her tim bûne xwedî ciheke taybet. Ji çil salan vir ve, ji % 30 alîkarî ji bo Magreb'ê û Misir'ê hatiye veqetandin. Di serî de Fas dihê, pişt re jî Tûnis, Misir, û Cezayîr dihên. Ji sala 1967'an û vir ve Afrîka ya Rojava ji % 22'yê alîkariyê werdigire. Nîjerya, Gana, Beravên Ivoire û Malî, ji ber dewlemendiyên xwe yên neft, zêr, elmas, boksît, qehwe û ên kakao, li vê herêma jêrîn bûn

welatên sereke.

Bi rêya rapora xwe ya sala 2008'an, GBAD diyar dike ku ew ê hewlê bide ku xizaniya ku li 53 welatan heye kêmtir bike û her weha ew ê tev li xebatên ji bo pêşxistina wan, a di warê aborî û civakî de, bibe. Ji bo ew bigihîje vê armancê, heman Koma BAD'ê giraniyê dide ser welatên pêşketî yên perzemîna Afrîka'yê û her weha ser welatên ku bikaribin zêdetir finansorên biyanî bikişînin.

Di nava konseya rêvebir a BAD'ê de, mafê dengan bi ya hebûna welatan û ya aboriyê ku di nava BAD'ê de heye, hatiye parvekirin. Dê were zanîn ku welatên afrîkî (ên ku wekî endamên

herêmî hatine naskirin (PMR)) xwediyê ji % 60.31 dengan in, welatên din jî tenê xwediyê ji % 39.69 dengan in. Ji aliyê din de, her welat bi ya giraniya xwe di nava komên binî de jî cih digirin. Dîsa, di sala 2008'an de, Afrîka ya Başûr, ku xwediyê cihê pêncemîn e di nava rêvebiriya BAD'ê de (di nava konseya rêvebir a BAD'ê de xwediyê 99 890 dengan e) di koma 2'emîn de, yên herî bibandor de, cih digire. Her weha, Misir rêvebirê çaremîn e, (xwediyê 112 454 dengan e) di nava koma 10'emîn di nava rêvebiriya BAD'ê de Nîjerya xwediyê cihê herî bibandor e, (xwediyê ka pasîteyê 193.802 dengan e, di nava koma

1'emîn de cih digire), piştî wê Dewletên-Yekgirtî (xwediyê kapasîteyê 140.749 dengan e, û di koma 8'emîn de cih digire) û Japonya (xwediyê 120.025 dengan e û di koma 4'emîn de cih digire) dihên. Almanya, Cezayîr, Lîbya, Fransa, Kanada û Côte d'Ivoire di rêza şeşan heta ya dehan de cih digirin.

ANNE FRINTZ

Wergera ji fransî
Ahmet Dere

(1) Rapora salane ya 2008'an a Banke ya Afrîkî ya ji bo Pêşxistinê. Tunis, 2009, <http://www.afdb.org>



Foto: Adem Sönmez

Lêgerîna pisporiyeke tendurûstiyê

“Afrîka bi diwariyên girîng ên sebare bi tendurûstiyê rû bi rû ye, ev rewş li ser pêşxistina aborî, civakî û her weha li ser hewldanên ji bo çareserkirina xizaniyê jî xwedî bandoreke mezin e. Ji derveyî asta bilind a nexweşiyên wekî HIV/Aids, ên enfeksiyonê, tuberkûloz û yên din ku ji laşan derbasî laşan dibin, tevlihevbûna mirovan û hatin û çûn bûne sedema belavbûna nexweşiyên din jî û her weha asta qeza û travma jî zêdetir bûye.”

Deh salan piştî damezirandina wê, di sala 1975'an de ku Banke ya Afrîkî ya Pêşxistinê (BAD) dest bi hewldanên xwe yên sebare bi tendurûstiyê kir. Ji heman demê bi şûn de wê saziyê xwe aktîf nîşan kir. Di navbera salên 1975 û 2005'an de dora heftê proje ji aliyê heman saziyê ve, li çil û şeş welatên afrîkî hatin finansekirin. Di Sibata 2010'an de çil û yek proje, li bîst û heşt welatan, ku di nava wan de Fas jî hebû, dimeşyan, ji % 12 yê wan di nava pêvajoyeke xebata aktîf de ye.

BAD di nava lêgerîna ji bo pêşxistina pisporî û bandora çalakiyên xwe yên di wê sektorê de ye ku ew tê de kar dike. Di rapora xwe ya 2006'an de, ku sebare bi pêşxistinê hatibû nivîsandin, ew balê dikişîne ser girîngiya reqabeta li parzemîna û weha dibêje: “Afrîka bi diwariyên girîng ên sebare bi tendurûstiyê rû bi rû ye, ev rewş li ser pêşxistina aborî, civakî û her weha li ser hewldanên ji bo çareserkirina xizaniyê jî xwedî bandoreke mezin e. Ji derveyî asta bilind a nexweşiyên wekî HIV/Aids, ên enfeksiyonê, tuberkûloz û yên din ku ji laşan derbasî laşan dibin, tevlihevbûna mirovan û hatin û çûn bûne sedema belavbûna nexweşiyên din jî û her weha asta qeza û travma jî zêdetir bûye. Vê pirsgrêkê bi xwe re buhayê sîstema tendurûstiyê jî, li gelek welatên Afrîka'yê xerabtir kiriye. Koçberbûna pisporên tendurûstiyê ya ber bi bajaran û welatên din, dîsa ya ber bi parzemînan din, her weha qelsiya binesaziya welatan, nemaze jî kêmbûna ava vexwarinê, rewşa xerab a sîstema rêyan û ragihandinê û dîsa kêmasiya paqî-

jiya saziyên tendurûstiyê jî heman rewşê xerabtir kiriye.”

Di navbera salên 1987 û 2005'an de, koma BAD (BAD, Fona Afrîkî ya Pêşxistinê (FAD) û Fona Taybet a Nijeriya'yê (FSN) nêzîkî 990,72 milyon yekîneyên hesaban bi deyn dane ku binesaziya ji bo tendurûstiyê amade bibe, an ku ji % 3.4 xebatên wan ku di vê demê de çêbûye. Di navbera salên 1996-2005'an de ev ast digihîje ji % 4.1 puanan. Asta hewldanên di vê qadê de hatine kirin du caran ji yên perwerdehiyê, deh caran jî ji yên xebatên bingeha welat, pênc caran jî ji yên cotkariyê û kişandinê kêmtir e. Hewldanên aborî yên ji bo karê tendurûstiyê sê rewşan nas kirine:

1) 1987-1992: Bilindbûna ji rêjeya % 18'yê.

2) 1992-1995: Nizmbûna konjonktûrel, a ji ber pirsgrêkên birêvebirina navxweyî yên FAD'ê.

3) Rewşeke din jî ya bilindbûna perexistinê ya ji % 101.3 yekîneyên hesaban tenê di sala 2004'an de.

Bi her awayî, di salên dawî de pêşketineke baş di kalîteya perexistinê di qada tendurûstiyê de çêbû. Ev jî bû sedema ku heman perexistinê di qada destgehên bingeş û di qada nixên civakî de kêmtir bibin. Bi ya birêz Tshinko B. Ilunga, mudurê beşa tendurûstiyê ya BAD'ê, bi taybetî perwerdehiya personelên tendurûstiyê bûye sektoreke girîng ku divê banke li ser rawestin. “Çi sebare bi pêşxistina personelên nexweşxaneyan, çî jî sebare bi dibistanên ku bijîşkan û perestaran perwerde dikin, BAD fêm kiriye ku divê ew li ser perexistinê heman sektorê baştir raweste û kapasîteyên sîstemên herêmi-

yên tendurûstiyê raweste” Ev siyaseta nû, ku wê di sala 2010'an de fermî bibe, valahiya stratejiya ku ji salan vir ve didome tije dike.

Her du planên ku di navbera salên 1996 û 1999'an de hatine nîqaşkirin, çî sebare bi nexweşiyên taybet be, çî jî sebare bi astengiyên destgehî ku bi sîstema tendurûstiyê ve girêdayî be, bûne xalên sereke yên rexneyan. Ev her du dokûmanên wekî kîlîtî mudaxaleya BAD'ê, ku ji aliyê kêmasiya derfetên aborî ku ji aliyê “civaka navneteweyî” ve û hukûmetên afrîkî ve hatine finansekirin, diyar dike. Ev her du dokûman girîngiya heman sektorê jî derdixin pêş ku divê ew ji pirsgrêkên destgehên bingeş û saziyan zêdetir werin dîtin (wisa di hê guman kirin ku ji % 80 perexistinê wê, yên di qadên cur bi cur de hatine kirin, di vî warî de çêbûne). Ev di hê wateya ku tendurûstî rewşeke pir taybet diyar dike ku divê bang li qadên pişeyî û pisporiyên din ku di nava BAD'ê de ne were kirin.

Dê siyasetên wê werin ziravkirin ku ji pirsgrêkên heyî yên parzemîna re çareserî were dîtin. Di sala 1998'an de, ji bo personelên BAD'ê fermanekê hatibû nivîsandin ku ew baştir bingeşa pirsgrêkan fêm bikin û siyaseta wê ya tendurûstiyê di jiyanê de pêk bînin – bi awayekî pratîk. Ev belge her weha pêvajoya gotûbêjan, a ku di hê xwestin, di navbera bankeyê û welatên daxwazkar de wê bimeşe jî diyar dike. Ji bo perexistinê ew her sê rewşên pêwîst jî weha nîşan dike: siyaseta tendurûstiyê ya girseyî, durûstkirina sîstemên tendurûstiyê û afirandina hawîrdoreke tendurûst û paqij.

Digel ku ev ferman hin xalên

balkêş ên programatîk jî bi xwe re diyar dike, ew tu car di nava BAD'ê de nehatiye belavkirin. Hin fermanên din, ên taybet û sebare bi nexweşiyên wekî HIV/Aids, di sala 2001'an de, sebare bi tayê di sala 2002'an de, sebare bi nexweşiyên ku ji mirov derbasî mirovan dibin di sala 2004'an de hatine nivîsandin û belav bûne. Heman belge her weha ji bo çareserkirina nexweşiyên û ya pirsgrêkên destgehên bingeş û dîsa sebare bi çareseriyên klasîk jî wekî referans e. Lê belê di hemû belgeyên wê de agahiyên zelal ên sebare bi mudaxaleyên tendurûstiya ku li ser civakê de bibandor e kêmasî hene.

Wekî ku birêz Ilunga dibêje “BAD ji daxwazan re dibe bersiv lê belê ew bijartina rêbazên çareseriyê, bi ya daxwazên wan, ji welatan re di hêle.” Bêguman ev nêzîkbûn bi ya wateya berpirsiyartiya rêvebiriyên afrîkî xwe nîşan dike. Di vê navberê de tu tişt nabe asteng ku, bi awayekî ciddî, em diyar bikin ku projeyên ji aliyê BAD'ê ve di hê finansekirin li ser tendurûstiya civakê de bibandor in. Di rastiyê de, ji bo zelalkirina pêdiviya sererastkirina konseptê xwe û rêbazên rêvebiriya xwe, bankeyê dest bi pêşketinekê kiriye. Bi rêya rapora xwe ya 30'ê Cotmeha 2006'an banke pêwîstiya bi pêşxistina pisporiyekê dide xuyan. Heman pisporî sebare bi analîzkirina rewşa tendurûstiya gel, sebare bi kapasîteyên sîstema tendurûstiyê û her weha sebare bi pêşxistina buhayan be.

Rêvebiriya van projeyan, ku bi awayekî asayî ji aliyê koordinatoran ve hatiye garantîkirin, bi kêmasiyên personel ve rû bi rû ye. Digel BAD'ê şefek li sê û çar projeyan dinihêre, lê belê,

mînak, digel banke ya ji bo pêşxistinê ya asayî pir pispor li ser yek projeyê dixebitin. Vê kêmasiyê bi xwe re pirsgrêkeke reel a stratejîk derxistiye holê. “Matmayî nîn e, di şûna ku proje bi ya analîzeke rast a sebare bi pêdiviyên girseyê were hiştin, ew li hêviya daxwazên hukûmetan hatiye hiştin”, ev nihêrîna Dr Marc Mitchell e, ew ji zanîngeha Harvard'ê ye û sebare bi pêşxistina BAD'ê berpirsiyar e.

Xebateke din ku ji bo bankeyê girîng e: Tevkariya di navbera beşdarên fonê ye. Parçeyekê kêmasiya wan a tevlebûnê ji aliyê mekanîzmaya saziyê ve di hê îzahkirin. Mînak, prosedûra rêvebiriya BAD'ê jê re destûrê nade ku ew tev li hin civînan ku ji aliyê beşdarên fonê ve di hê rêxistin. Her weha ew raberî hin astengiyên ku jê re nahêlin ew tev li parvekirina hin paketên global ên pere jî bibe. Di rewşên weha de, wezaretên tendurûstiyê dikare bi ya pêdiviyên xwe tev bigere, ne bi ya pêwîstiyên beşdarên fonê.

Bêguman BAD dikare roleke sereke bileyze ku hukûmetên afrîkî bikaribin bi wê re hin projeyên saxlem bigirin dest. Siyasetê wê ya nû ya tendurûstiyê, ku li ber xelasiyê ye, ji diyarkirina stratejiya wê re û her weha ji hevkarîya wê ya bi rêxistinên civakî re bihêvî ye, qada çalakiyên wê ku heya niha meşiyane jî di nav de.

KARL BLANCHET*

* Lêkolîvanê sebare bi sîstema tendurûstiyê de li London School of Hygiene and Tropical Medicine, Londra

Wergera ji fransî
Ahmet Dere

SENEGAL

Serxwebûn û krîza polîtîk



Foto: Adem Sönmez

“**B**ilindbûna Karim Wade ku kes nikare pêşî lê bigire”, “Karim Wade wê heta kê derê bilind be?”, “Heger Karim dixwaze bibe serok divê zimanê wolof zanibe...” Ev manşetên rojnameyên afrîkî ne ku piştigiriyê didin kurê serokê Senegalê Abdoulaye Wade. Ew îro şewirmendê taybet ê bavê xwe ye. Berî niha wî ji Rêxistina Konferansa Îslamî beşa Senegalê (Anoci) re serokatî dikir. Yanzdemîn civîna bilind a vê rêxistinê di Adara 2008’an de li paytext Dakarê pêk hatibû. Di 1’ê Gulana 2009’an de jî ‘Karim’ wekî wezîrê tekiliyên navneteweyî yê binesaziya welêt û yê rêyên hewayî hat hilbijartin. Li welêt baweriyê wisa heye ku serok dewlet plan kiriye kurê xwe bîne ser textê serokatîyê.

Ev yek jî berdehamiya feno-

menên din e ku dibe sedema kirîzeke ciddî ya demokrasiya li Senegalê. Ji ber ku heta niha demokrasiya vî welatî ji bo tevahiya parzemîna Afrîkayê referanseke baş bû. Piştî pêvajoya taybetî ya bi yek partiyeke polîtîk – ji serxwebûnê (1960) heta sala 1974’an –, serok Léopold Sédar Senghor sistema firepartî derxist pêş, lê herî zêde heta çar partiyên xwedî îdeolojiyên cuda dikaribûn xwe bi rêk û pêk bikin: bawerîya sosyalîst ku bi xwe temsîla wê dikir, bawerîya liberal ku di bin navê partiya demokratîk a Senegalê (PDS) de li hev civiya û serokê wê yê niha Wade ye. Ew piştî ku ji ‘sosyalîzma karker’ veqetiya, di bin navê ‘liberalîzma demokratîk’ de ala partiya xwe bilind kir. Her du baweriyên din jî, yek: partiya serxwebûna Afrîkayê (PAI) ye ku doza komunîzmê dike, ya din jî bawerîya muhafa-

zakar e ku di tevgera komarger a Senegalê (MRS) de li hev civiyaye.

Di nava dewletên Afrîkî de ku piraniya wan bi rêjîmên otorîter dihên birêvebirin, her çend hin kêmasiyên sistema polîtîk a Senegalê hebin jî, xwedî taybetmendiyê erênî ye. Wekî mînak serokê Tevgera Neteweyî ya Demokratîk (RND) profesor Cheikh Anta Diop – ku di cihanê de bi çalakîyên xwe yê pan-afrîkanîst dihê nasîn – gotibû heta ku destûr neyê dayîn ku muxalîfên dijwar ên rejîmê, ji illegalîteyê derbasî legalîteyê bibin, ewê bi xwe nebe endamê tu partiyeke polîtîk. Di Berfanbara 1980’ê de serok Léopold Sédar Senghor dest ji kar kişand û di şûna xwe de serokwezîr Abdou Diouf tayîn kir. Bi ya destûra bingeîn jî, dema textê serok dewletiyê vala be, wê serokwezîr şûna wî dagire. Serokê yekem ê Sene-

gal’a serbixwe ji vê jesta xwe ya destjîrkarişandinê re du sedem rêz kirin: “ewê heta dawîya jiyana xwe di muxalefetê de bimîne” û sedema duyemîn jî ew e ku: “di 74 saliya xwe de divê mirov vî textî serbest bihêle da ku nîfşa nû bikaribe ala rêvebiriyê dewr bigire...”

Ji aliyê din ve, bi ya xwendevanên zanîngehê yê senegalî Momar-Coumba Diop û Mamadou Diouf, du tirs û fikarên din ên serok Senghor hene: “Sistem û polîtîkaya nû ya aborî ji aliyê îdeolojîk ve ketibû nava nakokîyan, wî ji aliyê wijdanî ve nikaribû ev yek bihemanda” tirs a wî ya din jî “sistbûna civakî û polîtîk bû”. Ya rastî, di wê serdemê de, Senegal bi armanca ku pirs-girêkên xwe yê ku di encama tevliheviyên civakî de derketibûn holê çareser bike, bi Fona Diravî ya Navneteweyî (IMF) re plana sererastkirineke bingeîn

îmze kir.

Serokê berê yê konseyê Mamadou Dia ku di sala 1962’an de, bi tawana xiyaneta bilind, ji aliyê serok Senghor ve, bi diwarî ji peywira xwe hatibû girtin, di wê baweriyê de bû ku serokdewlet bi helwesta xwe ya daketina ji ser text nejidil e û gel manipule dike: Dia dibêje: “Serok wekî hukûmdarekî, çawa dikare di şûna xwe de kesekî tayîn bike. Tu ciwanmêrekî polîtîk ku heta niha Senegal bi rê ve biriye bi qasî Senghor mafê serdestiya gel bin pê nekirine. Ew xwe wekî xwediyê reformên destûra bingeîn dibîne. Qaşo sistema welêt dikare, bêtir ku serî li fikrên wî bide, xwe bi ya vê destûrê bi rê ve bibe. Ev kesê bêtir hîna nikare di hilbijartinan de li ser navê xwe piraniya dangan bi dest bixe. Bi ser de jî ev hilbijartin di bin kontrola partiya wî de hatin birêvebirin.

Ev ciwanmêr bi kîjan wijdanî karibû di nava vê bêbaweriyê de welêt bi rê ve bibe û di kîjan şertan de û bi kîjan rûyî, diwêrî xelefê xwe li ser gelê Senegal'ê ferz bike?"

Muxalîf Wade ku wê demê piştgirî dida vê nihêrînê û hêrsa Dia, di wê baweriyê de bû ku sîstema rêvebirîya welêt ne şeffaf e û weha nivîsandibû: "Ger pirsgerî rêka îstîfaya serokatîyê çareser nebe, her kes dikare bi her awayî desthilatdariyê bi dest bixe û li ser bimîne." M. Wade û hevalên wî xelefê tayînkirî M. Diouf ji çav derxistin, wan kiribû serê xwe ku di hilbijartinên pêş de ewê werin ser text. Ev yek di çavên wan de parantezeke polîtîk bû ku bi qasî bîst salan dajot (dawîya 1980- destpêka 2000î). M. Diouf wekî ku hevî dikir hat hilbijartin, dû re careke din, careke din, gelek caran li ser hev hat hilbijartin, Partiya wî ya sosyalîst (PS), di hilbijartinên 1983, 1988, 1993 û 1998 an de di rêza yekem de bû.

Di dawiyê de, hem ji ber xebat û hewldanên muxalefetê û hem ji ber daxwaza dilsoz a desthilatdariyê, rêvebirîya Senegal'ê zagona xwe ya sîstema firepartî berfirehtir kir û ji parzemîna Afrîka'yê re careke din serkêşî kir. – di sala 1982'an de qanûna teng ku tenê destûr dida çar partiyan, hat guhertin û berfirehtir kirin. Lewma îro li Senegal'ê sî û heşt partî li meydana siyasê de di reqabetê de ne. Ji salên 1992 heta 2000 an carnar hukûmetên koalîsyonê, carnar, hukûmetên bîdor (rêvebiriyê li hev dor dikan) avabûn.

Modela demokrasiya Senegal'ê li ser çar stûnên bingeîn hatibû avakirin: yek saziyên dewletê xwe bi ya polîtîkaya nû bi rêk û pêk kirin, ya duyem di koalîsyonan de bi tolerans û nermayî hukûm dikirin, ya sêyem, reqabet û pêşpîrka hilbijartinan di nava aştîyê de derbas dibû, ya çaran jî rêzgirtina ji bo fire-dengî û fire-partî bû. – saziyên dewletê yên weşan û medyayê cudagerî nedixist nava partiyan, ji bo hemûyan heman nêzikayî nîşan dida û heman dem ji wan re vediqetand –, Di pêşketina man-

tiqa demokrasiyê û aramiya di dema hilbijartinan de, helbet divê rola radyoyên taybetî û ya saziyên gel ên sîvîl jî neyê jibîrkirin, ji ber ku wan karibû sextekariyan yan jî hin xetayên piçûk di deqqê de bigîhandana gel... Di Sibata û Adara 2000'î de di pêvajoya hilbijartinan de, çapemenî bi awayekî vekirî roleke dijber leyîst û her tişt bi detayan digihand gel. Di encamê de Partiyên PS a M. Diouf û partiya PDS a M. Wade bi awayekî aştîyane li hev kirin ku ewê hukûmeteke bîdor ava bikin û desthilatdariyê li hev dor bikin.

Lê serdemake tijî nakokî dest pê kir, hukûmet çawa ku dest guherand, her tişt ber bi xerabiyê ve çû. Programa hukûmetê ku temamî ji soz û propaganda-yên dema hilbijartinan pêk dihat, wekî nameyê mirî li ser maseyê ma. – hin ji wan sozan ew bûn ku rejîma parlementerî were zexmkirin, serxwebûn û bêalîbûna dadgeriyê were misogerkirin, alikariya civakî ya lezgîn were birêkûpêkkirin, kêmasiyên bingeîn ên di van bîst salên dawîn de ji holê werin rakirin-. Wekî hembisêyê xwe yê fransî Nicolas Sarkozy, serokê nû yê Senegal'ê alikariyên civakî bi ya politikayên liberal da meşandin, arzikirina saziyên dewletê di çarçoveya daxwazên Fona Diravî ya Navneteweyî (IMF) de da berdwamkirin.

Otorîterîzma şefê nû yê dewletê pir zû xwe da der. Di 7'ê Rêbendana 2001'an de, di encama referandûmê de, destûreke nû ya bingeîn hat saz kirin. Bi ya vê yekê pêvajoya dema serokatîyê ji heft salan daket pênc salan, lê hukûm û erkên serok dewletiyê ew qas hatin zêdekirin ku ew ger pêwîst bibîne dikare Meclîsa Gel a Neteweyî fesih bike. Çerxa ku ketibû ser xetê çewt gera xwe berdwam dikir: meclîs serxwebûna xwe wenda kir bi hin hêzan ve hat girêdan, dadgerî û edalet ketin bin hukmê hin derdoran, dewlemendî û pîsporiya neteweyî di rêya berjewendiyên saziyên aborî yê Navneteweyî de hat xerc kirin û hwd...

Dîsa mîna keke din heye ku nîşan dide ev desthilatdarî ji rê

derketiye. Ew jî di hilbijartinan de bilindkirina buhayê namzetîyê ye. Kesek ku di hilbijartinan de xwe wekî berendam nîşan bide, bi hinceta ku pêşî li "berendametiye xeyalperest" were girtin, jê pereyek mezin dihe xwestin: Di hilbijartinên serokatîyê yên sala 2000'î de, buhayê berendametiye 6 milyon frank CFA (9.000 euro) bû, di sala 2007'an de ev derket 25 milyon frankî (38.000 euro); Di hilbijartinên parlamentoyê yên sala 2001'î de buhayê berendametiye 2 milyon frank (3.000 euro) bû, di sala 2007'an de ev derket 15 milyon frankî CFA (23.000 euro). Mamosteyekî dibistanê ji bo ku karibe ew qas pere ber hev bike divê herî kême mehmizên xwe yên sê salan ji çav derxe. Ji ber van sedeman hin derdor daxwazên xwe yên ji bo hilbijartinên pêşwest anîn ziman û bi bîr xistin ku di gel sozên serok Wade, çîna navîn a şêniya bajaran ber bi xizaniyê ve diçe û şêniya li gundan jî bi kirîzeke ciddî ya aborî re rû bi rû maye.

Li esmanên muxalefetê birûsk vedan. Di nava van şertan de muxalefet ji serkeftina xwe pir bibawer bû. Di hilbijartinên 25'ê Sibata 2007'an de M. Wade li hemberî panzdeh namzetan, hem jî di tûra yekem de careke din hat hilbijartin. Ji Sibata 2000'î heta sibata 2007'an pir tişt guherî bûn, di binê piran re pir av herikîbûn: Serok dewlet di komîsyonên rêvebirina hilbijartinan de, di rêvebirîya saziyên weşanê de û her weha di sîstema listeya hilbijêran de bi ya xwe hin guherîn dabûn çekirin. Bi hinceta ku di hilbijartinên serokatîyê de hîlekarî çêbûye, muxalefet hilbijartinên parlamentoyê yên meha Pûşberê bojkot kirin. Rêjeya tevîbûna dengdêran, bi ya muxalefetê ji % 25 bû, bi ya fermî ji % 30 bû. Lê belê di hilbijartinên serokatîyê yên bê bojkot de beşdarbûn ji % 71 bû.

Di hilbijartinên herêmî yên 22'ê Adara 2009'an, paytext Dakar dikeve destê koalîsyona muxalefetê ya bi navê Bennoo Siggil Sénégal (Hewgirtina ji bo Pêşxistina Senegal'ê). Ev encam

ji bo M. Karim Wade ku xwe li paytextê wekî namzetê raqîb nîşandabû, bû wekî şirmaqek bi hijdîn. Êdî dem hatibû ku bavê wî yê serok, kurê xwe Kerîm wekî wezîrê dewletê peywirdar bike. Dû re, M. Abdoulaye Wade bi meclîsê dide qebûl kirin ku divê di kabîneya hukûmetê de mîsyoneke taybetî ya alikariya serokdewlet were avakirin. Ev Alîkarê taybetî, rojek dema textê serokatîyê vala be, ewê karibe şûna wî dagire. Gelek derdor ev mîsyona nû wekî tiştê nedîtî û ecêb bi nav kirin, hinekan îddia kir ku ev projeyeke taybetî ye, serokdewlet ji bo kurê xwe bixe dewsa xwe, ev yek bi zanebûn amade kiriye.

Muxalefeta ku di hilbijartinên 2007'an de têk çû, lê di hilbijartinên herêmî yên 2009'an de li paytext Dakar'ê serkevîneke berbiçav nîşan da, îro xwe ji bo hilbijartinên serokatîyê yên sala 2012'an amade dike. Di Pûşbera 2009'an de, muxalefet "ji bo rêvebirîyeke demokratîk a Senegal'ê" di destûra bingeîn de pêşniyazqanûnên nû pêşkeşî parlamentoyê kir. Taybetmendîya vê pêşniyazqanûnê ku encama xebata salekê ye, ew e ku "sîstema serokatîya neokolonyal" (serokatîya nîvgrêdayî ya hêza dagirker) ji nîqaşê re veke û jê re meydin bixwîne.

Wezîrê berê yê serok Senghor, M. Abdoulaye Ly (91 salî), "rejîma taybetî" ji aliyê aborî û polîtîk ve wekî tevliheviya erkan dinirxîne û di wê baweriyê de ye ku kareketerê dagirkeriya Fransa û ya saziyên navneteweyî yên aborî her yek bi ya xwe, li ser sîstema aborî û polîtîk a Senegal'ê erkên xwe ferz dikin.

Partiya PDS – ku li ser daxwaza serokê xwe navê xwe kir Partiya Demokratîk a Senegal'a Azad (PDSL) îro projeyên xanedanî yên ji bo berjewendiyên malbata serok amade dikin. Malbata serokdewlet tev li pir tiştan bûye. Liberalîzma ku ji aliyê M. Wade ve dihat parastin ketiye xizmeta malbata wî "libotisme." Ev torpîl û parastina berjewendiyên malbatê ji bo Senegal'ê tiştêk nû ye. Ev karake-

terê xerab hem di saziyên dewletê de cih girtiye û hem jî di xebatên çandî de derdikeve holê. Wekî mînak di nava vê tengasiya aborî de, di gel ew qas lidijderketin û gotûbêjan peykerê "ronesansa Afrîka'yê" hat çekirin û li wî 27 milyar frank CFA çû.

Di salên 1990'î de li Afrîka'yê pêlên Konferansên Neteweyî dest pê kirin, di van civînan de bawerîya çep hêdî hêdî dihat dîrxistin û projeyên wan li ber çav nedihatîn girtin. Lê bawerîya neolîberalîzm wekî rêber dihat tercîhkirin. Ev sîstema desthilatdariya bi dewr û bi dor jî, yek ji encamên van konferansan e ku ji "çanda deal" (çanda bazarê) dihe. Ew jî ji aliyê saziyên aborî yê navneteweyî ve bi armanca ku di desthilatdariyê de bazarî çêbibe hatiye pêşkêşkirin. Di encama vê kulturê de veguherîn û mutasyon pêk hatin: partiyeke polîtîk her yek ji wan pazezanên derdoran teng bûn. Sendîka bûn navgînên seker ên destê siyasatmederan. Tevgerên entelektuel bûn tevlihevî û qelebalixiya mirovên ku tu tîkiliya wan bi rastîyê tune. Çapemenî bû firokeya bê plana firînê û bê îstiqamet. Hêza desthilatdar bû navgîna xapandin û manipulasyona meclîs û dadgeriyê. Bazara emlaq û avahiyan û xizmeta di vê sektorê de bû sandokeke quflandî ku ne guncan e hevvelatî jê sîdê werbigirin.

Di encama vê çand û siyaseta dîrî rastîyê de civakek derket holê ku ji bo paşeroja xwe tu amadekarî nake. Li herêm û taxên derdora bajarê mezin ê Dakar'ê mirov xwe bi cih û war dikan, xwe derman dikan, dixwînin, hîn dibin, dixwin, vedixwin, li xwe dikan, rêwîti dikan, bi kîjan derfetan? Bi bêderfetiye.

ABDOUL AZIZ DIOP*

* Zanyarê siyasê, nivîskarê pirtûka bi navê *Une succession en démocratie: Les Sénégalais face à l'inattendu*, (mîrata ku ji demokrasiyê maye: Senegalî di tariyê de ne) weşanên L'Harmattan, coll. "Pensée africaine", Paris, 2009.

Wergera ji fransî
Bedran Dere

Aboriyeke di nav bafîzokê de

Ji bo hemû Senegaliyan şokek bû: Roja 24'ê Berfanbara 2008'an hêza berê ya dagirker Fransa bi awayekî lezgîn 83 milyon euro alîkarî dide, bi armanca ku Rêvebirîya Dakar'ê bikaribe qet nebe mehmizên karmendên xwe bide. Di nava heman mehê de Fona Diravî ya Navneteweyî (IMF) di çarço-

veya alikariya ji bo dewletan de ku ketine bin bandora krîza aborî, bi qasî 75, 6 milyon dolar (56 milyon euro) piştgiriye dide Senegal'ê. Di Adara sala 2000'î de dema ku partiya Demokratîk a Senegal'ê (PDS) di bin serokatîya M. Abdoulaye Wade de hatibû ser hukûmetê, hêviyên gel ew qas bilind bûn ku ev partî

wekî 'partiya alikariya sosyal' bi nav dikirin. Piştî neh salan duruşmeya serokatîyê "sopi" (di zimanê heremî wolof de dihe wateya guherînê) wergeriya "sapi" (tirş û tehl).

Li Senegal'ê hilberîna brut a navxweyî serê kesekî dihe 613 euroyî. Ew di nava welatên xwedî pêşketina herî kême dihe.

Rêjeya mezinbûna wê di sala 2008'an de ji % 4,3 û di sala 2009'an de ji % 5,7 bû. Sektora ku herî zêde pereyê biyanî tîne vî welatî masîgîrî ye. Di vê beşê de direkt û endîrekt bi qasî şeş sed hezar kes kar dikan. Lê belê di navbera salên 2000 û 2008'an de hêza vî sektorê ya di eksportê de her ku çû daket. Rêjeya firotina

ber bi derve ve, di nava salan de ji % 37 daket heta ji % 24'an. Di van salên dawîn de, welatên Yekîtiya Ewropa û Japonya'yê sektora masîgîriyê û hilberina çavkaniyên deryayê ji pêdiviya xwe bêhtir bi pêş xistin. Vê yekê jî bazara li Senegal'ê xist tengasiyê.

Piştî masîgîriyê, sektora duymîn ku herî zêde pereyê biyanî

tîne vî welatî tûrîzm e. Rêwî û tûrîstên fransî herî zêde diçûn sere-dana herêma dîrokî û xwezayî Casamance'yê, lê belê ev demek e ji bo vê heremê qala kêmbûna ewlekariyê dihê kirin. Ne tenê ev pîrsgirêk, her weha di navbera welatên Magrebî û yên Okyanûsa Hîndî de reqabetekê jî dest pê kirîye. Rêwitiya hewayî ya ber bi Dakar'ê ve gelek buha bûye (ji ber ku saziya fermî ya rêyên hewayî yên Senegal'ê Air Sénégal International hema hema ji holê wenda bûye). Sedemeke din jî ew e ku buhayê euro li hemberî dolar bilind bûye.

Projeya mezin a ji bo dewlemendkirina kiştûkal û zad (Goana) ku di sala 2008'an de hat destpêkirin, û ji aliyê medya û çapemeniyê ve heta dawî hat piştgirîdan, nikaribû ewlekariya zad û xwerekana misoger bike. Konfederasyona Neteweyî ya ji bo Pêşxistina Herêmên Derveyî Bajaran (CNCR) awayê rêvebirina politikayên hukûmetê rexne dike. Bi ya plana hukûmetê (Reva, 2006-2015) diviyabû xebata rençberî û bikaranîna kiştûkal bihata teşwîqkirin da ku koçberiya ji herêmên çiyayî ya ber bi bajaran bihata rawestandî. Armanc ew bû ku bi taybetî jî rê li ber koçberiya ciwanan bihata girtin. Alîkariya ji bo teşwîqê – 31,1 milyar frank CFA (55 milyon euro) – di viyabû di destpêkê de bi awayekî

lezgîn ji bo hilberîna berhemên eksportê bihata bikaranîn. Ji ber ku ewlekariya zad û xwerekana ku ji krîza aborî zirareke mezin dîtiye, girêdayî pêşxistina berhemên eksportê ye. Ji berpirsên Konfederasyona Neteweyî ya ji bo Pêşxistina Herêmên Derveyî Bajaran (CNCR) Mamadou Cissokho, dibêje: “Diviyabû me tev bi hev re projeyeke civakî ku gel jî digire nava xwe, teşwîq bikirana (...) Pir girîng e ku em bi malbatan bidin fêmkirin ku divê ew her tim mal û hilberînên herêmî û neteweyî bi kar bînin da ku bi hezaran kesên ku îro di şirketên mezin û piçûk de kar dikin ji karê xwe nebin.” M. Cissokho bi taybetî jî qala girîngiya cotkarî û rençberiya malbatî dike.

Hukûmeta Senegal'ê hewlê dide Şirketa neteweyî ya ku berhemên xwedî çavkaniya rûn (Sonacoss) dixê bazara cihanê, bifiroşe û arzî bike. Ev hewldana ku xebatên wê hê berdeham dikin, dikare aboriya gundî û ya şênîyên derveyî bajaran xerabtir bike. Ji ber ku şirketê Sonacoss'ê aktorê sereke yê vê sektorê ye. Peywira wê ew e ku ji gundiyan fistiq bikire, di palûkeyê de dendikên wan derxe û rûnê wê bixê bazara cihanê. Bi ya Konfederasyona Neteweyî ya ji bo Pêşxistina Herêmên Derveyî Bajaran (CNCR), “Şirketa Sonacoss”ê tenê di çarçoveya palûkeyan de na-

mîne, ew her weha perçeyeke girîng a sektora xwe ye ku di salê de dikare ji 70 milyar firankî [106 milyon euro] zêdetir pere bîne. Ev hatina aborî jî, ji bo malbatên derveyî bajaran, ji bo şirketên transportê, ji bo şirketên navgîn û her weha ji bo banke yan û her wekî din sûdên mezin tîne. Ji aliyê din ve, arzîkirina Cassa Neteweyî ya ji bo krediya kiştûkalê, betalkirina bingeheên alikariyê, û her weha kêmkirina alîkariya ji bo gundî û cotkaran wekî Sonagraînes, cîhana derveyî bajaran dixê nava tirs û fikaran. Ji xwe ev şênîya ku li gundên derdora bajaran dijîn di nava şertên pir dijwar de kar dikin. Rêjeya xizaniyê danekekiye ji ber ku ji % 60'ê şênîya Senegal'ê gundî ne, li derveyî bajarên mezin dijîn.

Senegal di çarçoveya daxwaza finansîrên xwe de, politîkayeke arzîkirina şirketên xwe dide meşandin. Ev awayê arzîkirinê her tim ne serkeftî ye. Wekî mînak Saziya Neteweyî ya Elektrîkê (Senelec) di sala 1999'an de piştî ku hat arzîkirin şebekeya wê roj bi roj xerabtir bû. Di nava vê tevliheviyê de, dewlet biryar girt kontrola şirketê elektrîkê ji nû ve bixê destê xwe û di Mijdara 2009'an de, statuya wê guherand û kir perçeyeke “malê hevbeşê dewlet û arzî.” Îro şebekeya elektrîkê hê jî baş kar nake, bi taybetî jî li paytext Dakar'ê pir caran elektrîk

dihê birîn. Li ser înisyatîfa muxalefetê, ya komên dilsoz û ya dîasporayê, Konferansa Neteweyî di navbera 1'ê Pûşbera 2008'an heta 24'ê Gulana 2009'an gelek civîn li dar xistin û di raporên xwe yê encamê de qebûlîkirin ku “şebekeya belavkirina elektrîkê baş kar nake, ji buhayê wê bigire heta di kalîteya xizmeta wê de pir kêmasiyên ciddî hene. Valahî û pîrsgirêkên kronîk ên di hilberîna elektrîkê de, ji berê ve hene, lê belê ev yek ji ber krîza aborî ew qas girantir bû ku arzîkirina wê jî nikaribû jê re çareseriyekê bibîne.”

Bi ya anketên ku di navbera salên 2005-2006'an de sebarêt bi xizaniya li Senegal'ê hatine kirin, ji % 64,7 kesan qebûl dikin ku ew di xwedîkirina malbata xwe de tengasiyê dikişînin. Di qada neteweyî de, ji % 40'ê xerc û danûstendinên aborî ji aliyê ji % 20'ê dewlemendên welêt ve dihê kirin. Piraniya xizanên Senegal'ê ji pêdiviyên bingeheên ên wekî (av, elektrîk, bînesaziya rê) bi taybetî ji kontrola tendurûstiyê bêpar mane; ji % 45,9'ê gel bi nexweşiya tayê ketine (paludisme) nexweşiya kolera di sala 2004'an de heta paytext Dakar'ê berbelav bû û di destpêka 2005'an de li Touba hat dîtin.

Ji aliyê din ve, di sektora perwerdehiyê de ku ji % 40'ê budçeya welêt jê re dihê terxankirin,

pêşketineke berbiçav xuya dike. Rêjeya zarokan ku di dibistana seretayî de ne, di sala 1999'an de ji % 68,9 bû, lê di sala 2004'an de ev rêje derket ji % 80. Însiyatîfa bi tenê ya li Afrîka'ya Rojava bi qasî bîst û du hezar zarokên di navbera sal û 6 salî de perwerde dike. Hejmara keç û kuran, ji bilî herêmên çiyayî yên dûrî bajaran, hema hema wekî hev e. Lê belê kêmbûna hejmara mamosteyan her berdeham e û dibistanên pîşeyî hîna jî ji gelek îmkân û derfetan bêpar in.

Bi heman awayî, perwerdehiya bilind îro di krîzê de ye, grevên daîmî kampûsên zanîngehan dihejînin. Wer xuya ye ku ji bo tekoşîna li hemberî betalîyê û her weha ji bo pêşîlêgirtina koçberiya almanên xwedî dîploma reformeke di sîstema perwerdehiyê de şert e û lezgîn e. Di rastiyê de, ciwanên ku îro nikarin li nav welêt ji xwe re kar bibînin, xeterên pir giran, carnar mirin jî didin ber çavên xwe, hewlê didin berê xwe bidin xeribiyê.

TOM AMADOU SECK*

* Aborîzan, mamosteyê zanîngeha Reims, fakulteya huqûq û zanyariya politîk

**Wergera ji fransî
Bedran Dere**

KONGO

Pencî saliya serxwebûnê

Pir caran ew bi şerê yê bêdawî ku li Rojhilatê xaka wê dimeşe dihê naskirin, Komara Demokratîk a Kongo'yê (RDC) bi seqemnegirî û dramana hatiye mehkûmkirin. Du berhemên ku bi argûmanên qayîm û bi çavkaniyên tespît-bûyî hatine çêkirin, ji bo fêrbûna rewşa rast a van welatên golên mezin ên Afrîka'yê rê nîşan dikin. Mudurê Navenda Belçîka ya Referansa ji bo Zanistiyên li ser Afrîka ya Navîn a li Bruksel'ê ku ji aliyê Théodore Trefon ve dihê birêvebirin, Reformên li Kongo – Hêvî û wendayîya xeyalan, bandora – sûdda an jî xirabker – mudaxelaya navneteweyî ya li RDC pêkhatî analîz dike. Kêfxweşiya rêvebiran, a ku bi alîkariya çapemeniya neteweyî û navneteweyî hatiye avdan, nikare di rastiyê de xirabiya alîkariya bi-

yanî veşêre.

Em dikarin bibînin ku, ji ber sedemên nakokiyên di navbera wan de, çawa ev alîkarî ji aliyê saziyên navneteweyî ve hatiye astengkirin. Di aliyekî de Komisyona Ewropa'yê û çend welatên endam ên ku firehbûna ber bi Rojhilatê ji bo wan ji paşeroja welateke afrîkî zêdetir biavantaj e, di aliyê din de jî, bédiliya welatên ku naxwazin li ser vê parzemîna reş pozîsyona xwe xurttir bikin, ji vê yekê re dibin sedem.

Di nava rewşeke bêewle û şiddeta civakî ku roj bi roj tûjtir dibe û her weha aboriya ku rewşa wê hatiye xerabkirin û deyndariya ku pir bi jor de çûyî de, kongoyî ji hêza mudaxalekirina hukûmeta xwe bêpar mane. Qasî derdorên bijarte yê kongoyî, ku tenê bi berjewendiyên xwe ve têkildar in, berpirsariyên vê rewşê dixin ser “ci-

vaka navneteweyî” jî. Derdorên bijarte yê kongoyî berjewendiyên xwe yê teng ji yê welat zêdetir girîng dibînin.

Di vê navberê de, çiqas jî munasîb be, karê ku ji aliyê Trefon ve hatiye koordinekirin di nava pakêta çanda neo-lîberal de asteng maye. Di aliyê din de, nakokiyên ku zehmet e pê bawerî were kirin, ên di navbera rewşenbîrên kongoyî (yek) û rewşenbîrên biyanî (neh) de garantiyeke întelektûel dide ser zaroktiya mezin a Afrîka ya Navîn.

Ji şer ber bi serhildanên gel ve, hatina Joseph Kabila û bûyîna komara sêyem ji bo fêmkirina RDC elemanên nû datîne pêşberî me. Di heman demê de ew, bi awayekî pir bidîqet binê pêşveçûna dîrokeke zinde jî xet dikin. Di meha Çile yê 2001'î û her wiha bi hatina birêz Kabila wekî serokê dewletê û her wiha bi pêkhatina hîlbijartinên giştî

yên Tîrmeh a 2006'an; tiştên ku nivîskar wekî mucîze bi nav dike hatine sekinandin. Her wiha ev berhem xwe wekî çirokekê û wekî hacetekê referansa analîzîkirinê jî dide naskirin. Ev du berhem ji aliyê kolleksiyona “Cahiers Africains” a Mûze'ya Qiraltîya Afrîka ya Navîn li Tervuren'ê (Bruksel) ku bi Navenda lêkolîn û ragihandinên sosyo-polîtîk (CRISP) a Belçîkî, ku sebarêt dîroka Kongoyê pir xebatên zanyarî kiriye: nivîseke pirhejmarî ku li ser pratîkên civakî û her wiha projeyên aktorên herêmî, ku hemû dagirkeriyê red dikin pêwendîdar e. Dîroka Kongo'yê binivîsîne, bixwîne û fêr bike... Lê belê kîjan? Her weha ev analîzeke rexnekê a sebarêt bi dîroka dagirkeriya belçîkayê ye ku ji aliyê Guy De Boeck et Isidore N'Daywel ve dihê pêşniyarkirin ku dîsa were xwendin. Bi vê ve girêdayî, wê

hemû bandora wê ku li ser rewşa trajîk a îroyîn de heyî jî were fêmkirin. Di nava bi dehan salan de rayedaran sebarêt bi dîroka kongoyî li Belçîka'yê, an bi înkârî kirinê, an jî bi kêmkirina şîdde- ta dagirkeriyê, kar kirine. Pişt re, heman dîrok ji aliyê mareşal Joseph Mobutu ve, bi armanca ku ji bo berjewendiyên xwe yê xas, hate xebitandin û wê li ser prestîja wî bandor çêkir. Ev xwendineke rexnedar, a ku bi pir berhehman hatiye dewlemendkirin, sebarêt bi mîtolojiyên ku hafizaya kongoyî reş kiriye ye. Em dikarin li wê derê wateya dîrokeke ji sê hezar salan vir ve ji mirovahiyê re nûnertiyê dike jî bibînin...

ANICET MOBE

**Wergera ji fransî
Ahmet Dere**

Di kelekela Afrîka'yê de

Parzemîna cîhanê ku lê kêr daristan heye, Afrîka di nava deverên ku lê zêdetir bajarvanî pêş dikeve de ye: Salê nêzîkî % 7 zêde dibe, niha ji % 40 hevvelatî li bajaran niştceh in. Ev rêje di salên 1900'î de ji % 3 bû. Di sala 2030'yî de şêniya Afrîka'yê wê bibe 760 milyon, ji vana % 70, heke tu tiştek neguhere, wê di deverên xizan ên bajarên dagirkeran wekî (Kinsha- sa an jî Nairobi)'yê de bijîn. Her weha hin ji wan jî li deverên wekî (Îbadan an jî Kano li Nijerya'yê) bijîn. Di rastiye de, vê gavê nivê girseya ku li bajaran diji rojê bi du dolaran jiyana xwe didomîne, ji vê girseyê ji % 25'ê wî di binî 25 salî de ye.

Bi ya daxuyaniya saziya bicihkirinê ya Neteweyên Yekgirtî, ku di sala 2008'an de hatibû dayîn, ev bajarîbûn mîna keke girîng a berxwedana ji bo domandina jiyaneke ku her rojê şertên wê zehmettir dibin (1). Bi giranî di herêmên girseyî yên metropolan de, rengekî çanda nû derdikeve holê. Bi taybetî di van deh salên dawîn de ev

zêdetir xwe nîşan dide. Rengê jiyane Îvorî an jî Kwaito ya Başûrê Afrîka'yê, Hip-Life ganayî û Kuduro'yê angolayî jiyana paşerojê diyar dikin. Ev rastî digel hewldana pêşketinên elektronîk ên vê sedsala nû. Lê belê, bi rêya bûyerên birçîbûnê ku di zivistanên 2008-2009'an de derketin holê, me baş dît ku buha kirina pêdiviyên yekem ên jiyane û ên petrolê ku ji aliyê rêvebiriyên navendî ve pêk hatî bûne sedemê heman rastiye. Di aliyê din de bihabûna xaniyan û ya erazî jî, di xizaniya bajarvanan de bûye rastiyeke.

Li Abuja'yê, derdorê heşt sed hezar "kesên bênav ên ku xwe bi cih kiribûn", di salên 2003 û 2007'an de ji axên derdora paytexta nû ya Nijerya'yê hatin koçberkirin. Kampanya ya Kûpa ya Cîhanê ya 2010 ku li Başûrê Afrîka'yê çêdibe ji kampanya koçberkirinê re jî bûye sedemek (2). Kesên ku di taxên înfarmel de diji bi gefên xeterên pişesaziyan, bi yên tendurûstiyê û bi yên meteorolojiyê ve rû bi rû mane. Lehiyên avê ku bûn sedemê sed û şêst

miriyan, ku di payîza 2009'an de li Rojava'yê Afrîka'yê pêk hatî wekî "wêneya encama pêşketina demografîk a bajaran ku wekî bombe-yekê çêkirî ye. Ji bo çareseriyek ji xizaniya li bajaran re were dîtin tu siyasat jî nehatiye pêşxistin (3)."

Fînansorên alîkariya navneteweyî ku heta niha hemû derfetên xwe dabûn ji bo kampanyayan, di van demên dawî de ketine ferqa pirsgerîkan. Wê were zanîn ku van derdoran di demeke dirêj de hewl dabûn ku derfetên şaredariyan kêr bikin û ev jî bibû sedemê ku di bajaran de xizani çê bibe: Tenê ji % 20'ê bajaran dikarin ava zelal bi dest bixin, ji % 10'ê wan tenê xwediyê sîstema kanalizasyonê ne. Di vê navberê de alîkariya dewletê, ya ji bo pêşxistinê dihe tengkirin, zexta li ser saziyên civakî her ku diçe zêde dibe. Ev saziyên civakî tenê ji % 2 alîkariya dewletê distînin. Bernameya ku ji aliyê rêxistina Neteweyên Yekgirtî ve dihe piştgîrîdan a ji nû ve bicihkirina kesên beyanî, yên taxa xizan Kibera'yê li Naîrobî'yê, xwedî hejmareke di navbera penc sed

hezar û heşt sed hezar ku li ser axeke derdorê sê hezar hektarî diji, tenê di meha Îlon a 2009'an de, bi derengiyekê bi salan, hat destpêkirin. Di vê demê de hin derdor guman dikin ku ji bo dawî-lêanîna vê projeyê, ku bi buhayê 1,2 milyar dolar dihe gumankirin, hezar û sed û heftê sal divên.

JEAN CHRISTOPHE SERVANT

Wergera ji fransî
Ahmet Dere

(1) Bixwî "The State of the african cities report 2008", www.unhabitat.org/pmss/getPage.asp?

(2) Bixwî Philippe Rivière, "Opération coup de poing à Durban", <http://blog.mondediplo.net/2009-10-01-Operation-coup-de-poing-a-Durban>

(3) Bixwî "Afrique de l'ouest: la croissance urbaine mise en cause par les inondations", Relief Web, 16 septembre 2009 <http://www.reliefweb.int/rw/rwb.nsf/db900sid/VDUX-7VXP52?OpenDocument>

Serûbinbûna muzîka reşan

Roja 21'ê Sibata 1965'an, Malcom X di dema axavtineke xwe ya li ser dikê de, di encama êrişeke de dihe kuştin. Roja mayîn, Le Roi Jones'ê ku di sala 1963'an de, berhema bi navê "Blues People: Negro Music in White America" derxistibû, radigihîne ku ew bi navê "Black Arts Repertory Theater/School" saziyekê li dar dixin. Balkêş bû ku ev sazî li herêma Harlem a Newyork'ê li cihê ku berdevkê civaka îslamî Malcom X lê hatibû kuştin, dihe avakirin. Bi armanca protestokirinê, hunermend Le Roi Jones navê xwe diguherîne û dike Amiri Baraka.

Her çend hin zagonên nû ku qaşo sipî û reşan yeknesak digirin derketibin jî û her weha hunermendê saksafonîst John Coltrane di hunera xwe de bilind bûbe û nav û dengê wî gihîştibe qada gerdûnî jî, kuştina trajîk a Malcom X dibe sedema radikalbûna hunermendên afrîkiyên-amerîkî. Ev bûyer dîroka muzîka jazz'ê jî ser û bin dike. Di buhara 1965'an de, komeke muzîkjenên "Chicago fonde l'Association for the Advancement of Creative Musicians" bi bîr û baweriyekê şoreşgerî, wekî prensîb biryar didin ku ewê kariyera xwe ya muzîkî bi xwe bi rê ve bibin. Muzîka Jazz'ê bi dawî dibe û Great Black Music berpirsiyari-

yeke wekî berdewamiya dîrokê li xwe bar dike. Muzîsyenên kêr radîkal, di hunera xwe de muzîkên xwedî ruhê bi şehwet tercîh dikirin. Ji rêvebirên komê Kelan Phil Corhan ku di sala 1969'an de berhema bi navê "Malcom X Memorial" derxist demêke berî niha weha gotibû: "Me dixwest, em nasname û muzîka xwe bînin ziman, lewma me ji xwe re prensîbek danî holê: divê em tenê reng û awayê xwe yê taybetî derbixin pêş."

Ev ne tesadufî ye ku sala 1965'an dibe sala despêka pêşxistina berhema bi navê Freedom, Rhythm and Sound. Ev berhema hunerî ji aliyê Stuart Baker û Gilles Peterson ve hat amadekirin. Tê de rêzeke dîskên bijarte cih digirtin. Di dema derketina wê de, berhemeke din a ku ji du CD'yan pêk dihat û tê de berhevkirineke muzîkal cih digirt derket. Di vê derê de nîşanke xwedî taybetmendiyên cuda derketiye holê ku hem ji aliyê estetîk ve û hem jî ji aliyê ekonomîk ve ji sistemê dûr e. Berhemên bi navê "Revolutionary jazz original cover art 1965-82" di dîroka muzîka Jazz'ê de gaveke nû ye.

Ornette Coleman û hemû mace-raperestên jazz'a azad avahiyên Soho bi dest dixin, wê derê ji xwe re dikin meskenekê alternatîf. Ev koma serbixwe bi rik û bi biryar ji xwe re dixê armanc ku wicdana

gettoyan şiyar bike û têkilî û zincîreke wekî Tribe Records ava dikin ku ev yek di sala 1971'an de ji aliyê muzîsyenên bajarê Detroit'ê ve hatibû avakirin. Armanca wan a yekemîn ew e ku hewlê bidin ku enerjîya civakê di kanalekê de berhev bikin.

Muzîka jazz'ê ji çerxa endustriya ku berhemên wekî hev derdixê bi temamî difilite. Bi wê ruhê azadiyê û bi gotinên populer xwe her tim nû dike û gav diavêje nava cihana muzîkan. Ev şewaza muzîkê êdî dibe kozmîk û li gerdûnê belav dibe, dibe esoterîk ku tenê derdoreke bijarte dikarin jê mesaj derbixin, û hinek jî dibe politîk.

Têkoşîna li dijî dagirkeriyê, şerê li Viyetnam'ê, "blaxploitation" an ku bilindkirina rûmeta qewmê afrîkiyên-amerîkî, bidestxistina mafên medenî, mijarên sereke ne ku ev muzîk di nav xwe de dihe-wand.

Koma Last Poets ji stranên ku ji zindanên başûrê Amerika'ya Yekgirtî derdikevin, îlham digirtin û sêkên Newyork'ê radikirin ser piyan. Saksofonîst Archie Shepp jî di berhema xwe ya bi navê "Attica Blues" de nîfir dibarand ser zindana bi navê û deng a ku tê de hev-qewmên wî girtî bûn.

Çawa ku muzîsyenê Jazz'ê Don Cherry di dema bombebarana li ser Kamboçya'yê de, bi armanca protestokirinê, ji bo daîmî Ame-

rika terikandibû, hin ji endamên koma Last Poets jî berê xwe dan xeribiyê, hin ji wan jî tev li rêxistina Black Panthers bûn.

Piraniya wan li Cezaîr'ê tev li festîvala pan-afrîkî dibin, ku di havîna sala 1969'an de li paytext Alger hatibû lidarxistin. Pişt re li Paris'ê rêzeberhemên bi navê BYG-Actuel derdixin. Ev yek jî di demeke din de wekî efsane belav dibe.

Piştî çil salan, ev dîskên ku bi hejmarên kêr dihe derxistin, her yek ji wan bûne berhemên giranbuha yên koleksiyonê. Peyamên ku wan xwestibûn di dema xwe de bidin, îro hîna jî girîngiya xwe diparêzin. Wekî îspat, festîvala Sons d'hiver (dengên zivistanê) giranî da du figurên wê demê: sînemavan Melvin van Peebles, berhemên wî "cultissime", "Sweet Sweetback's Baadassss Song" hîna jî wekî operaya jazz'ê eleqeyê dibînin. Graphiste Emory Douglas, ku di dema xwe de "wezîrê çandê" yê rêxistina Black Panthers bû bi tevî du lehengên koma Last Poets di sala 2010'an de di festîvala bi navê "Tongues on Fire" de eleqeyekê mezin dîtin.

JACQUES DENIS

Wergera ji fransî
Bedran Dere

Naverok

Kurd û self-determination
A. Celil Kaya ► 1

"Dema ku dewlet bibe mijar, girîngiya dadê namîne"
İsmail Beşikçi ► 2

Li Kirxizistan'ê, ji şoreşekê ber bi yeka din ve
Vicken Cheterian ► 2

Hrant Dînk û komkujiya li Tirkîye'yê
Trine Kleven ► 3

Aleksanderê Mezin û nêviyên wî yên wenda
Nicolas Autheman ► 8

Di nava werçerxeke gerdûnî de
André Bellon ► 10

Kunên di mertalê de
Olivier Zajec ► 12

Qirkirina asûriyan
David Gaunt ► 14

Li mîrnîşînê ereb pîrsgerêka nasnameyê
Akram Belkaid ► 18

Muftiyê Qudus'ê ku her dimîne
Gilbert Achcar ► 20

Rê, pir, elektrîk û Pacha Mama
Maurice Lemoine ► 21

Hilbijartinên Bîrtanya'yê
Serge Halimi ► 23

DOSYA YA AFRÎKA'YÊ:
• **Parzemîna ku li rûyekî nû digere**
Yves Ekoué Amaizo ► 24
• **Çalakiyê nav-parzemîni**
Anne Frintz ► 25
• **Lêgerîna pisporiyê tendurûstiyê**
Karl Blanchet ► 26
• **Serxwebûn û krîza politîk**
Abdoul Aziz Diop ► 27
• **Aboriyêke di nav bafizokê de**
Tom Amadoua Seck ► 28
• **Pencî saliya serxwebûnê**
Anicet Mobe ► 29
• **Di kelekela Afrîka'yê de**
Jean Christophe Servant ► 30

Serûbinbûna muzîka reşan
Jacques Denis ► 30

Mafekî civakî wekî av û elektrîkê
Evelyn Pieller ► 31

Ji nivîskar û jî demokrasiyê
John Berger ► 32

ŞANO

Mafekî civakî wekî av û elektrîkê

EVELYNE PIELLER

Di van rojên me yên tijî fikar de, heycaneke gelek xweş e ku mirov li pişt xwe vegere û dîrokê bikole. Hem jî di van deman de ku rola şanoyê dihê nîqaşkirin, ku di jiyana civakî de biisrar e. Bi ya hin derdoran, divê hilberîn û serkeftina di her qadê de, bi taybetî jî di qada hunerî de, bikeve xizmeta berjewendiyên civakê. Di nava rûpelên dîrokê de, mirov dibîne ku, ew nîrxên ku îro di bin navê realîzm û rastiya giranbûha de rexne lê dihê kirin, di hin serdeman de ji bo bidestxistina wan, tekoşîneke dişwar hatiye meşandin.

Rêwîti û gera di nava dîroka şanoya li Fransa'yê de, rastiyan balkêş derdixin pêşberî mirovan û dersên giranbûha jê dikarin werin derxistin. Ji ber ku tê de mijara bi nîqaş, armanca hunera şano û rola civakê pir baş dihê ronîkirin.

Di sala 1920'an de, li Fransa'yê, di encama hilbijartinên siyasî de, hukûmeteke koalîsyonê ya ku ji rastgiran û ji siyasethêdarên bêalî pêk dihat, derkete holê. Li her derê girêvên birçîbûnê berdewam dikirin, li hemberî çalakgeran zordariyeke dişwar dihat bikaranîn. Di demeke wisa de, partiya Komunist a Fransa'yê bi kongreya xwe ya li bajarê Turs'ê, damezrandina xwe ragihand. Dîsa di nava vê tekoşîn û tansiyoneke wisa bilind de, kurê karkerekî qelayê, Firmin Gémier bi ruhekî tijî hêvî dibe rêvebirê Şanoya Netewî ya Gel (TNP) û di pêşxistina wê de roleke girîng dilîze. Gémier di 1869'an de li bajarê Aubervilliers'ê ji dayîk bûye, şewaza rêvebirîya wî ya şanoyê nêzikî ya André Antoine bû.

Ev baweriya vekirî ku şano dixwe xizmeta civakê, îlhama xwe ji tevgera dişwar a sosyalîst distîne. Armanca ew e ku ji vê tevgera civakî re, ji bilî teoriyê, bingeheheke pratîk û sazîyên pêwîst ava bikin. Dihate xwestin ku tenê ji bo karkeran, zanîngeheke gelêrî were avakirin û ji bo her kesî jî şanoyeke mezin a wekî yûnanan an jî ya Elîsabeth were birêkûpêk kirin. (1)

Dem pir zû buhurî, van sazi-

yan roj bi roj hêz wenda kirin û di 1935'an de, du sal piştî mirina Gémier, ji ber kêmasiyên alikariya dewletê ku nikaribû salona mezin a şanoyê (xwedî pênc hezar cih), li ser piyan bigire, Şanoya Netewî ya Gel TNP bi demborî hat girtin. Bi vî awayî ev şano bi ruhê xwe yê şoreşgerî û avaker, bandoreke giran li derdorê nekir. Lê belê di serdema xwe ya "duyemîn" de TNP a bi rêvebirîya Jean Vilar ji wan prensîbên destpêkê bi dûr neket û şano wekî xizmeteke civakê nîrxand. Vilar dibêje "çawa ku av, gaz û elektrîk di xizmeta civakê de ye, divê şano jî fonksiyoneke wisa bibîne."

Helbet ev nêrîneke mirovan e ku xwe bi vî awayî dide der. Mafê xwezayî yê mirovan e ku ew hobiyan xwe, kêf û seyrana xwe pêk bînin, xwe agahdar bikin û bibin xwedî zanebûnê. Gémier di çarçoveya baweriya sosyalîzma navneteweyî de, hewl da xebata xwe ya pratîk pêk bîne, lê ji bo ku wateya vî

karê xwe bigihîne asta herî bilind, diviyabû jê re pîvaneke estetîk ava bike. Bi konferaseke 1919'an û bi nivîsareke sala 1921'an ku ji aliyê pisporên se-reke ve hat pêşkeşkirin (2), teoriya Gémier a ji bo fonksiyon û rola şanoyê ya civakî hat destekkirin. Vê baweriyê ku dixwest deriyê şanoyan ji her beşa civakê re vekirî be, teoriyên din ku di wan deman de pir dihatin destek kirin, tev serûbin kir. Armanca wan ew bû ku ev bawerî ne tenê di teoriyê de bimîne lê belê her weha bi aliyên xwe yên herî hessas di pratîkê de jî were pêkanîn û xebatên şanoyê bigihîjin rastiya xwe ya esasî. Ev armanca bingeîn e, ji ber ku her xebatên di vê rêyê de, hem politîk û hem jî hunerî, li ser bingeha lêpîrsînê, tekoşîn û pevçûnê hatine avakirin. Ger wisa nebe, hunera şano wê yan ber bi populîzmê ve bişiqite yan jî ewê ber bi "avant-gardisme" ve biçe, an ku ji rastiya îro ya civakî dûr ku pêşerojê xeyal dike.

Rojên piştî azadiyê bi êş derbas dibin, pêvajoya şerê sar, pîrsgirêka stalinîzmê, bidawîbûna pêvajoyên dagirkeriyê û tevliheviyên cîhana politîk tevbandor li wan rojan dikin. Lê pêşketineke balkêş çêdibe. Hunera Şanoyê dibe mijara bingeîn a cîhana entelektuelî. Bi taybetî jî derdorên sendîka û partiyan politîk eleqe nîşan didin. Jacques Lemarchand (3), nivîskar û rexnegirê şanoya drama helwesta xwe diyar dike û aliyê xwe hildibijêre. Ew diçe aliyê "şanoya macera" bi gotina wî, ew kesên ku bi azadiya gotinan, dikarin hebûna ecêb a miriyan pîroz bikin. Ew ne li aliyê "çep" e, lê belê li hember heval û derdorên xwe yên "burjuva" biisrar hewlê dide şanoya helbestvanên dramaya nûjen ên wekî Beckett, Ionesco, Adamov, Schéhadé pê bîne û ronî bike. Çawa ku hin rexnegiran îddîa dikir, şanoya wî tenê xitabî kesên "elît", (çîna serdest) nedikir. Tixûbên şanoyê wisa berfireh in ku ji go-

tinên demogojîk derbastir dibin. Hunera tiyatroyê daxwaz û nêrîna mirovan a ber bi asoyên nû ve berfireh dike: jêsteke bihêz e ku mahremiyeteke hevbeş a civakê diafirîne. (4)

**Wergera ji fransî
Bedran Dere**

(1) Şanoya gel a Bussang ku di sala 1895'an de, ji aliyê Maurice Pottecher ve hat avakirin, karê xwe hê îro jî berdewam dike.

(2) Firmin Gémier, nivîsen berhevkerî ji laiyê Catherine Faivre-Zellner ve, Actes Sud, coll. «Papiers», 2009, 96 rûpel, 11 euros.

(3) Jacques Lemarchand, Le Nouveau Théâtre (şanoya nû) 1947-1968. Un combat au jour le jour. (Tekoşîneke rojane) Nivîsen berhevkerî ji aliyê Véronique Hoffmann-Martinot ve, Gallimard, Paris, 2009, 448 rûpel 28,90 euros.

(4) Kovara Cassandre/Horschamp, balê dikişîne ser kêmasiyên gotûbêjên di barê girîngiya çand û hunerê ya di civakê de. www.horschamp.org



Foto: Adem Sönmez

Ji nivîskar û ji demokrasiyê



Foto: Paşa İmrek

“Me çî bi demokrasiyê kir? Me ew bi çî da guherandin? Wê çî bi qewi-me dema ku me naveroka de- mokrasiyê vala kir? Ji dema ku me naveroka wê vala kir û bi şûn de wê çî biqewime? Dema ku hemû saziyên wê bi tiştêkî xeter ve têkildar bin wê çî biqewime? Wê çî biqewime dema ku demokrasi û aboriya bazarê bi hev re xwe kirin di şûna saziyekê de, ku tenê bandora wê li ser der û dorê nihêrîna ku xwedî armanca zêdekirina sûdê ye? Gelo guhertina vê pêvajoyê guncan e? Tiştêkî ku carekê hate guhertin dikare vegere ser rewşa xwe ya berê?” Arundhati Roy di pirtûka xwe ya dawî de van pirsan dike.

Ji deh salan vir ve ev pirtûka çaremîn e ku nivîskar sebareti pirsgirêkên welatê xwe dinivîsîne, Hindistan, ku ji aliyê medyaya navneteweyî û her weha siyasetmedarên sereke ve wekî “demokrasiya herî baş a cîhanê” dihê nîşankirin û dihê gotin ku di rêya pêşxistin û pêşketinê de ye. Nivîskar gav bi gav, encam bi encam, çarçove bi çarçove dojeha ku ji aliyê neoliberalîzmê ve dihê çêkirin dişopîne -ji ber ku rêbazên weşartina rastîyan ku her roj pêş dikevin. Li vê derê ez bi xwe gotina faşîzma aboriyê bi kar tînim.

Di vê pirtûkê de, sebareti bi êrişên dîrokî yên li dijî azadiyê, bûyer piştî bûyeran û bi alîkariya encamên lêkolînên xwe ze-

laliyê çêdike (nîşeyên sebareti bi çavkaniyên wê bîst û pênc (25) rûpelan tije dike). Hemû xebata wê bi alîkariya şahid û kesên nêzîkî wan hatiye zelalkirin- di pir alîyan de ew, wekî çîrokbêjê mezin Robert Cappa dinivîsîne û her weha wêneyan jî digire- û, di vê navberê de, bi rêya panorameyekê ew tevahiya bûyeran li asîmanan dineqîşîne.

Dîroka van hemû bûyeran, ku di nav de trajediyêke teqandî heye, ji aliyê medyayê û şîroverên fermî ve ketiye rewşeke ku nayê fêmkirin. Çend mînak: komkujiya buhara 2002'an, li nava dewleta Gujarat'ê, mîlyonek musulman, ji aliyê girseyê ve hate lînçkirin, şewitan- din û destdirêjî li namûsa wan hat kirin. Ev yek hemû li ber çavên hêzên ewlekariyê pêk hatin. Ji bîst (20) salan vir ve geliyê Cachemire'ê ji aliyê leşkeran ve hatiye dagirkirin. Niv mîlyon leşkerên hindistanî li vê herêmê kiryanan pêk tînin, li cîhanê heman herêm bûye herêma herî mîltarîst.

Bandora Partiya Bharatiya Janata (BJP) her ku diçe mezintir dibe û derfetên wê firehtir dibin. Ev partiyeke faşîst a hîndû ye û kampanyaya xwe li ser esasa Hindistan'a Hîndû dimeşîne (ku li vî welatî ji sed û pêncî (150) mîlyonî zêdetir musulman hene). Sebareti bi çend pirsgirêkan, nemaze şerê li dewleta Chhattisgarh'ê jî di nav de, Partiya Kongre'yê, ku par-

tiya herî radikal a Nehru ye, niha bi awayekî de fakto hevkarê BJP'ê ye.

Şerê Chhattisgarh'ê, li herêma mezin ku lê daristanek heye û li navenda Hindistan'ê ye, li dijî gelê Adivasis'ê, ku gelê xwecih e, dimeşe. Binerdê daristana vê herêmê xwedî dewlemendiyeke mezin e, lewre pir firma, bi awayekî bêsebr, li bendê ne ku hukûmet vê daristanê ji holê rake; gelê Adivasis, ê “maoîst” jî naxwaze rêbazên jiyana xwe xerab bike, ji ber vê yekê ew nahêlin kes nêzîkî axa wan bibe. Hêzên hukûmetê ku xwediyê helîkopter û çekên modern in zêdeyî şeş sed (600) wargeh vala kirin, her weha ew hewlê didin ku eşîretan li dijî hev rabikin. Hîna sê sed hezar (300 000) Adivasis li ber xwe didin, çeka wan tenê ji kemînên daristanan û ji çoyên di destê wan de ne pêk dihê. Şerêkî din ê asîmetrîk.

Dîroka van bûyerên cuda, xwe bi mantiqeke ku li her derê dihê dîtin dinivîsîne, ew parçeyeke sîstema firmayan e ku wekî nîzama nû ya cîhanê dihê naskirin. Detay, bi ya parzemînê û her weha bi ya dîroka herêmî diguherin, lê belê şema her tim wekî xwe dimîne. Şemayeke girover.

Ferqa navbera xizan û derdorên dewlemend her ku diçe mezintir dibe. Hemû tengavî û pêşniyarên sebareti bi pergala civakî hatine belawelakirin. Civaka mezaxê di heman demê de

hemû pirsan jî bi xwe re dişewitîne. Dema ku mirov hemû kesayetîya xwe wenda dike, her weha wateya nasnameya wan jî, dikeve nava rewşeke ku ji xwe re dijminan diafirîne ku pozîsyona xwe bi ya wan diyar bike. Girêdayînen nasnameyî çî dibe bila bibe, mirov her tim ji xwe re dijminan di nava xizanan de peyda dike. Çembera teng wisa temam dibe.

Li kêleka dewlemendiyê, sîstema aborî jî zêdetir xizaniyê diafirîne, zêdetir malbatên bê cih û war çêdike, her weha ev hemû jî bi xwe re, di warê siyasî de, îdeolojiyên, ku xizanên nû li derveyî hejmara pergala jiyane dihêlin, diparêze.

Ev çembera nû, ya siyasî û aborî ku cesaretê dide mirovan da ku bikevin nava hewldanên kiryarên tune kirina mirovahiyê, Roy teşwîqê vê xebatê dike. Ew qebûl dike ku rojekê bêje “Em li ser dîwarên ku di wan de kunên mezin hene û her weha di wan de pencere jî hene binivîsîn. Û mirovên ku tenê xwedî pencere nîkarin fêm bikin.”

Arundhati, şerê bi te re nade rawestandin, lê belê ji me re her weha çîrokên ku te li aliyê wan cih girtin jî tîne ziman, heman çîrokên ku, di dirêjahiya vê şeva dirêj de, te bi wan re rêwîti kir. Pêwîstiya me bi wan heye.

JOHN BERGER

Wergera ji fransî
Ahmet Dere

Le Monde Diplomatique kurdi
Ji aliyê Independent Kurdish
Media Group GmbH
ve tê weşandin

Editorê giştî
Faysal Dağlı

INDEPENDENT KURDISH
MEDIA
GROUP GMBH

Konrad-Adenauer-Ufer 39
50668 Köln / Almanya

Desteya rêvebiriyê
Murat Satık
Rıza Dinç
Metin Göktepe
Faysal Dağlı

Le Monde Diplomatique kurdi

Şewirmenda weşanê
Berivan Aymaz

Asîstanta editor
Semra Polat

Asîstantê weşanê
Sharo İbrahim Garip

Rêvebirê hunerî
Hasan Hüseyin Deveci

Designer
Mehmet Nazmi Demir

info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

ABONETÎ

Independent Kurdish Media
Group GmbH
Post Bank
Konto: 371219609 - BLZ:
50010060
IBAN: DE84 5001 0060 0371
2196 09
BIC: PBNKDEFF

Almanya:

Salane: 50 euro - 6 meh: 25 euro

Dervayê Almanya:

Salane: 60 euro - 6 meh: 30 euro

Le Monde Diplomatique

Damezrêner

Hubert Beuve-Méry

Rêvebir

Serge Halimi

Sernûser

Maurice Lemoine

Cîgirên sernûser

Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

Redaksiyon

Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbart
Dominique Vidal

Rêvebirê hunerî

Alice Barzilay

Dokumantasyon

Olivier Pironet

Sekreter

Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France